# Berbang

Bilaga på svenska

KOVARA FEDERASYONA KOMELEYÊN KURDISTANÊ LI SWÊDÊ •HEZÎRAN/ JUNI 2000• HEJMAR/ No: 115• BIHA: 25





## Konferansa Stockholmê:

**”Em bi yekdengî kriterên ji aliyê hêzên navneteweyî û Yekîtiya Ewrûpayê ve hatine danîn, bi taybetî jî krîterên Kopenhagenê, bi kêmanî bibin rênîşander ji bo çareserkirina pirsa kurdî li Tirkiyê ya di dema berendametîya wî ya Yekîtiya Ewrûpayê de”**



# Polisyrket

## något för dig?

Det behövs fler poliser i Sverige, framför allt i Småland, Norrland och på Gotland. Nästa polisutbildning börjar i augusti 2001. Polisstudenterna kommer att få sin utbildning på Polishögskolan i Solna eller i Umeå.

## vem är du?

Vår ambition är att Polisen ska spegla samhället. Antalet kvinnliga poliser måste öka och det behövs fler poliser med invandrarbakgrund. Vi ser gärna sökande som studerat vid högskola eller universitet, t.ex. ekonomer och tekniker. Stor vikt läggs vid dina personliga egenskaper.

## vad vill du?

Du bör vara vidsynt, tolerant och serviceinriktad. Polisutbildningen omfattar fyra terminers teoretiska studier och en termins praktik. Det problemorienterade lärandet är grunden i utbildningen. Som student tar du ett stort eget ansvar för din utbildning. Som färdig polis erbjuds du ett flexibelt och varierande yrke.

## vill du veta mer?

Det finns en stor bredd i verksamheten och goda utvecklingsmöjligheter. Välkommen till polisens hemsida på Internet: **www.police.se.** Här finns information om vad som krävs för att bli antagen till polisutbildningen, information om utbildningen och ansökningsblanketter. Du kan också ringa 020-46 46 00 eller kontakta närmaste polismyndighet för samma information.

### Blanketten

”Ansökan till Polishögskolans grundutbildning” finns på www.police.se och kan också fås under pågående ansökningsperiod på tel: 020-46 46 00.

Nästa ansökningsperiod blir hösten 2000. Sista anmälningsdatum är ännu ej fastställd.

### Ansökan skickas till:

Rikspolisstyrelsen
Personalbyrån
Polisrekryteringen
Box 122 14
102 25 Stockholm

Märk kuvertet ”Polisutbildning”

www.arsivakurdi.org





# Em piştgiriya

**projeya**

# Daniela Miterand

**dikin ku ew dixwaze**

# kela Hewlerê

**restore bike.**

**Ji bo ev proje biserkeve Ferderasyon komîteyeke taybetî avakiriye û postgiroyeke taybetî vekiriye.**

## Numareya postgiroyê ev e:

## 132 4 9 43 -8

**Kurdiska riksförbundet**
**Stöd för Hewlers slott**

www.arsivakurd.org

## Armancên Federasyonê

**F K K S rêxistineke demokratîk e. Bi tu rêxistinên siyasî û olî ve ne grêdayi ye. Ji komele û yekîtiyên Kurd li Swêdê pêk tê.**

■ Kurdên li Swêdê temsîl dike û ji bo berjewendiya civata Kurd li Swêdê xebatê dike.

■ Kurdên li Swêdê di derheqa civata Swêdê de agahdar dike û ji bo çareserkirina pirs û pirsegirêkên Kurdên li Swêdê û ji bo pirsa integrasyonê xebatê dike.

■ Ji bo pêşdebirina ziman û belavkirina çanda Kurdî xebatê dike.

■ Ji bo çareserkirina pirsên jin û ciwan û zarok û handîkapên Kurd xebatê dike û ji bo pêşdebirina wan hewildide ku îmkanan amade bike.

■ Alîkariya penaberên Kurd dike û wan di derheqa mafên penaberan de agahdar dike. Ji bo başkirina rewşa wan hewil dide.

■ Gelê Swêdê di derheqa pirsa Kurd û Kurdistanê de agahdar dike û ji wan doza piştgiriyê dike.

■ Li dij zordestiyê piştgiriya tevgera gelê Kurdistanê ya li Kurdistanê û li derveyî Kurdistanê dike û ji bo parastina nasnameya neteweyî xebatê dike.

■ Bi rêxistinên demokratîk û civakî (çi swêdî,çi biyanî) re hevkarî dike.

■ F K K S ê ji bo mafên biyaniyan û penaberiyê li gor peymanên navnetewî û prensîbên beyana cîhanî ya mafên mirovan bên parastin dixebite.

# Komîteyên Federasyonê

Ev komiteyên Federasyonê di kongreya 18-em a Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê ku di 10 û 11-ê Nîsana 1999-an de li Stockholmê li avayiya ABF ê de pêk hat, hatin hilbijartin.

**Komîteya Karger**
Keya Îzol-*Serok*
Hamîd Gohary-*Sekreter*
Asî Rabatî- *Berpirsiyarê malî*
Kovan Amedî- *Berpirsiyarê karûbarê penaberan*
Selam Cizîrî- *Berpirsiyarê karê kulturî*
Adil Enwer- *Berpirsiyarê karê agahdarî û ragahandinê*
Fexrî Olçer -*Berpirsiyarê komîteya karê navxweyî*
Seyran Dûran(ji kontejana Komeleya Jinên Kurdistanê)

**Cîgir**
Evîn Çelen
Nîmet Celeblî
**Komîteya Giştî**
Salih Demir
Loqman Ertaş
Emîn Sindî
Gulîstan Elaltunbay
Şoreş Berzencî
Kamûran Şivan
Temûrê Xelîl
Nûrî Salih
Zînnet Bal
Ata Ala
Rahman Hesen
Îhsan Şener
**Cîgir**
Goran
Ahmed Sindî
Saîd Erdem
**Komîteya Rawêj**
Xalid Xoce
Şoreş Zîrek
Kemal Muhacir
Mustafa Aydogan
Azîz Aliş
**Cîgir**
Dîcle Qizil
Hecî Kardoxî
**Komîteya Rewîsor**
Reşîd Burhan
Weqas Çelîk
Felat Koçkaya
**Cîgir**
Şevîn Îzolî

www.arsivakurdi.org

# Komeleyên endam

Kurdiska Föreningen i Borlänge
Sturegränd 11, 784 32 Borlänge

Kurdiska Idrotts Föreningen
Box 152 16, 161 15 Bromma

Kurdiska Föreningen i Borås
Box 11129, 507 11 Borås

Kurdiska Föreningen i Eskilstuna
Box 14595, 630 14 Eskilstuna

Kurdiska Föreningen i Falköping
Box 146, 521 02 Falköping

Kurdiska Föreningen i Falun
box 6010, 791 06 Falun

Kurdiska Föreningen i Helsinborg
Visitörsg. 13, 252 47 Helsingborg

Kurdiska Föreningen i Gävle
Box 1277, 801 37 Gävle

Kurdiska Föreningen i Göteborg
Box 11102, 404 23 Göteborg

Kurdiska Föreningen i Hudiksvall
Valv. 15, 824 42 Hudiksval

Kurdiska Kultur och Solidaritetsföreningen
Box 225, 175 02 Järfälla

Kurdiska Föreningen i Jönköping
Box 8043, 550 08 Jönköping

Kurdiska Kultur Klubben
Box 130, 691 22 Karlskoga

Kurdiska Föreningen i Karlstad
Fagog. 11, 654 70 Karlstad

Kurdiska Föreningen i Kristinstad
Bataljonv.40, 291 37 Kristinstad

Kurdiska Föreningen i Linköping
Box 657, 582 07 Linköping

Kurdiska Handikappsföreningen i Linköping
Box 657, 582 07 Linköping

Kurdiska Kulturföreningen i Luleå
Box 170, 971 05 Luleå

Kurdiska Föreningen i Lund
Box 1633, 221 01 Lund

Kurdistans Fredsförening i Malmö
Fosilv. 29 B, 7 tr. 214 31 Malmö

Kurdiska Föreningen i Malmö
N.Gränsbergsg. 4, 214 55 Malmö

Kurdiska Föreningen i Märsta
c/o Gharib Adil,
Sleipersg 40, 195 54 Märsta

Kurdiska Föreningen i Norrköping
Kungsgatan 26, 602 20 Norrköping

Kurdiska Föreningen i Nynäshamn
Box 266, 149 01 Nynäshamn

Kurdiska Föreningen i Sala-Häby
Box 165, 733 30 Sala

Kurdiska Föreningen i Sandviken
Box 3070, 811 33 Sandviken

Kurdiska Föreningen i Spånga
Box 4118, 163 04 Spånga

Kurdiska Föreningen i Stockholm
Box 49090, 100 28 Stockholm

Kurdiska Författarföreningen
Box 49090, 100 28 Stockholm

Kurdiska Juristföreningen
Box 49090, 100 28 Stockholm

Kurdiska Föreningen i Sundsvall
Box 6025, 850 06 Sundsvall

Kurdiska Föreningen i Trollhätten
Box 6043, 461 06 Trollhätten

Kurdiska Föreningen i Umeå
Box 257, 901 06 Umeå

Kurdiska Föreningen i Upplandsväsby
Björkvalav. 29, 194 36 Upplandsväsby

Kurdistans Förening i Uppsala
Box: 3088 750 03 Uppsala

Svensk Kurdsika Föreningen i Uppsala
Box 25065, 750 25 Uppsala

Kurdiska Föreningen i Västerås
Box 1369, 720 13 Västerås

Kurdiska Föreningen i Örebro
Box 537, 701 50 Örebro

Kurdiska Föreningen i Östersund
Box 668, 831 27 Östersund

www.arsivakurdi.org

// Berbang

**Hejmar / No: 116**

Hezîran/ Juni 2000

Berbang organa
Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê ye
û ji du mehan careke derdikeve
*Utges av Kurdiska Riksförbundet i Sverige*

***Berpirsiyarê giştî / ansvarig utgivare***
Keya Îzol
*keya.izol@kurdiskarf.org*
*Kordinator*
Adil Enwer

**Redaksiyon / i redaktionen**
Hemed Gewherî
sekreter@kurdiskarf.org
Faris Marsil
Newzad Welî

***layout -pergela rûpelan***
F. Marsil
berbang@kurdiskarf.org

*Abonetiya salane / Prenumeration*

Ji bo kesan 100 SEK
Ji bo dezgehan/myndigheter 300 SEK
Ji bo welatên din 250 SEK
Bihayê yekane 25 SEK
*annons*
en hel sida 5000 SEK
*Navnîşan / Adress*
Berbang
Box 49090
S-100 28 Stockholm
SWEDEN
berbang@kurdiskarf.org
www.kurdiskarf.org
www.kurdchat
www.kurd.city
tfn 08-652 85 85 vxl
faks 08-650 21 20
Postgiro: 64 38 80-8
ISSN 0281-5699
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e. Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji derve tên, serrast û kurt bike.

Çapxane: APEC-Tryck

Dê û bavên hêja;

Berbang di rûpelên xwe de, cî dide anons û îlanên mizginiyê, jidayikbûnê, rojbûnê, sersaxiyê, wefatê û hwd.

Ev îlan û anons bê pere ne.
Ev kes yan jî malbatên ku dixwazin îlana rojbûna zarokên wan di nav rûpelên Berbangê de, derkeve divê rismek keça/lawê xwe ji Berbangê re bişînin û di dawiya risim de nav û paşnav û tarîxa dayikbûna wê/wî binivîsînin.

**XXX**

Berbang wek organa Fedearsyonê ji endamên xwe re bê pere tê şandin. Ew kesê/a ku endamê komeleyê Federasyonê ye û dixwaze Berbangê bixwîne, divê adresa xwe bi wasiteya komeleya xwe ji Berbangê re bişîne.

**XXX**

Berpirsiyarên komeleyên endam, endam û hevwelatiyên kurd dikarin bi xanepera Federasyonê, çalakî û xebatên Federasyonê agahdar bibin.

**www.kurdiskarf.org**

Under maj kommer en ny webbplats att öppna för kurder som vill chatta med varandra. Bakom satsningen från Kurdiska riksförbundet ligger projektet "generationskonflikt bland kurder som stöds av.

**www.kurdchat.com**

www.arsivakurd.org

# naverok







**Portre**

## "Pîza çêkirin hêsan e ya kitêb çapkirin"



**rûpel: 18-20**


Çalakiyên YJK 21

Komeleya Kurdistanê li Eskilstunayê 22

Civîn Çalakiyên Federasyonê 23

Nûçeyên malbatî 24

Konferansa Stockholmê û.. 6-7

Danezana Konferansa Stockholmê 8

Programa Konferansa Stockholmê 9

"Pîvanên Kopenhangê ji bo kurdan jî pêwist in lê ne bes in" 10-12

"Avakirina bendava Ilisuyê qetlîama tarîx û jîngehê ye" 13

"Tirkiye divê bi erzanî nebe endama Yekîtiya Ewrûpayê" 14-15

"Berîya ku Tirkiye bibe endama YE, divê li welatê xwe hemû pîvan û pêwistîyên siyasî bi cîh bîne" 16-17


# Innehåll


Stockholm konferansen 5

Slut Deklaration 6

Finns det mänskliga rättigheter i Sverige? 10

Ett folk, ett land 11


**Anna Lindh**

**"Vi kommer att fortsätta från svensk sida och vi kommer att samarbeta med de andra nordiska länderna för att verkligen ta upp Kurdernas frågor och problem i EU. Det har vi gjort hittills och det kommer vi att fortsätta att göra"**



**Sidan 8-9**

www.arsivakurdi.org

# Konferansa Stokholmê û....

**Faris Marsil**

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê di hefteya pêşîn a meha Hezîranê de li Stockholmê bi navê Konferansa Stockholmê 3 rojan civîn li dar xistin. Babeta van civînan "Berendametiya Tirkiyê ya Yekîtiya Ewrûpayê û Pirsa Kurdî" bû. Di dawiya van sê rojên konferansê de danezanek ji raya giştî re hat belavkirin. Di rûpelên Berbangê de hûn ê tavahiya danezanê him bi kurdî û him jî bi swêdî bixînin.

Raya giştî haydar e ku hukûmet û dewleta Swêdê di warê demokrasî û mafên mirovan de gelek hesas e. Wê hergav di vî warî de rexne û dîtinên xwe bi fermî pêşkeş kirine. Di dema berandambûna Tirkiyeyê a ji bo Yekîtiya Ewrûpayê (YE) de Swêd yek ji wan endamên YE bû ku dixwest berê ku berandametiya Tirkiyeyê ya YE bê pejirandin, divê ew bi awayekî gav bavêje û pirsa kurdî çareser bike û di vî warî de jî bi taybetî Wezîra Swêdê ya Karûbarê Derve Anna Lindh ketibû nava hewildanekê. Li gor agahdariya min diviyabû Anna Lindh jî beşdarî vê konferansê bibûna lê ji ber programa xwe, nikaribû beşdariyê bike.

Lê em hevpeyvîna ku serokê Komeleya Kurdistanê yê Eskilstunayê Cemil Demircan û Redaktorê kovara Araratê -ku organa vê komeleyê ye- Azîz Aliş di meha Gulanê de bi Wezîra Swêdê ya Karûbarê Derve Anna Lindh re kiribûn û di Araratê de hatibû weşandin, careke din di Berbangê de diweşînin. Em bawer in hûn ê bi kêf vê hevpeyvînê bixwînin.

Konferans ji aliyê Federasyon û ABF hatibû organîzekirin. Vekirina konfernasê serokê ABF Göran Eriksson kir.

Ji aliyê swêdiyan ve; seroka Komîteya Swêdî ji bo Mafê Mirovî ya Kurdan Marianne Andersson û parlamentera sosyaldemokrat Cinnika Bejning beşdarî konfernasê bûn.

Serokê Partiya Demokrasî û Aştîyê (DBP) Yilmaz Çamlibel li ser babeta "Yekîtiya Ewrûpayê, Tirkiye û Pirsa Kurdî" tebligatek pêşkêşî konferansê kir. Ew dûr û dirêj li ser rewşa Tirkiyê û berandambûna wê ya Yekîtiya Ewrûpayê rawestiya û li ser rewşa aktuel û hewildanên nû yên kurdan ku di warê partiya legal de tên avêtin, sekinî. Hûnê tevayiya metna wî bi zimaneke sade bixwînin.

Şexmûs Diken yek ji endamê ÇEKUL (Weqfa Parastina Nirxên Kulturî û Hawîrdorî yên Jîngehê) bû ku li ser projeya bendava Ilisuyê sekinî û xeteriya ku bajarê dîrokî Hesenkêf bi avakrina vê bendavê di bin avê de bimîne. Gotarvan di beşa xwe de serkeftî bû û bi "diayan" Hesenkêf anî ber bi çavên guhderan. Dibe ku ji bo hin xwendevanan ne balkeş be, lê bi mîrata xwe ya tarîxî û kulturî Hesenkêf ciyekî girîng distîne û divê her partî, rêxistin, komele, weqf û dezgehên din û her welatpwerwer xwedî li Hesenkêfe derkeve da ku di bin avê de nemîne. Bi kurtayî be jî em ê ji axaftina wî pêşkêşî we bikin.

Mehmet Vural yek ji birêvebirê Weqfa Mafê Mirovî ya Diyarbekirê ye û li ser binpêkirina mafên mirovan li Kurdistanê rawest. Û pêşniyazên xwe ji bo çaerserkirina pirsa kurdî ku dema Tirkiye berendamê Yekîtiya Ewrûpayê ye pêşkêşî konferansê kirin. Hûnê bi nivîsa wî careke din bi faktan haydar bibin ku, di dema berandambûna xwe ya YE de jî, Tirkiye çawa mafên mirovî li Kurdistanê îhlal dike.

## Kesên beşdar û nebeşdar

Di roja sêyem a Konfernasê de berpirsiyarên rêkxistin û dezgehên demokratîk û kulturî yên kurdî ku li Ewrûpayê kar û barên xwe dimeşînin dîtin û pêşniyazên xwe pêşkêşî konferansê kirin.

Li ser navê Federayona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê Keya Izol, li ser navê Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê Bilal Görgü, Li ser Weqfa Kitêbxaneya Kurdî li Swêdê Nedim Dagdeviren, Li ser navê Enstituya Kurdî ya Parîsê Reşo Zîlan, li ser navê Komkarê Fettah Timar, li ser navê Buroya Kurdî ya Peywendî û Agahdarîyê li Brukselê Cemal Sönmez, li ser navê Komeleya Demokratîk ya Kurd li Rogalandê (Norweç) Salih Kara, li ser navê Komeleya Navneteweyî ya Mafên Mirovî li Kurdistanê-Almanya Sertaç Bûcak, beşdarî civînê bûn. Her yek ji wan li ser çalakiyên xwe sekinîn û derheqê van çalakiyan de agahdarî dan konferansê.

Herçiqas Hevkar, Civata Kurd û Enstituya Kurdî ya Brukselê jî hatibûn vexwendin, lê ew bêşdarî konferansê nebûn.

Lê di encama civînê de derket holê ku rêxistinên demokratîk hemfikir in ku xebata xwe ya ji bo hişyarkirina raya giştî ya Ewrûpayê bikin yek û hewil bidin ku vê xebata xwe di nav rêxistinên kurdan yên Ewrûpayê de berfirehtir bikin.

www.arsivakurdi.org



Du dîmen ji Konferansa Stokholmê

## Kêmasî

Ji ber Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê di demekê kin de ev konferans amede kiribû, di amedekirina wê de hinek "bêamaedekarî" hebû. Li gel karê teknîkî, ev him ji aliyê beşdarbûn û him jî ji aliyê beşdariyê de weha bû. Hejmara kesên guhdar di van sê rojan de, negihaşt sê reqaman.

Ji aliyê din ve xeynî ji kesên ku ji Tirkiyeyê hatibûn yên din bi haziriyeke rêkûpêk nehatibûn civînê. Bi taybetî jî ew rêxistinên demokratîk yên Ewrûpayê di warê "Berendambûna Tirkiyeyê ya Yekîtiya Ewrûpayê û çareserkirina pirsa kurdî de" çu tebligat pêşkêşî konferansê nekirin.

Federasyon di dema berendambûna Tirkiyeyê de, bi nameyeke welatên endam yê Yekîtiya Ewrûpayê agadar kiribû û di vî warî de daxwazên xwe ji wan re pêşkêş kiribûn, lê di vê konferansê hin bi teferûat dokumansiyoneke pêşkêşî konfernasê bikira.

Lê dîsa jî ya girîng ew bû ku di encama civînê de daxuyaniyeke hevbeş derket û beşdarên civînê îradeya xwe bi beyanekê dan xuya kirin.

## Sipasî

Federasyon spasiyên xwe pêşkêşî wan kesan dike ku di van sê rojên civînê de ew bi alikariyên xwe piştgiriya Federasyonê kirine. Bi taybetî jî sipasiyên xwe ji xwediyên aşxaneyên kurdan "City Krog" û "Britanien" re dike ku mêvanên konferansê ezimandin xwarinê.

Herweha em sipasiya Remzî Kerîm ji bo wergeriyê dikin.

.............

## Lêbûhrîn

Di hejmara berê de (hejmar: 115) de hin xeletî di Berbangê de hebûn.

Xeletî hinek kêmasî, hinek naverokî û hinek jî teknikî bûn.

Dewrim Nûjen yek ji beşdar û axaftinvanên civîna projeya "Generatonskonflikt" ê ya li Nynäshamnê bûbû. Di hejmara berê de di nûçeya "nakokiya di nav nifşan de" me ji bîr kiribû ku binivîsinin.

Di nameya Birêz Nêçirvan Barzanî ku ji Yêkîtiya Jinên Kurdistanê re şandibû, de hevokeke weha derbas dibû:...Nameye we ya dîrokî me xwend û em li ser rawestiyan.

Rastiya hevokê divê weha be:...Nameye we ya bêtarîx me xwend û em li ser raswestiyan.

Di mesaja PSKê de ku ji bo pirozbahiya Newrozê ji şeva Federasyonê re hatibû şandin de, hîn xelatî hebûn. Mesaj di seeta dawiyê de ku êdî Berbang ber çapê bû, bi faksê gihaşt destê redaksiyonê. Hevalên redaksiyonê bi skanerê metinê derbasê komputorê kiriye û bêy ku kontrol bike, mizanpaja wê kiriye. Ji ber ku "metna faksê nepakij bû" û skaner jî nikare hin herfên kurdî bixwîne çewtiyên herfan derketibûn.

Em wek redaksiyon xetayên xwe qebûl dikin û lêburînê ji xwendevanan û ji PSKê dixwazin.

www.arsivakurd.org

# Danezana Konferansa Stockholmê

Bi însiyatîfa Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, di navbera 2-4ê hezîrana 2000î de, çend rêxistin û dezgehên Kurdên ji Swêd, Norwec, Almanya, Fransa û Belçîkayê li Stockholmê civîyan. Di civînê de berendametîya Tirkiyê ya Yekîtiya Ewrûpayê û mafên kurdan hat muneqeşe kirin.

Piştî muneqeşeyên berkeftî hat diyarkirin, ku divê hevkariyeke rêkxistî di navbera rêxistinên demokratîk yên kurdan de bête afirandin. Herweha divê, tecrûbeyên xwe pev biguhurînin, pirsên xwe yên hevbeş mineqeşe bikin û rayeke giştî li Ewrûpayê li gor biryarên jêrîn bînin holê.

■ Gelê Kurd wek neteweyekî dabeşkirî di navbera Tirkiyê, Îran, Îraq û Sûriyê de, bêguman xwedî maf e, ku bikaribe çanda xwe bi kar bîne û bi zimanê xwe yê dayîkê xwe perwerde bike û îdareya welatê xwe bi destê xwe bike.

■ Em bi yekdengî kriterên ji aliyê hêzên navneteweyî û Yekîtiya Ewrûpayê ve hatine danîn, bi taybetî jî kriterên Kopenhagenê, bi kêmanî bibin rênîşander ji bo çareserkirina pirsa kurdî li Tirkiyê ya di dema berendametîya wî ya Yekîtiya Ewrûpê de.

■ Em gelek qimetê didin pêşveçûnên sîyasî, civakî û çandî li başûrê Kurdistanê. Em bangî hemû hêzên kurdan û yên navneteweyî dikin ku pişgirîya vê pêşveçûnê bikin. Em di eynî wextî de nerazîbûna xwe ya xurt li hember êrişên leşkerî yên domdar û gefxwarinên leşkerî yên Tirkiyê, herweha yên hemû hêzên din, diyar dikin û wan wek rêlibergirtina pêşveçûnên demokratîk dibînin.

■ Federasyona Kurdistanê li Swêdê bi pêşniyareke hevbeş însiyatîvê werdigire da ku konferanseke navneteweyî li dar bixe ku tê de daxwazên kurdan ji bo aktorên Yekîtiya Ewrûpayê û herweha yên navneteweyî bîne zimên. Em gelekî qîmetê didin wê yekê ku ev konferans di dema seroketîya Swêdê ya Yekîtiya Ewrûpayê de pêk bê.

■ Em hemfikir in ku xebata xwe ya ji bo hişyarkirina raya giştî ya Ewrûpayê bikin yek. Ji bo pêşniyarên praktîkî û strukturî komisyonek hatiye damezrandin. Emê hewl bidin da ku vê xebata xwe di nav rêxistinên kurdan yên Ewrûpayê firehtir bikin.

Stockholm, 4/6-2000

---

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê
Weqfa Kitêbxaneya Kurdî
Weqfa Kulturî ya Kurdî li Stockholmê
Enstîtuya Kurdî Ya Parîsê
Federasyona Komeleyên Kurd li Almanyayê (KOMKAR)
Bîroya Kurdî Ya Peywendî û Agahdariyê li Brukselê
Komeleya Demokratîk Ya Kurd li Rogalandê (Norwec)
Komeleya Navneteweyî ya Mafên Mirovî li Kurdistanê -Almanya

www.arsivakurdi.org

 

# KONFERANSA STOCKHOLMÊ

## 2-4ê Hezîrana 2000î Li ABFê,

**PROGRAM**

Înî 2-6.2000

10:15-12:00 **KRÎTERÊN Kopenhagê Pirsa Kurd û berendametîya Tirkiyeyê ya ji bo Yekîtîya Ewrûpayê**

Marianne ANDERSSON, Seroka Komîteya Swêdî ya ji bo Mafên Kurdan yên mirovî
Cinnika BEJNING, parlamentera swêdî (Partiya Sosyaldemokrat)

13:00-16:00 **Li Tirkiyeyê pêvajoya xebata partîyên legal**
Yilmaz ÇAMLIBEL, (DBP)

**Şemî 3-6-2000**

12:00-16:00 **Mafê mirovî û Kurd**
Mehmet VURAL Weqfa Mafê mirovan (TIHAV)
Sehmûs DIKEN, Şêwirendê Belediyeya Diyarbekirê û endamê ÇEKULê,

**Yekşem 4-6-2000**

12:00-15:00 **Pêywendî di navbera rêxistinên kurdên li Ewrûpayê**

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, Enstîtuya Kurd li Parisê ,Komka, Komeleya Kurd li Stavangerê(Norvec), Buroya Kurdî ya Pêywendî û agahdarîyê li Brukselê , Komeleya Mafê Mirovatîya Kurdanya Navneteweyî, (IMK), Weqfa Kulturî ya Kurdî li Stockholmê, Weqfa Kitêbxaneya Kurdî,

**Amedekar: FKKS, ABF**

www.arsivakurdi.org

# ”Pîvanên Kopenhangê ji bo me kurdan jî pêwîst in, lê ne bes in”



**Yilmaz Çamlibel**
Serokê Partiya Demokrasî û Aştiyê (DBP)

### Pirsa kurdî çawa ket bernameya Tirkiyeyê

Di dewra Osmaniyan de gelek miletên curbecur bi hev re dijiyan. Ji van miletan yek jî kurd bûn. Ev milet bi navê kurd û Kurdistanê li ser axa bav û kalê xwe dijiyan.

Di dema damezirandina Komara Tirkiyeyê de jî rewş wisa bû. Mustafa Kemal di nameyên ku ji serokên kurdan re şandibû de, digot;” Em. bi hev re pêşberê dijminan şer bikin. Bi hevre dewleteke muşterek ava bikin.”

Di kongreyên Erzirom û Siwasê de biryar hatibû girtin; ”Ev dewleta ku tê damezirandin, dewleta tirk û kurdan e.”

Di Lozanê de gava Lord Gurzon qala dewletekê kurdan dikir, Ismet Paşa digot; ”Em bi kurdan re dewletek muşterek ava dikin. Hewcedariya wan bi dewletekê cuda nîne.”

Di dewra hilweşandina imparatoriya Osmanî de , kurd jî wek miletên din dikaribûn bibin xwedan dewletekê serbixwe. Lê kurd li ser soza kemalistan, bo dewleteke muşterek, bi wan re hevkar bûn.

Piştî damezirandina komara Tirkiyeyê, hebûna kurdan hat înkarkirin. Navê kurd û Kurdistanê hat qedexekirin. Bi vê celebê pirsa Kurdî, ket nav rojeva Tirkiyeyê. Li ser vê siyaseta xelet di dîroka komara Tirkiyeyê de miletê kurd 29 caran serî hilda û şer kir. Lê rewş tu carî nehat guherandin. Bi milyonan meriv koçber bûn. Xwîn hat rijandin. Gund û bajêr hatin wêrankirin. Gelek serokên kurdan hatin dardekirin.

Êdî divê herdû alî jî qebûl bikin ku, ne kurd bi şer mafê xwe yê neteweyî stend, ne jî dewleta Tirkiyê dengê kurdan birrîn. Xuya ye ku problem dê bi diyalog û aştî were çareserkirin.

Di damezirandina komara Tirkiyeyê û vir ve hemû karbidestên Tirkiyeyê dibêjin; ”Ataturk rêberê me ye, em di rêya wî de dimeşin”. De fermo gotina serokê xwe bînin cî û dewletê bikin dewleta Tirk û Kurdan.

### Qanûna esasî ya 1961ê û dûmakîka wê

Piştî qanûna esasî ya 1961ê, rewşa Tirkiyê hat guhertin. Çerçeweya azadî û demokarsiyê piçek fireh bû. Di vê demê de ji bo kurdan, karkiran, elewiyan, jinan û rewşenbîran îmkanên xebatên çandî, hunerî û siyasî çêbûn. Partî û komleyên hevdem hatin avakirin. Civat hişyar bû û qala mafê xwe kirin.

Karbidestên Tirkiyeyê ji vê hişyarbûnê aciz bûn. Ji bo pêşiya vê pêşveçûnê bigrin gelek dafik danîn. Bi destê ajanan, xwendekarên unîwersiteyê ber bi çekdariyê ve kişandin. Dev-Genc dev ji siyaseta legal berda, bû îllegal û ji bo têkoşîna çekdariyê bangê millet kirin.

Rêvebirên dewletê van buyaran kirin bahane û di 12 Adara 1971an de mudaxeleya faşist hat ser hukim. Sê serokên Dev-Gencê hatin daredekirin. Hinek hatin kuştin û gelek ji wan avêtin zindanan. Qanûna esasî û yê din hatin guhertin. Çerçeweya azadî û demokrasiyê hat tengkirin.

Ev proje bi alîkariya karbidestên Tirkiyeyê, di sala 1980î de bo kurdan jî hat bikaranîn. Bi destê PKKê kurd jî ketin nav dafikê. Di nava 15 salan de 4 hezar gund hatin valakirin. 3 milyon kurd bûn koçber. 30 hezar ciwanên kurd hatin kuştin. Li gel vê jî kurd tiştekî bi dest nexistin. Abdullah Ocalan jî îtîraf kir ku ev şer, ji bo pêşveçûn û geşbûna têkoşîna kurdan bû astengek mezin.

Di navbera salên 1960-80î de di nav gelê kurd de, hişyarbûneke mezin çêbû. Gelek siyasetvanên kurd di nav TIPê de kar dikirin. Gelek rewşenbîr û ciwanên kurd komel û dezgeh avakirin. Rojname, kovar û kitêb hatin weşandin. Milet rabû ser piya. Behsa heqê xwe yên neteweyî û mirovî kirin.

Karbidestên Tirkiyeyê nikaribûn pêşiya vê prosesê bigrin. Ji bo wê jî kurdan kişandin nav şer û pêşveçûna kurdan hat sekinandin. Ev hebûna ku bi keda milyonan hatibû afirandin, hat pelixandin.

### Rewşa Tirkiyê ya îroyîn çawa ye?

Ev herêma ku Tirkiye jî tê de cî digre herêmeke pirrrengî ye. Gelek qewim li vir cîh û war bûne. Dewlet damezirandine û kultur afirandine. Miletê kurd jî yek ji wan e.

Li Tirkiyeyê gelek gel, zimên, çîn, kultur, ol û mezheb hene. Dewleta Tirkiyeyê hinek ji wan diparêze hinekê

www.arsivakurdi.org

din jî dipelixîne. Kemalîst ev 77 sal in, dixwazin ev civata pirhejmarî bikin yekhijmar. Hemû problemên civatê berhema vê siyaseta xelet e.

Partiyên ku sazûmana Tirkiyeyê diparêzin ne demokrat in. Partî di bin zordariya serokên xwe de ne. Serokên partiya nahêlin millet bikeve nav siyasetê. Siyaset ji bo millet ew e ku ji pênc salan carek dengê xwe bikarbînin. Guhartinên ku gel daxwaz dike, di meclîsê de nayê zimên. Çunkî dewle naxwaze berpirsiyarên milet bikevin meclîsê.

Li gor qanûna Tirkiyeyê, tu partî nikare bêje, li Tirkiyeyê xeynî tirkan miletekê din heye. Xeynî çand, zimanê tirkan, çand û zimanekî din heye.

Li Tirkyeyê ji bo kurdan ne tenê xebatên siyasî, herhewa kar û xebatên hunerî jî qedexe ye. Ji bo van sedeman gelek rewşenbîr û siyasetmedarên kurdan eza û cefa kişandine, ketine zinadanan, hinek jî wan jî hatine kuştin. Ev rewşa xeter hin jî berdewam e.

Tirkiye dewletek kapitalîst e. Lê çîna kapitalîstan li ser hukim nîne. Dewlet bi destê birokrata tê îdare kirin. Siyaset di bin bandora generalan de dimeşe. Bê îzna wan li Tirkiyeyê tu gav nahên avêtin.

Beşek ji kapîtalîstan dixwazin bibin endamê Yekîtiya Ewrûpayê(YE). Lê beşa bazirganiyê dixwazin bibin parçayekî Rojhilata Navîn û ola xwe jî biparêzin. Ev beş naxwaze bibe endamê YE yê.

Bi kurtayî li ber endametiya YE gelek astengî hene. Ev riyek dûr û dirêj e. Li ser vê riyê gelek dafik hene. Ez nebawer im Tirkiye ji bo guhartinên bingehîn gav bavêje. Di vî warî de karbidestên Tiriyeyê gelek caran niyetên xwe eşkere dikin; "Dibêjin bila YE bi vê halê me, em. qebûl bikin".

## Li Tirkiyeyê rewşa muxalefetê çawa ye?

**"Kêmasiyek jî ew e ku, muxalefet bi hevre alîkarî nakin. Karbidestên Tirkiyeyê nahêle muxalefet di navbera xwe de platformên yekitî û hevkariya çêkin. Wan li dijî hev bi kar tînin, berê hev didin. Nahêlin di nav milet de aştî, hevaltî û hevalbendî hebe. Bi saya vê siyasetê bi hêsanî welêt îdare dikin."**

Îro li Tirkiyeyê, kurd, karkir, misulman, elewî û jin muxalefeta bingehîn in. Muxalefeta herî dînamik kurd, karkir û musulman in. Lê mixalefeta kurdan ji yên din dijwartir e.

Hinek kes dipirsin: "Li Tirkiyeyê gelek eqaliyet hene, hûn çima kurdan ewqas derdixin pêş? Hûn ji kurdan re mafê taybetî dixwazin ? Ma ev neheqî nîn e?

Belê rast e, li Tirkiyeyê qedera 40 heta 50 eqaliyet hebûn. Lê nuha hejmara wan ji 15 derbas nabin. Yên din di encama siyaseta asimlasyonê de hatin helandin û wenda bûn. Xeynî kurda tu eqaliyet daxwaza mafê ziman û çanda xwe nakin.

Kurd ev 77 sal in li pêşiya sazûmana Tirkiyeyê rabûye ser lingan. Dawa heqê xwe yê mirovî û neteweyî dike. Ev cudatî ji kuderê tê? Ev jî nîşan dide ku, kurd ne eqaliyet in, kurd neteweyekî qedîm a Rojhilata Navîn e.

Li Tirkiyeyê him ji bo kurdan û him jî ji bo muxalefeta din xebatkirin zahmet e. Li pêşiya wan gelek astengên aborî, huqûqî, kulturî û siyaasî hene. Ji ber van sedeman li Tirkiyeyê muxalefeta xurt nîne û nikare dewletê ber bi demokrasiyê, aştî û wekheviyê ve bidafîne.

Kêmasiyek jî ew e ku, muxalefet bi hevre alîkarî nakin. Karbidestên Tirkiyeyê nahêle muxalefet di navbera xwe de platformên yekitî û hevkariya çêkin. Wan li dijî hev bi kar tînin, berê hev didin. Nahêlin di nav milet de aştî, hevaltî û hevalbendî hebe. Bi saya vê siyasetê bi hêsanî welêt îdare dikin.

## Endametiya YE dê ji bo Tirkiyeyê çi bîne?

Dinya me ya îroyîn ne wek berê ye. Dewlet, milet û hemû mirovên dinyayê êdî ji hev haydar in. Li kuderê çi bibe, êdî herkes dibihîze. Her meriv, komel û millet berbirsiyariya xwe ya dinyayê hildide ser milê xwe. Mafê mirovî, demokrasî, aştî û wekhevî bûye armancekê enternasyonalî.

YE jî dixwaze hemû milet, zimên, kultur, ol, mezheb hev bi nasin. Ji hevre hurmet nîşan bidin. Di nav jiyaneke aştî de bi hevre serfirazî û serbilindî bijîn.

Em. jî jiyaneke weha dixwazin. Em. dixwazin Tirkiye bibe dewletek pêşverû û hevdem. Ji bo vê yekê jî DBP endametiya Tirkiyeyê diecibîne û ji bo vê armancê kar dike.

Lê ez nebawer im ku karbidestên Tirkiyeyê ji bo endametiya YE guhartinên ku jê tê xwestin bîne cî.

## Çareserkirina Pirsa Kurdî

Li gor dîtina min pirsa Kurdî baş nahê fehmkirin. Ku ev pirs bi zaniyarî nehê fehmkirin, tu carî nayê çareserkirin.

Wek ku min di destpêkê de jî got kurd ne eqaliyet e, kurd neteweyekî qedîm e. Xudan çand û huner û dîrok e.

www.arsivakurdi.org

Li Tirkiyeyê gelek mirov, hin jî dibêjin kurd tunene, hinek din hebûna wan qebûl dikin, lê mafê wan yê neteweyî û mirovî qebûl nakin. Hinek ji bo çareserkirina vê pirsê projeyên çewt çêdikin. Dafikên ecêb datînin pêşiya kurdan. Pir mixabin hinek kurd jî dibin şirîkên van projeyan.

Serokwezîrê Tirkiyeyê Bulent Ecewit di 28ê Adarê de di huzûra komîsyona sosyalîst a YE de weha got; "Kurdî zaravayekî zimanê tirkî ye. Pirsa kurdî jî ji sazûmana feodaliteyê tê. Ger paşdemayîna vê herêmê ji holê rabe, pirs jî ji holê radibe.

Li ser vê gotîna wî min jê re nameyekê şand. Min di nameya xwe de got; "Tu ji zimanê kurdî fêhmnakî, mademkî tu dibêjî ev problemek feodalî ye, tu çima mêrg û çîmen û zêviyên ku di bin destê axayê kurdan de ne ji wan nastînî û nadî gundiyên kurdan? Bi vî hawî him feodalî û him jî pirsa kurdî ji holê radibe."

Paşdemayina herêma kurdan rast e. Lê ev herêm wek herêma Tirkiyeyê pêşve here, gelo pirs ji holê radibe?

Ocalan jî di rojên dawiyê de dibêje ku; " Kurd ne netewe ye. Daxwazên federalî û otonomî dibe sedemên aloziyên civatê. Ger zimanê kurdî serbest be, pirsa kurdî çareser dibe." Qedexebûna zimanê kurdî rast e. Ma gelo ziman û kultura kurdî serbest be gelo pirs ji holê radibe!

Xuya ye sê argumenên pirsa kurdî hene. Yek aborî ye. Yek ziman û çand e. Yek jî siyasî ye. Ger ev sê argûmen bi hev re neyên çareserkirinê, pirsa kurdî tu carî ji holê ranabe.

Ji bo endametiya YE yê problema herî mezin pirsa kurdî ye. Ger pirsa kurdî neyê çareserkirin, li Tirkiyeyê problemên aborî, aştî, demokarsî, huqûqî û siyasî nayên çareserkirin. Pirsa kurdî kilîta hemû problemên Tirkyeyê ye.

Di van demên dawiyê de him li Tir-



**"Komara Tirkiyeyê li ser wêranbûna Imparatoriya Osmanî hat avakirin. Lê gelek tişt li gor rejima nû nehat guhartin. Îro jî li Tirkiyeyê dewlet hê jî wek berê muqeddes e. Milet hê jî ne şaxsiyet e tabiyê dewletê ye. Rexnegirtina dewletê sûc e. Ji ber van sedaman li Tirkiyeyê maf û azadiyên şexsî bêşik qezencek giranbuha ye?"**

kiyeyê û him jî li welatê Ewrûpayê gelek rewşenbîr, siyasetvan û komel dibêjin; "Ger şertên Parîsê û pîvanên Kopenhangê li Tirkiyeyê bikeve jiyanê, mafê mirovî û demokrasî pêşve here dê pirsa kurdî çareser bibe" Ev gotin ne rast in û ne jî realîst in.

Komara Tirkiyeyê li ser wêranbûna Imparatoriya Osmanî hat avakirin. Lê gelek tişt li gor rejima nû nehat guhartin. Îro jî li Tirkiyeyê dewlet hê jî wek berê muqeddes e. Milet hê jî ne şaxsiyet e tabiyê dewletê ye. Rexnegirtina dewletê sûc e. Ji ber van sedaman li Tirkiyeyê maf û azadiyên şexsî bêşik qezencek giranbuha ye?

Mafên file û cuhuyan li gor peymana Lozanê hatiye nasin. Lê ew nikarin ji van heqan îstifade bikin. Mirovekî file nikare emlakekê xwe bide weqfek fileyan. Dêr û sinegog bêîzna dewletê nayên tamîrkirin. Ji bo van sedeman maf û azadiyên eqaliyetan jî gelek muhim e.

Ger ev mafên bingehîn li Tirkiyeyê bikevin jiyanê, bêşik kurd jî dê jê îstifade bikin. Lê pirsa kurdî ne pirseke şexsî ye, pirsekê civakî ye. Karbidestên dewletê dibêjin; "Kurd xwedan heq in, ew dikarin bibin parlamenter, serokwezîr û fabrîkator." Belê ev rast e. Lê ji kîjan kurd re. Kurdê ku neteweya xwe înkar dikin û dibêjin; "Kurd tirk in" bi rastî ew dikarin bibin her tişt.

Kurd divê ne tenê ji bo mafên xwe yê şexsî her weha ji bo mafên xwe yên neteweyî jî xebat bikin.

Bi kurtî pirsa kurdî pirsekî neteweyî ye. Ji bo wê jî divê hebûna gelê kurd bête nasîn. Heq û huqûqa neteweyî ya kurdan bê qebûlkirin. Çi heq ji gelê tirk re hatiye nasîn, ne kêm û ne zêde divê ji bo kurdan re jî bê nasîn.

DBP dixwaze sazûmana Tirkiyeyê, li gor peymanên ku ew jî îmze avêtiye binî, bête guhartin. Li gor şetên Parîsê û pîvanên Kopenhangê gavên demokratîk werê avêtin.

Lê em. dixwazin bala herkesî bikşînin ser noqtekî. Şertên Parîsê û pîvanên Kopenhangê ji bo me kurdan jî pêwîst in, lê ne bes in.

www.arsivakurdi.org

# "Avakirina bendava Ilisuyê qetlîama tarîx û jîngehê ye."



**Şêxmûs Diken**
Yek ji birêvebirên ÇEKUL(Weqfa Parastina Buhayên Kulturî û Hawîrdorî yên Jîngehê)

Ev weqfa hane ji bo parastina buhayên tarîxî yên Diyarbekir, Mêrdîn û Midyadê karekî aktiv dike.

Şêxmus Diken bi filmên diayê Hesenkêf anî ber çavê guhdaran û dîmenên curbecur ji bajarê Hesenkêfê pêşkêşî temeşavan kirin. Ew li ser dîroka Hesenkêfê, şikefta wê, mizgefta mezin, şûnwarê medresê û pira wê peyivî.

Hesenkêf ji aliyê nirxên kulturî ve deverek dewlemend e. Lê tabloyek xemgîn e ku heta nuha zêdetir me xebata xwe daye karê siyasî yên ekstrem û xwedî li van buyayiyên xwe yên tarîxî û kulturî derneketine.

Ş. Diken li ser cografya û tarîxa Hesênkêfê sekînî û got; "Hesenkêf bi ava Dicle û Firadê tê xemilandin, beşek ji Mazopotamyaya jorîn e û kultura rojhilat û Anadoliyê li vir digihîje hev. Lê ev dever devereke wilo ye ku ev erdên ku bikevin ber bendava Ilisuyê yek ji wan erda ne ku herî kêm di warê arkolojiyê de hatiye kolandin.. Tiştên ku di encama van arkelojiyan de li van deran derketine nîşan didin ku jiyaneke civakî ya tevlihev û medeniyeta herî kevn li vê deverê destpêkiriye û li vir çûye aliyên din yên dinyayê. Hesenkêf ji demên berê heta nuha bûye wargeha mirovan. Bi taybetî jî di dema Roma û Bizansan de bûye wargehê leşkerê wan. Di qirnê navîn de yek ji wan wargehên herî girîng yê Anadoliyê bû.

Hesenkêf bi harmoniya xwe harikayeke xwezayê ye. Pira Herapê ku kemera wê 40 metre ye; keleya wê ya bilind û tevî tiştên din yên Hesenkêfê ligel tehrîbkariya bi hezar salan jî şahîdên harîkabûna Hesenkêfê ne. "

Ş. Diken di axaftina xwe de li ser avakirina bendava Ilisuyê sekînî û got "Ev Hesenkêfa dîrokî ku hîn lêkolînên arkeolojîk lê nehatine kirin û gelek berhemên din yên tarîxî bi çêkirina bendava Ilisuyê dê di bin avê de bimînin. Endişeyên ku ev bajêr di bin avê de nemînin weha kiriye ku îro gelek kes û derûdor ji bo parastina Hesenkêfê civîn çêdikin, yanî avakirina bendavan dê bibin destpêka qelîama tarîx û jîngehê. "

Li gorî Ş. Diken " civînên ku li Ewrûpayê tên kirinn qala mafên mirovî û îhlalkirina wan dikin lê di van civînan de kes li ser binlpêkirina kultur û tarîxî napeyive. Wezîfeya medeniyetê ew e ku wan teslîmî nifşê nû bike ne ku xerab bike."

Ew li ser çend alternatîfên ku nehêle Hesenkêf di bin avê de bimîne rawesta û ev alternatîf weha rêz kirin: Yek ji wan daxistina koda ava barajê ye., yekê din barkirina ew buyayên kulturî ne ku din avê de bimînin. "

Ji bo zelalkirina projeyê bendava Ilisuyê Ş. Diken li ser hinek pirsan sekinî û di vî warî de jî weha got; "Bendeva Ilisuyê ji bo Tirkiyeyê tê çi mahneyê?, Di pêşxistina Tirkiyeyê de rola barajê çi ye û umrê wê de çiqas be? Cih û giringiya Hesenkêfe yên ku di bin avê de bimînin, girîngiya wan di tarîxa me ya kulturî de çi ne? Piştî wendekirina vê zenginiya tarîxî û kulturî dê çi bê şûna wan?

**" Divê berê her tiştî bajêr di ciyê xwe de bête parastin. Umrê bendeva Ilisuyê ku bê avakirin 70 yan jî 80 sal e. Yanî piştî 70-80 salan dê balansa vî erdî bête xerabkirin û li vir bibe zibilxaneya beton û hesinan."**

Wî di axaftina xwe de bersiva van pirsan da û got; " Divê berê her tiştî bajêr di ciyê xwe de bête parastin. Umrê bendeva Ilisuyê ku bê avakirin 70 yan jî 80 sal e. Yanî piştî 70-80 salan dê balansa vî erdî bête xerabkirin û li vir bibe zibilxaneya beton û hesinan."

Di dawiya axaftina xwe de wî got ku; "bi plankirineke rast û bi nêrîneke kamil divê meriv li meseleyê binêre, dilê me qet naxwaze ku ji bo bendaveke emirkin em tarîxeke evqas dirêj telef bikin. Ji ber ku bi teknolojiya îroyîn mirov dikare pêwistiya enerjiyê bi awayên din jî bi dest bixe. Yanî mirov di şûna ku tarîxa xwe tahrîb bike dikare bi riya bayê û tavê enerjî bi dest bixe.. Divê Hesenkêf ne di cd yan de, le li ciyê xwe bijî. Eger em nikaribin bi parastina Hesenkêfê mijûl bibin, dê zarok û nebiyên me hesab ji me bipirsin."

www.arsivakurdi.org

# "Tirkiye divê bi erzanî nebe endama Yekîtiya Ewrûpayê"



**Mehmet Vural**
(Yek ji birêvebirên Weqfa Mafên Mirovî ya Diyarbekirê)

Dewleta Tirkiyeyê ji avabûna xwe heta nuha bi problemên aborî, civakî û siyasî mijûl bû. Zîhniyeta Itihad û Terakî ya ku komara Tirkiyeyê ava kiriye, hîn berdewam e, naveroka wê ya siyasî şovenîzm e; bingeha wê yek millet, yek dewlet û yek kultur e, ev îdelojî bingeha problemên cîvakî yên ku îro li Tirkiyeyê rû daye.

Ji 75 salên Komara Tirkiyeyê 39 salên wê bi idareya orfî û rewşa awarte derbas bûye. Ev bi serê xwe dikare di warî îhlalkirina mafên mirovî de fikrekê bide mirovan.

Piştî avakirina Komara Tirkiyeyê , yanî di navbera salên 1925-1939an de ku di vê demê de serîhildanên kurdan destpêkir binpêkirina mafên mirovî herî hovane bû. Di nvabera salên 1925-27an de 630 serkêşên kurdan hatin îdamkirin.

Ji sala 1960î û vir de di warê demokratîk de îzafî be jî gav hatin avêtin Lê ev heta 1971ê ajot, wê demê jî dîsa bi darbeyeke leşkerî ev proses hat qutkirin. Rêxistinên Dev-Genç û DDKO hatin girtin, endamên wan avêtin girtigehan, sê serokên Dev-Gencê hatin îdamkirin û gelekên wan jî hatin kuştin.

Piştî afûya 1974an tevgera legal ya kurdan fireh bû, rêjim ket panîkê, ji bo pêşîlêgirtina xebata muxalefetê bigre dîsa 12ê îlona 1980î de derbe çêbû. Dojeha 12 îlonê însan qir kirin, beşek mezin yên merivên me mecbûr man derkevin derveyî welêt; di vê demê de înfaz, girtin, cinayetên qesasnediyar gelek zêde bûn.

Di sala 1986an de Komeleya Mafên Mirovî û di 1990î de jî Weqfa Mafên Mirovî hatin damezirandin. Armanca van rêxistinên însanî ew bû ku, hemû binpêkirina mafên mirovî yên rejimê eşkere bikin. Van rêxistinên mafên mirovî di vê doza pîroz de 15 endam û rêvebirên xwe şehîd dan, bi sedan endamên wan hatin girtin û ketin girtîgehan lê dîsa wan xebata xwe domand.

Beşek ji kar û xebata Weqfa Mafên Mirovî ev in: Îro li 5 bajaran (Ankara, Istenbul, Adana, Izmir û Diyarbekirê) merkezên wê yên tedavîyê hene. Heta nuha 5 hezar miroên işkencedîtî di van merkezan de tedawî bûne.

Merkeza tedawiyê ya Diyarbekirê di tîrmeha 1998an de vebû. Di wê salê de 31 kes, di sala 1999an de 73 kes û heta gulana 2000î jî 63 kesên îşkencedîtî di vê merkezê de tedavî bûn.

Weqf raporên salane, rojane û raporên taybetî belav dike. Bûyerên ku di van raporan de tên belavkirin, bûyaerên îspatkirîne.

### Ji 12 îlonê û vir

-Li gor benda 125 a qanûna Tirkiyeyê 37 kesan hukmê îdamê girtine û li benda îdamkirinê ne.

-550 kes di bin îşkencê de hatine kuştin.

-Hejmara kuştiyên qesasnediyar 200 kes in. Bi tenê di 1998an de 42 kes

Ji sala 1980ê heta 97ê 186 kes wenda bûne.

-Di navbera 1991-98an de 1102 kes bêmahkeme hatine kuştin.

-Di nabera salên 1990-98an de 3852 kes îşkence dîtine; ji wan 981 kes jin û 208 kes jî zarok in.

-Di sala 1998an de 28 kes di girtigehan de mirine.

-Di sala 1998an de 90 rojnamevan hatin girtin.

-Îro di Mahkemeya Mafên Mirovî yê Ewrûpayê de li dijî dewleta Tirkiyeyê 2100 dawe hatine vekirin.

-Belavkirina hin rojnameyan li herêmê qedexe ne; ew Ozgur Politika, Ulkede Gundem, Evrensel, Azadiya Welat, Roja Teze, Pîne û Deng in.

-Li herêmê hemû serokên sendikayên hizmetên giştî hatine surgunkirin. Du serokên Komeleya Doktorên Herêmê Seyteffin Kizilkan û M. Emin Ulug hatine surgunkirin.

-Herweha Walitiya Herêmê rê nade civînên HADEP û DBPê û heta nivê sala 1999ê rê nedidan serokên van partiyan herin herêmê.

-Di navbera 1995-00 de gelek piyes û konser hatin qedexekirin.

-Li herêmê kesên ku bêhuviyet geriyane di derheqê wan de 1000 mahkeme hatine vekrin.

-Di gulana 2000î de Komeleya Mafên Mirovî ya Diyarbekirê û Wanê, Komeleya Kommeleya xwendekaran, ya Jinan û Komeleya Kulturî ya Metisê hatin girtin.

-Li DGM(Mahkemeya Ewleyî ya Dewletê) ya Diyarbekir de 11250 dosyayên ku li failên wan digerin hene.

-Di 1999an de li DGM ya Diyarbekirê de 1241 dawayên nû hatin vekirin, kesên ku di van dawayan de tên gu-

nehkarkirin 4752 kes in.

- Li herêmê 3211 gund hatine valakirin.

## Berendamiya Tirkiyeyê bo Yekîtiya Ewrûpayê

Di van şertan de Tirkiye di 99an de bû berendama YE yê. Lê Tirkiye di warê aborî, siyasî û demokrasiyê de ev endametî heq nekiriye.

Ji ber ku Tirkiye ber bi îslambûnê ve neçe, ji bo wê jî Ewrûpayê ew kiriye ber endam. Belkî jî ji bona ku îslamiyet û hêzên îslamî li Tirkiyeyê û Kafkasyayê cî negrin, Ewrûpa xwestiye vê endamteyiyê bide wê.

Bi rastî ji li ber Tirkiyeyê ji du riyan bêtir rê tuneye; ya dê berê xwe bide rojavayê dê bibe endama YE yê, yan ji di nav toz û dûmana dîktatoriyet û îslama radikal a Rojhilata Navîn de ciyê xwe bigere.

Tirkiye ji ber mîrata xwe ya ku ji Osmaniyan maye dê ji bo başkirina rewşa milet gav navêje. Ew guh nade millet û daxwazên wan yên guhartinan li dij dewleta xwe ya pîroz dibîne. Bi tenê bi zixtên ji derve dikare Tirkiyê gav bide avêtin û siyaseta xwe ya hovane biguherîne.

Bêguman di vê prosesa endambûna Tirkiyeyê ya YE de, divê kurd jî hesabê xwe bikin. Divê kurd wek temaşevan li vê pirsê nenêrin, divê ew jî di navê de cî bigrin.

Bi endametiya YE yê dê maf û azadiyên ferdî bên bi dest xistin Lê heke wek grûb mirov bixwaze maf û azadiyan dest bixe, divê daxwaziyekê ji grûbê hebe û tevgerek wê hebe ku meriv mafê xwe bidest bixe.

Kurd miletekî qadîm yê Rojhilata Navîn e. Lê heta nuha di vê herêmê de dewleteke ku em. birêve bibin ava nekirine. Enternasyonalîzebûna pirsa kurdî tekabulê Şerê Cîhanê yê Yekem dike. Lê mixabin piştî vî şerî jî yên ku darbeya herî giran xwarin dîsa ew bûn. Ew dewletên ku di şer de bi ser ketin, kurdan di nav cîranên wan de parve kirin. Bêguman ev ne tenê perçekirina axa wan bû herweha ev perçebûna yekîtî û kamilbûna wan ya neteweyî bû jî. Lê pirsa kurdî hê jî kabûsa welatên Rojhilata Navîn e. Ev dewlet rewşa xwe ya aborî, leşkerî û siyasî li gor rewşa kurdan eyar dikin. Bêguman DYA û dewletên Rojava jî berpirsiyarên vê rewşê ne. Dema îroyin a globaliyê de miletekê weha nemumkune bête wendakirin. Lê adresa çareserkirina pirsa kurdî Rojhilata Navîn e.

Bêguman bê xwîn û rijandina kêmtirîn xwîn di çareserkirina vê pirsê de ji bo me hemûyan baştir e. Tevî ku kurdan pir tişt wenda kirin jî lê dewetên ku wan bindest kirine jî zêde qezenc nekrine.

Li gor hinek beyanên resmî ji avakirina cumhuriyetê heta nuha 28 serîhildanên kurdan çêbûne û hemû jî bi xwînê hatine tefandin; wer xwiya ye serîhildana 29 an jî ber vê aqîbetê re here.

Ez dixwazim piçekî bahsa tevgera 1984an jî bikim. Ez bawer nakim kurdan bi daxwaza dilê xwe rahîştine çek. Kurd di vî warî de hatin mecbûrkirin. Gelek nîşanên vî tiştî hene. Zordarî û zixta rejîma 12ê îlonê kurd dahfdan ber çekhildanê. Civat jî pir bi rehetî ji bo vî tiştî hat manipulekirin. Di vê qonaxê de aqil û mantiq ket taliyê , slogan û dûrişme ketin pêş. Gel jî bi hîssên xwe yên neteweyî piştgiriya tevgerê kir.

Muxalefeta kurdî ku piştî salên 1974ê tirs xistibû dilê dewletê. Ji bona ku dewlet bawerî dianî ku di zemîneke çekdarî de vê pir hêsatir karibe vê muxalefetê ji ortê rake kurda dahfê şer kir û kurd jî bi hêsanî ketin vê dafikê.

Bê guman di vî şerî de him qazanca kurdan çêbû û him jî zarar.

## Li gora rapora Meclisa Tirkiyeyê:

-3179 gund hatin wêrankirin û valakirin, lê eslê wê 4000 gund in.

-Nêzî 3.5 milyon kurd koçber bûn.

-Bi hezaran merivên kurd bûn ajanên dewletê û 60 hezar koruyucî çêbûn,

-2000 reşwenbîr û welatperwer bi cinayetên qesasnediyar hatin kuştin

-20-25 hezar ciwanên kurd şehîd ketin

Ji hemûyan xerabtir jî wendakirina piştgiriya rewşenbîrên Tirkan û pêldayîna ceryanên şovenîst li Tirkiyeyê bûn, leşkerî û milîtarizm bi hêz bûn.

Di nav kurdan de zemîna tolerans, hevdûqebûlkirinê nema û bi taybetî jî rewşa başûrê welêt û şerê bê mahneyî di navbera wan de tesîreke nebaş kir. Ji aliyê din ve jî helwesta dijminkariyê ya hin hêzan li hemberî vî perçeyî xelkê demoralîze kir.

Di jiyana netewayan de rewşên weha xemgîn hene, divê em. bêhêvitiyê vegerinin hêvitiyê. Divê em ispat bikin ku evqas xem û xwîn vala neçûne, ev jî deynê li ser hustiyê hemû hêz û siyasetmedarên kurdan e.

Divê kurd riyên bi aqiltir û nûtir deynin peşiya xwe. Bi diyalog û toleransê problemên navbera xwe çareser bikin. Divê em xwe ji zihniyeta "xwenavend" dûr bixînin. Divê gelê kurd yekîtiya xwe ya siyasî bi cî bîne, ne bi aweayê ku li hember hemû cîhanê derkeve, divê bi awayekî demokratîk bibe beşek ji dinyaya medenî. Êdî rê û metodên salên 1900an derbas nabin. Alîkariya navneteweyî û xebata dîplomatîk di çareserkirina pirsê de xwedî roleke girîng in. Di hilbijartina dost û mutefikan de divê kurd rewşa dinyaya îroyîn baş hesab bikin.

Divê îro kurd li destkeftiyên başûr xwedî derkevin û piştgiriya wan bikin. Ew rewşenbîrên kurd yên ku li Ewrûpayê ne, divê wek lobîstên van destkeftiyan kar bikin.

Gotineke begê kurd Subhan bin Erdal ku berê 500 sal gotiye hin ji bo me aktuel e.

"Hemû dewlet ji tifaqê, bêdewletî jî ji nifaqê dizê"

Bi vê gotinê ez hemû kurdan ba tifaqê û yekîtiyê dikim.

www.arsivakurdi.org

**"Li Turkiyeyê nêzî 15 milyon kurd hene. Ji bo wan qedexeye: ku zimanê xwe bikarbînin û kurdî fêrî zarokên xwe bikin, stranên xwe bêjin û herweha di hemû warê çanda xwe de zimanê xwe bixebitînin."**

(Ji axaftina A. Lindh ya yekê gulanê li ParkenZoo ya Eskilstuna.)

**Wezîra Karê û Barê Derve yê Swêdê Anna Lindh**

# "Berîya ku Tirkiye bibe endama Yekîtiya Ewrûpayê, divê li welatê xwe hemû pîvan û pêwistîyên siyasî bi cîh bîne"



Di 1ê Gulanê de serokê Komeleya Kurdistanê Li Eskilstuna Cemîl Demircan û Serekredaktorê Araratê Azîz Aliş bi Wezîra Karê Derve ya Swêdê Anna Lindh re hevpeyvînekê kirin. Em vê hevpeyvînê, pêşkêşî we xwendevanan dikin.

**Ararat:** Berîya ku em dest bi hevpeyivîna xwe bikin, em bi zanebûn çar gula didine te û her yek ji wan perçeyek ji Kurdistanê temsîl dike.

**Anna Lindh:** Belê...( dikene ) ...hestekî xweş e... gulên pirr xweşik in. Pirr û pirr sipas ji bo van gulan.

**Ararat:** Berîya ku em dest bi pirsên xwe bikin, em dixwazin wek destpêk kurte-behsa hin bûyeran bikin.

**Anna Lindh:** Fermo.

**Ararat:** Di 31.03.1999an de, di Komisyona ji bo Mafên Mirovî ya Yekîtîya Neteweyan (YN) de tu dibêjî; "Zimanê kurda û nasnameya wan a kulturî tê înkarkirin (li Turkiyê) û herweha mafên demokratîk jî ku ji bo me girîng e."

Di 25.10.1999an de tu û Wezîrê Karê Derve yê Turkiyeyê Ismaîl Cem hevûdu dibînin. Wî kîsê xwe bi rojname, kovar, CD û kasetên kurdî dagirtibû ku bide xuyakirin da ew çiqas "demokrat in" û li Turkiyeyê çiqas "demokrasî" heye...

**Anna Lindh:** Belê, û pirtûkên nivîskar UZUN jî ...

**Ararat:** Di 12.12.1999an de dewleta Turkiyê, wek berendamê YE tê qebûlkirin. Di meha sibatê de tu diçî Turkiyeyê. Li wir, tu hin ji nûnerên kurdan dibînî û di her firsendê de tu dibêjî: "Ji bo pirsa kurd, divê Turkiye çareserîyekê bibîne û pêwistîyên demokrasîyê û fikrandina bi azadîyê bi cîh bîne... "

Lê?... Helwesta Turkîyeyê ango tiştên li Turkiyeyê dibe, berevacî wan pîvanên ku ji wan têne xwestinê ye.

Gellek serokê beledîyeyê bajarên Kurdistanê têne girtin, du(2) rojnamevanê swêdî li Wêranşarê ji alîyê polîsê Turkîyeyê tên girtin û tadeyîyê dibînin û ji bo wan tu nerazîbûna xwe tîne zimên, herweha pirtûkên Mehemed Uzun ji firoşgehan têne berhevkirin û firotana wan tên qedexekirin.

Ji bilî van bûyerena, di meha nîsanê de serokwezîrê Turkîyeyê ji parlementerê mêvan yên ji Ewrûpayê re dibêje: "Kurdî ne ziman e, tenê zaravayek e... "

Van hemû mînakana dide dîyarkirin ku zilm û zordarîya dewleta Turkîyeyê her berdewame û tiştên li ser wê têne gotin, rast e.

Li ser vê mijarê, dîtina te ya şexsî çî ye û hûn vêya çawa dinirxînin ?

**Anna Lindh**: Li gor raya min ev bûyerên ku bûn, pirr ciddî ne. Min hem di hevdîtina xwe ya bi I.Cem re ev tişt anî zimên û hem jî bi rêya sefereta Swêdê wek fermî nerazîbûna xwe ji hukumeta Turkîyeyê re da xuyakirin. Lê, ev bûyerên ku piştî çûndina min a Turkîyeyê pêkhatin; wek girtina serokên beledîyeyan, berhevkirina pirtûkên M.Uzun û girtina her du rojnmevanên Aftonbladetê û hin mînakên din, berê Turkîyeyê dide hêleke şaş. Ez texmîn dikim an his dikim ku li Turkîyeyê du alî/hêz hene. Alîyek/hêzek dibêje ev tişt ji bo me, bar e û şermezarî ye; alîyê/hêza din jî, wek dezgehên fermî, polîs û esker ku yên ji bo demokrasîyê û mafên mirovatîyê pêşketinê naxwazin û qebûl nakin.



www.arsivakurdi.org

Û ev tişt ji bo welatên YE yê pirr giríng e ku ew dibêjin, Turkîye bi vê rewşa xwe ya îro nabe bibe endamê YE yê û berîya ku ew bibe endam, divê li welatê xwe hemû pîvan û pêwistîyên siyasî bi cîh bîne. Ango, kêmanî berîya guftûgoyên ji bo endametîya YE yê destpê bike.

**Ararat:** Du sekreterên giştî yên Partî Demokratî Kurdistan -Iranê Dr: A.Qasimlo û Dr:Şerefkendî, ku wek sosyal-demokrat jî dihatin naskirin, li Ewrûpa bi gullebaranê hatin kuştin. Helwesta Internasyonalê û berpirsiyarîya wan ji bo bûyerên weha çi bû ?

**Anna Lindh:** Pirsgirêk ev e...li gel hemû nerazîbûn û protestoyên ku me ji rejîmên berpirs re da dîyarkirin, mixabin me tu çareyek peyde nekir da berpirsên/tawanbarên van bûyerana eşkere bibe.

**Ararat :** Li Başûrê Kurdistanê, li Iraqê, hem hêvî û daxwazîya kurdan û hem jî rewşa îro dide xuyakirin ku îdareya Federatîf bêtir di rojevê de ye. Ew Îdareya Fedratîf, wê piştgirîyeke çawa werbigre? Eger Saddam birûxe û li dewsa wî yekî din were îqtîdarê, ewê çi li serê vê îdareya Federatîf ya kurdan ya îro re were ?

**Anna Lindh:** Ez hêvîdar im ku mirov bikaribe çareserîyekê ji Kurdistana Iraqê ya ku hîn jî beşek ji Iraqê ye, re bibîne. Bi bawerîya min piçek tehlûke ye, gava mirov dest bi munaqeşeyên ji bo welatên nuh bike. Belkî beşek ji Iraqê, lê bi xwebixwe îdarekirineke xurt, ya herî maqûl e; ji ber ku di vê demê dawî di warê avakirinê de gellek pêşketin çê bûn.

**Ararat:** Li rojavaya Başûrê Kurdis-tanê, li Sûrîyeyê; ji 100 000 î zêdetir kurd îro jî, ji hevwelatîyê bêpar in û di warê fermî de bê maf in û bê statun in û herweha ew, bi "biyanî " tên binavkirin. Ji bo vê pirsê çi têne kirin?.

**Anna Lindh:** Berî Cejna Paskalya(påsk), min û wezîrê karê derve yê Sûrîyeyê hevûdu dîtin û min vê pirsê anî rojevê, lê min tu bersiv ji wî wernegirt. Bi bawerîya min, divê mirov vê pirsa giríng bîne rojevê; ji ber ku ne tenê kurd, herweha filîstînî jî di eynî rewşê de ne. Mafê her mirovî ye, ku hevwelatîbûna xwe werbigre û xwedîyê pasaporteke be.

**Ararat:** Di meha yekê ya 2001 ê de cara yekem Swêd serokatîya YE yê werdigre. "Gava mirov pirr be dikare hin tiştan bike, lê mirov tenê be nikare hertiştî bike ; li gor vê pîvanê, hûn nikarin "Grûpa Bakurê Ewrûpa" an jî Grûpa Sosyaldemokratan (di YE de) îqna bikin da Pirsa Kurd, an "mafê milletê bêxwedî" bînin rojevê?.

**"Wek Swêd hem em û hem jî bi hevkarîya welatên Bakurê Ewrûpayê; em ê pirsa kurd û rastîya kurdan bînin rojeva YE yê. Heta nuha ji bo vê pirsê em xebitînin û emê vê xebata xwe bidomînin, lê ez nikarim sozê bidim ku emê çiqas biserkevin."**

**Anna Lindh** : Wek Swêd hem em û hem jî bi hevkarîya welatên Bakurê Ewrûpayê; em ê pirsa kurd û rastîya kurdan bînin rojeva YE yê. Heta nuha ji bo vê pirsê em xebitînin û emê vê xebata xwe bidomînin, lê ez nikarim sozê bidim ku emê çiqas biserkevin.

**Ararat:** Em serkeftinê ji te re dixwazin û ji bo vê hevpeyivînê sipasî te dikin.

**Anna Lindh:** Sipas ji bo we jî.


# Em piştgiriya

projeya

# Daniela Miterand

dikin ku ew dixwaze

# kela Hewlerê

restore bike.

**Federasyon pêşewazî dike ku hemû hevwelatiyên kurd piştgiriya vê projeyê bikin.**
**Ji bo ev proje biserkeve Ferderasyon komıteye ketaybetı avakiriye û postgiroyeke taybetî vekiriye.**

**Numareya postgiroyê ev e:**

**132 49 43 -8**
**Kurdiska riksförbundet**
**Stöd för Hewlers slott**


www.arsivakurdi.org

**Nav:** Alî Çîftçî, **Kengî hatiye Swêdê**: 1980, **Mesleg:** Weşanger,**Temenê wî**: 42, **Li kuderê dijî**: Kista-Stokholm, **Malbat:** Bi yeka finlandî re zewicîye û bavê 3 zarokan e, **Parola wî:** Zarok pêşeroja me ne, divê em li wan xwedî derkevin!

# "Pîza çêkirin hêsan e ya kitêb çapkirin?"

Piştî sala 1975an li Kurdistana Bakur û li Tirkiyeyê tevgera şoreşgerî û welatperwerî pêl bi pêl fireh bû. Partî û rêxistinên kurdan yên îllegal hatin damezirandin, di qada legal de komele hatin vekirin; kovar û rojname hatin çapkirin. Xebata siyasî, demokratîk û kulturî ya kurdan êdî ne tenê li Kurdistanê, herweha li Tirkiyeyê jî xurt dibû; di warê rêxistin, îdeolojî û siyasetê de rêxistinên kurdan ji grûbên çep ên tirkan cûdatir dibûn.

Kurdên ku li metrepolan dijiyan û bi taybetî jî kurdên ku li Anatoliyê bi cî bibûn, ketibûn bin tesîra vî bayê şoreşgeriyê û wan jî di warê demokratîk û kulturî de komele ava kiribûn. Yek ji wan komeleyan, Komeleya Alîkarî û Kulturî ya Cîhanbeyliyan bû ku li bajarê Konyayê hatibû vekirin. Hin xortên kurd wek Nurullah Timûr, Mahmût Ozatli û hin kesên din ku wê demê li Konyayê xwendekar bûn bi xebata xwe tesîreke erênî kiribûn û gelek kurdên Cihanbeyliyê bibûn endamê komeleyê. Komele wek xeta siyasî di paralela DDKDyê de bû. Bi rastî jî vê komeleyê gelek kadro qezencê tevgera rizgariya Kurdistanê kir.

Kurdên Anatoliyê ji ber ku ji welêt dûrketine, bi hesreta welêt dişewitin û ji bo wê jî piraniya wan welatperwer in; ji bo wan ji îdeolojiya rêxistinan wêdetir, xurtbûn girîng e, yanî li Kurdistanê kîjan hêz xurt be, ew bi her hawî piştgiriya wê dikin. Ali Çiftçî yek ji kurdên Cihanbeyliyê ji gundê Kelhesenê bû û malbata wî bi cotkariyê debara xwe dikir. Wî jî di xortaniya xwe de, di nav refên vê komeleyê de ciyê xwe girtibû. 1977an de ji ber xebatên siyasî di lîseyê de cezayê îxtarê girtibû û diviyabû lîseyê xelas bike, ew bi alîkariya vê komeleyê çûbû Sîwerekê û li wê lîseyê temam kiribû. 1979 an de li hemû bajarên Kurdistanê îdara orfî (sıkıyönetim) hebû û li tevayiya Turkiyê bê istikrariyek mezin çêbûbû. Di rewşeke wisa de xwendina li universîteyê, bi taybetî jî ji bo xortên kurd gelek problem derdiketin. Berî her tiştî malbatên kurd nedixwestin zarokên xwe bişeynin bajarên mezin, ji ber ku pirê caran şer di navbeyna grûbên çep û rast de derdiket û hêzên dewletê jî vekirî piştgiriya hêzên rast dikir û xortên kurdan dibûn hedefa polîsan. Ji ber wan sedeman piştî lîseyê Ali mecbûr mabû derkeve derveyî welêt.

Ew di Nîsana 1980î de tê Swêdê. Li ser hatina xwe Alî Çiftçî dibêje: "Wexta ez hatim Swêdê, ew roj cejna Paskalyayê bû, kolanên Stokholmê bêdeng û vala bûn, tenê hin însanên "ser reş" di kuçeyan de digeriyan. Ez li Sergelstoriyê rastê yek ji wan "ser reşan" hatim ku ew jî kurd derket. Min jê DDKDliyan pirsî ka yekî nas dike yan na, wî got; "Ez Keya Îzol nas dikim û ez birim mala Keya. Keya wê demê li Rinkebiyê di xaniyên xwendekaran de dima."

Alî ji alikî ve diçû kursa Swêdî ji aliyê din ve jî bi karê komeleyetiyê ve mijûl dibû. Wê demê komeleya ku



www.arsivakurdi.org

**"Bapîrên Alî di dema Osmaniyan de ji Serhedê koçê Anadoliyê bûne, bavê Alî di nav tirkan de kurdayetiya xwe parastiye. Alî li Swêdê him kurdiya xwe û him jî kurdayetiya xwe pêşve biriye û di vî warî de xizmet dike, lê gelo dê zarokên wî di pêşerojê de li Swêdê yan jî li welatekî din li kurdayetiya xwe xwedî derkevin yan na, dê pêşeroj nîşan bide."**



"Piraniya kurdên Anatoliyê îlan û reklamên aşxane û pizeriyayên xwe li ba Alî çap dikin. Alî ji alîkî îlan û reklamên wan çap dike û ji aliyê din ve jî bi çapkirina kitebên kurdî ve mijûl dibe. "

Alî tê de aktîv kar dikir, matbayeke wan ya piçûk jî hebû ku Alî bi karûbarê çapkirina weşanan jî alaqadar dibû. Êdî wê demê derbeya eskerî ya 12 îlonê li Tirkiyeyê çêbibû, leşker dest danîbûn ser karînê(îktidarê) û li dij rexistinên siyasî û demokratik yên kurdan û endamên wan, teroreke hov dest pêkiribû; rojên dijwar li pêşiya şoreşgeran bû. Gelek endam û dilxwazên rêxistinên kurdan hatin girtin û di i_kenceyan de derbas bûn; yên ku nehatibûn girtin derketin derveyî "sînorên" Tirkiyeyê û gelekên wan çûbûn perçeyên din yên Kurdistanê.

Demoraliszasiyon, bêîmkanî, şertên dijwar tesîreke negatîf li rêxistinan kir; hema bigre hemû rêxistinên kurdan perçe bûn. Rêxistina ku Alî jî pê re hereket dikir nesîbê xwe ji van perçebûnan girt û di sala 1983an de, fiîlî bû du perçe û tesîra wê di demeke kurt de li komeleya Stokholmê ku Alî jî endamekî aktîv yê wê bû, kir. Xirecir û minaqeşeyên rojane yên bêmahne tesîrek ne baş li endamên vê komeleyê û bi taybetî jî li kurdên Anatoliyê ku wê demê endamên komeleyê bûn kir ku ew hemû dev ji karûbarê komeleyetiyê berdin û dûr bikevin. Ali heta sala 1987an di nav hêzek vê rêxistinê de xebatên xwe yên siyasî bi aktiv didomîne. Piştî 1987an digel ku hurmeta wî ji bo hemûyan heye jî lê biryara xwe dide di nav tu rêxistinekê de kar neke.

Alî Çiftçî piştî ku fêrî swêdî dibe, dest bi dibistana bilind ya mamostatiyê dike. Wê demê(1982) rastê keçikeka fînlandî tê û hevaltiya wan pêşve diçe û di sala 1987an de bi hevre dizewicin. Ji zewaca wan sê zarok çêdibin; Evîn(13), Temo(9) û Ronî(7).

Li ser pirsa min a ku yekî biyanî li welatekî biyanî û bi keçikeka biyanî re bizewice gelo li malê bi kîjan zimanî bi hev re dipeyivîn û zimanê zarokên wan kîjan e? Alî dibêje: "Li mala me sê ziman tên qisekirin. Ez û diya zarokan, Peppiina bi siwêdî bi hev re qise dikin. Ez bi zarokan re bi kurdî û Peppiina jî bi fînî qise dike. Zarok bi hev re pirê caran bi siwêdî û carna jî bi fînî qise dikin. Kurdiya zarokan pir qels e, ji ber ku derûdora wan piranî swêdî û fînî ne. Keçika min kurdî dizane, ji ber ku dema ew hîn biçûk bû wexta min zêde hebû, lê ji bo herdû kurên min wexta min pir nebû. Di dema wan ya heri aktiv de ez li kar bûm, lê kurdiya rojane fêm dikin. Ez bi wan re bi kurdî dibêm ew bi swêdî bersiv didin.

Carna hin heval ji kurê min ê mezin; Temo dipirsin: "Tu çi yî? Yanê ji kîjan mîletî yî? Ew dibêje; "diya min fînlandî ye, bavê min kurd e û ez jî swêdî me".

Alî heyfa xwe li xwe tîne û bi awayekî ku "gunehkar" be gotinên xwe weha didomîne:"Ez serê sibê heta êvarê li kar im, dawiya heftê jî pirê caran beşdarî civînan dibîm û bivê nevê diya zarokan li zarokan mêze dike û wan mezin dike, helbet zarok ê zimanê diya xwe ji yê min baştir bizanin. Ev aliyek, ji aliyê din de jî îmkanên wan herdû zimanan ji ya kurdî pir pir zêdetir in."

Tecrubeyên Alî yên ji komeletiyê ji bo wî pûaneke baş e ku ew dixwaze ji xwe re matbaayekê bikire û bi karê weşangeriyê mijûl bibe. Ew di sala 1988an de bi wasiteya îlaneke rojnameyê matbayeke piçûk dikire û li Stokholmê li Spångavägen No: 345an ciyekî kirê dike û bi navê Apacê weşanxaneyekê vedike. Ew birayê xwe yê mezin Mecît jî digre cem xwe, ew jî di demeke kin de fêrî çapxaneyê dibe û bi vî hawî karê xwe dimeşîne.

www.arsivakurdi.org



Alî ji bo nirxandin û redaktekirina kitêban jî ji 5 zimanzan û nivîskarên kurd (3 kes kurmanc û 2 soran) komîteyek ava kiriye.

Ji milê çepê; Amed Tigrîs, Hesenê Metê, Ali Çitfçî, Mahmûd Lewndî, Xebat Arif û Seyfî Dogan(yek ji endamê redaksiyona Bînebûnê)

Di van 12 salan de 170 kitêbên curbecur çapkiriye û %90ê kitêbên çapkirî bi kurdî ne.Babetên kitaban hemû li ser kurd û Kurdistanê ne.

Îro li Swêdê zêdetirî 3 hezar Kurdên Anatoliyê dijîn û di navbera wan de danûstendineke xurt heye. Piraniya wan ya merivên hev yan jî hemşeriyên hev in; hema çi bigre hemû kes hev nasdikin û di her warî de piştgiriya hev dikin. Gelek ji wan xwediyê aşxane û pizeriyan in. Piraniya wan îlan û reklamên aşxane û pizeriyayên xwe li ba Alî çap dikin. Alî ji alîkî îlan û reklamên wan çap dike û ji aliyê din ve jî bi çapkirina kitebên kurdî ve mijûl dibe. Hema hema kovarên kurdî yên ku li Swêdê derdikevin hemû li matbaaya Alî tên çapkirin.

Ji sala 1997an û vir de Alî û çend rewşenbîrên ji kurdên Anatoliya Navin bi hevre bi navê "Bîrnebûn" kovareke 3 mehî jî derdixin. Kovar li ser jiyana civakî, kulturî, tarîxî û zimanî yê kurdên Anadoliyê radiweste û di vî warî de lêkolînan çap dike. Redaksiyona kovarê hemû ji kurdên Anadoliyê pêk tên, kovar li ser navê Apecê çap dibe û tê belavkirin.

Alî ev 12 sal in bi karê weşangeriyê mijûl dibe. Di van 12 salan de 170 kitêbên curbecur çapkiriye û %90ê kitêbên çapkirî bi kurdî ne (Bi hemû zaravayên kurdî). Babetên kitaban hemû li ser kurd û Kurdistanê ne. Bêguman 170 kitêb hejmareke ne hindik e û li Swêdê weşanxaneya wî herî pirr kitêbên kurdî çapkiriye. Ku her kitêbek tîraja wê 1000 heb be, dike 170.000 kitêb. Beşek ji kitêbên wî kitêbên zarokan in û piraniya wan ji swêdî hatine wergerandin.

Sveriges Författarfond di dawiya sala çuyîn de ji bo ku edebiyata swêdî daye wegerandin û belavkirin xelatek jî dabûnê.

Alî ji bo nirxandin û redaktekirina kitêban jî ji 5 zimanzan û nivîskarên kurd (3 kes kurmanc û 2 soran) komîteyek ava kiriye. Hergav li weşanxaneya wî kurd wek karkir xebitîne û nuha jî xeynî birayê wî du karkirên wî yên kurd hene. Alî gazinan dike û dibêje ku; "Xwendevanên kurd kêm in, kitêb nayên firotin û di embaran de êdî cî nemaye." Alî bi karûbarê xwe him debara xwe dike û him jî xizmeta ziman, dîrok û kultura kurdî dike. Ji xwe meriv nizane ku Alî kurdekî Anatoliyê ye; ji ber ku axaftina wî, têkiliyên wî, interesa wî û derûdora wî ji kurdên Anatoliyê cûdatir e. Ew bi xwe jî di vî warê de weha dibêje: "Ji ber ku min devoka xwe ji bîr kiriye, êdî hemşeriyên min jî, zehmetiyê dikşnin ku ji min fêhm bikin".

Bapîrên Alî di dema Osmaniyan de ji Serhedê koçê Anadoliyê bûne, bavê Alî di nav tirkan de kurdayetiya xwe parastiye. Alî li Swêdê him kurdiya xwe û him jî kurdayetiya xwe pêşve biriye û di vî warî de xizmet dike, lê gelo dê zarokên wî di pêşerojê de li Swêdê yan jî li welatekî din li kurdayetiya xwe xwedî derkevin yan na, dê pêşeroj nîşan bide.

**Faris Marsil**
berbang@kurdiskarf.orf




Ji sala 1997an û vir de Alî û çend rewşenbîrên ji kurdên Anatoliya Navin bi hevre bi navê "Bîrnebûn" kovareke 3 mehî jî derdixin. Kovar li ser jiyana civakî, kulturî, tarîxî û zimanî yê kurdên Anadoliyê radiweste û di vî warî de lêkolînan çap dike. Redaksiyona kovarê hemû ji kurdên Anadoliyê pêk tên, kovar li ser navê Apecê çap dibe û tê belavkirin.

**Hûn dikarin kitêbên Weşanxaneya Apecê ji vê navnîşanê bi dest bixin**

Apec-Förlag
Box 3318,
163 03 Spånga/Sweden

e-mail:
apec@swipnet.se

www.arsivakurdi.org

# civîn û çalakiyên Yekîtîya Jinên Kurdistanê



Konferensa jinan li gor biryara kongreya 8em a Yekitiya Jinen Kurdistanê li Swêdê di roja 04.08.2000î de konferansek li ser rewşa jinen kurd li Swêdê û li ser rewşa YJKê hat lidarxistin. Armanca konferensemunaqeşeya li ser kêmbêşdariya jinan bo karên rêxistinî û çalakiyan bû. (Bîstek ji konferansê).

## Konferensa jinan

Li gor biryara kongreya 8em a Yekitiya Jinen Kurdistanê li Swêdê di roja 04.08.2000î de konferansek li ser rewşa jinen kurd li Swêdê û li ser rewşa YJKê hat lidarxistin. Armanca konferense munaqeşeya li ser kêmbêşdariya jinan bo karên rêxistinî û çalakiyan bû.

30 jin beşdarê civînê bûn. Sermin Bozarslan (Yekitîya Jinên Kurdistanê li Swêde), Sidika Mehemmedî(Komeleya Rizgariya Jinên Iranê) Halala (Komita Pisgrîya Jinên Irakê) û Seyran Duran jî wek seroka YJK li ser rewşa rêxistinên xwe agahdari dan nûnerên. Kesên beşdarî civînç bûn di vî warî de dîtinên xwe pêşkêş kirin û sedemên astengên xwe anîn zimên. .Bîryar hat girtin ku ji her rexistinan du jin bên destnûşankirin û ji wan komîteyeke bê avakirin. Ew komîte bi hewrê kar bikin li berenberê bûyarên gistî de jinên kurd li swêdê temsîl bikin. Her weha di radyoya jinan de bikaribin bi hewre programan çêbikin.

## Kongreya YJKê :

Kongreya Yekitîya Jinên Kurdistanê ya 9em di 09.04.2000î de, li lokala FKKS çêbû. Kongre bi besdariya 24 nûnêran vebû. Lê di hilbijartina organan de gelek zehmetî derket. Ji bo wê jî dîwan pêwîst dît ku kongre di roja 7.05.2000î de bê bêrdewam kirin. Di we rojê de organên YJK ê hat hilbijartin.

**Komita Karger :**

Serok: Seyran Duran
Sekreter : Hevi Sabrî
Berpirsa Aborî : Evîn Çelen
Berprisa seksiyonan : Sevîn Izoli
Berpirsa karê Kulturî:
Sukran Baksi û Sevgi Yildiz
Berpirsa Qursan : Nimet Çelepli

## Şeva YJKê :

Yekitîya Jinên Kurdistanê wek tradistionel her sal ji bo endamanen xwe şahî amada dikir. Li gor biryara Komita Karger di pistî konfaransê de sahiyêk hat amadekirin. 120 jin besdarê şahiyê bûn.

## Programa xebatê ye salanê :

1- Ji bo damezirandina seksiyonan dê seredana komeleyên FKKS. Ê bikin.

2- Di nav Kvinno SIOS de bi aktif kar bikin. Di komita K.SIOS ê de Seyran Duran asil endam û Hevi Sabri cigir hatin dest nisandan.

3- Ji bo jinên bêkar bi Skärholmens Stadsdelförvaltningen re projêk bê çêkirin.

4- Piroz kirina 10 saliya YJK ê bê kirin

5- Li ser nama Birêz N. Barzanî projêk amade bikin û 8ê Adar. 2001 ê li Kurdistana Basûr bête piroz kirin.

6- Proja bi Intverket re berdevam bikin.

7- Qurs bi ABF re li ser Kurmanci, sorani û data bên organîzekirin

8- Li ser henêk babetan seminer bên dayîn

www.arsivakurd.org

# Komeleyea Kurdistanê li Eskilstunayê

**Azîz Aliş**

Komeleya Kurdistanê li Eskilstunayê (KKE') di sala 1986an de hatiye damezrandin. Ji roja damezrandinê heta iro endamê Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swedê (FKKS )ye.

Ji sala 1988 an û vir de jî, yek ji komeleyên ç,alak yên endamê Federasyonê ye.

KKE li bajarê Eskilstuna, di nava komeleyên biyanî de jî herî komeleya çalak e.

KKE, her dem xwestiye bibe dengê kurdên li Eskilstunayê di warê demokratik de ji bo pirsa kurd, di xebata pêşdebirin û nasandina kultura kurdî û zimanê kurdî de xebatên ber bi c,av kiriye.

KKE ji bo rojên dîrokî, xwenîşandan, semîner û panelan; ji bo rojên netewî ,şevahengan û ji bo pirsên civakî, ziman û kulturî ji bi rêya projeyan semîner û kursan amade kiriye.

Ev karên ku komeleyê kiriye, ewqas ne bi hêsani pek hatiye. Komele, hin caran li hin astengiyan ji rast hatiye. Astengiyen herî mezin, hin kesa bi zanebûn an bêzanebûn xebata demokratîk û xebata siyasî tevlihev dikirin. Ev tişt jî tesîrên neyîni li xebatên komeleyê dikir û wê gavê astengiyên aboriyê jî dihate rojavê.

Ji sala çûyi û vir de, mehê carekê li lokala komeleyê ,şevên bi malbatan re pek tên. Her kes xwarin û şêraniyên xwe bi xwe re tinin û bi hev re ,şevbuhurkiya xwe dikin. Bi rastî heta nuha gellek malbat bi zarok û ciwanên xwe bêşdariya van şevan dikin. Komele jî çay, qahwe û meywe îkramê wan dike. Armanca şêven weha, tekiliyên di navbera malbatên kurd de xurtir dike.

Di sala 1999 an û vir de, KKF, bi navê " Manliga Nätverk" projeyekê pek anî. Bi vê projeyê bi bêşdariya gellek malbatan re tekili hate danin û bi taybetî ji bo pirsên civakî gellek semîner û hevdîtinên malbatan pek hat.

KKE, di nav projeya " Nakokiya di navbera nesilan de " ya ku ji aliye FKKS e hatiye amadekirinê de cihe xwe girtye û ji bo vê pirsa giring jî xebata xwe didomîne.

KKE, endamê ABF li Eskilstunayê ye û gellek caran bi hev re çalakiyên hevbeş kirine. Herhewa bi hevkariya herdu dezgehan, ji bo endamên komeleyê kursên dirûnê, folklor, şano, Ingilîzî û Kurmancî hatin amadekirin.

KKE bi Datortekê re gellek çalakiyan bi hev re pêk aniye. Datortek hem par hem jî îsal li lokalên Datortekê ji bo edamên komeleyê kursên datayê da û her ev kurs berdewam in.

Têkiliyên KKE bi masmediya Eskilstunayê re baş hatiye meşandin. Bi taybetî Rojnameya Kurien û rojnameya Folket gelek caran di rûpelên xwe de cî daye çalakiyên komeleyê.

KKE di di nav endamên xwe de du(2) komîteyên xwendegehan pêk anîye. Armancê van komleyan ev in:



Dê û bav bikaribin bêtir serdana dibistanên ku zarokên wan le dixwînin da ku bizanibin pirsên zarokên wan li dibistanan çi ne? Heke ji bo çareserkirina hin pirsan pêwistiya seroktiya mekteban ji komleyê hebe, da bi hêsanî bikaribin têkilî bi KKE re deynîn. Hemû dibistanên ku têkilî bi wan re ahatine danîn, ji bo vê çalakiya komleyê pirr kêfxweş man.

KKE bi navê ARARAT kovareke derdixe.






www.arsivakurdi.org

civîn û çalakiyên Federasyonê

## Civîna bi partiya sosyaldemokat re

Di 10.05.00 an de Serokê Federasyonê K. Izol tevî serokên Federasyonên Yugoslavyayê, Îranê, Tirkiyeyê, Finlandî û Italyayê ve bi Sekreterê Sosyaldemokratan Lars Sjarnqvist re civineke çêkirin. Civîn li ser alîkariya maddî ji bo federasyonên biyaniyan bû.

Federasyona Yugoslavyayê cejna 3 saliya damezirandina xwe çêkir. Li ser navê Federasyonê Kovan Amedî û Selam Cizîrî beşdarî cejna wan bûn.

## Festîvala kurdî li Fransayê

-Di 13.05.00an de festivaleke kurdî li Fransayê li bajarê Cheboürgê pêk hat. Û 8 rojan ajot. Di van 8 rojan de çalakiyên curbe cur hatin li dar xistin. Li her derê bajêr alaya kurdî hat xemilandin. Li ser navê Federasyonê Keya Izol beşdarî festivalê bû. Danilela Mitterand û serokê belediyeya bajarê Chebourgê festivalê vekirin.

## Bi munasebeta 20 saliya Federasyonê

## Îlaneke girîng ji bo hemû Kurdên li Swêdê!

Federasyona me di nabêna 23 û 27ê Gulana sala 2001ê de bi gelek aktîvîteyên cûr be cûr ewê 20 saliya xwe pîroz bike. Li gel hin debat, semîner, raxistin, fîlm û pêkanîna aktîvîteyên bi vî rengî, wek Federasyon em dixwazin di warê xebatên akademîk de jî hin xelatan belav bikin.

Ew kesên ku di vî warî de xwedî berhem bin, yanî heger li ser ziman, edebiyat, tarîx, risim û muzîka Kurdî yan jî di hin warên civakî û sosyal de tez(avhandlîng) dabin unîversîteyê û xwedî xebateke ilmî bin dikanin bi berhem û kurtenivîseke li ser jiyana xwe muracaetî me bikin.

Piştî lêhûrbûn û nirxkirineke pêwîst xwediyên berheman ji alî Federasyona me ve ewê werin xelatkirin. Muracaetên xwediyên berheman heta dawiya sala 2000î divê gihîştibin destên me.

Ji nuha de em di kar û barên we de ji we re serkevtinê dixwazin û bi bêsebriyeke mezin li bende berhemên we ne.

**Komîteya pîrozkirina bîst saliya Federasyonê**

## Gera bo Uppsalayê

46 şagirdên li belediya Botkyrkayê yên ku li xwendingehan zimanê kurdî dixwînin, di 31.05.2000 î de tevî 6 mamostayên xwe yên zimanê kurdî ji Stockholmê çûn Uppsalayê.

Li Uppsalayê şagirdên kurd yên sinifa 9 ê û yên lîseyê çûn seredana xwendekarên kurd yên ku ji Kurdistana bakur hatine û li uniwersiteya Uppsalayê li ser ziman, dîrok û edebiyata kurdî dixwînin. Ji ber tengbûna cih hemû şagird û xwendekar hatin bo Komela Kurdî-Swêdî ya Uppsalayê. Serok û xebatkarên komelê qedrekî mezin dan şagirdan.

Li vir mamostayê kursa kurdî ya uniwersiteya Uppsalayê Mehmet Tayfun - Malmîsanij- li ser vê kursa kurdî, hatina xwendekaran û dersên ku dixwînin înformasyon dan. Paşê mamostayekî şagirdên kurd li ser xwendina zimanê zikmakî li Swêdê bi kurtî peyivî. Piştî beşê pirs û bersivan, şagird û xwendekar qasî saetekê bi hev re peyivîn.

Piştî nîvro şagirdên kurd yên Botkyrkayê çûn seredana Beşê Kurdî ya uniwersiteya Uppsalayê. Mamosta Ferhad Şakelî, berpirsê vî beşî pêşwaziya şagirdan kir û li ser beşê kurdî û uniwersiteya Uppsalayê bi dirêjî peyivî. Şagirdan li ser tiştên ku mereq dikirin, pirsên xwe pirsîn û piştî girtina broşur û şertên xwendina beşê kurdî vegeriyan Komela Kurdî-Swêdî ya Uppsalayê û ji wir jî vegeriyan Stockholmê.

Hêjayî gotinê ye ku Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê xwe da ber hemû mesrefa vê gerê. Li ser navê şagirdên kurd yên belediya Botkyrkayê û mamostayên zimanê kurdî ez pir sipasiya Federasyonê û komeleya Uppsalayê dikim. Em hêvîdar in ku hûn dê li ser xizmeta xwe ya bo şagirdên kurd yên li Swêdê berdewam bin.

Li ser navê şagird û mamostayan
Remzî Kerîm

**Kongreya 19em a Federasyonê di 7-8/10-2000î de li Stockholm ABFê çêdibe**

www.arsivakurd.org

## rojbûn



Hozan Olçer

Di 19.06.2000î de bû bû 20 salî. Em 20 saliya te pîroz dikin Bi hêviya gelek sersalên din, em daxwaza jiyaneke şad dikin.

Dê û bavê te û birayên te û xwişka te.
Şukran Baksî, Ronî, Dîlan Delal, Muzzeyen Esmeroglu, Berfîn, Hêlîn û Ferhad

## rojbûn



Aras Cilgin

Di 04.07.2000î de dibe 13 salî. Em 13 saliya te pîroz dikin. Bi hêviya gelek sersalên din, em daxwaza jiyaneke şad dikin.

Bav û diya te,
birayê te Ronas
û hevalên te

## rojbûn



Evin Çiftçi

Di 20.07.2000î de dibe 13 salî. Em 13 saliya te pîroz dikin. Bi hêviya gelek sersalên din, em daxwaza jiyaneke şad dikin.

Diya te Pepiina
Bavê te Alî
Birayên te Temo û Ronî
Apê te Mecîd û malbata wî

## rojbûn



Şîlan Olçer

Di 1.06.2000î de bû 14 salî. Em 14 saliya te pîroz dikin. Bi hêviya gelek sersalên din, em daxwaza jiyaneke şad dikin.

Dê, bavê te û birayên te.
Şukran Baksî, Ronî, Dîlan Delal, Muzzeyen Esmeroglu, Berfîn, Hêlîn û Ferhad

## rojbûn



Kendal Bakac

Di 07.06.2000î de bû sê salî.
Em sê saliya te pîroz dikin û te himbêz dikin.

Dê û bavê te,
xwişka te Bişra,
emiyê te Yilmaz û dotmamên te Roza, Evîn û Pelîn

## rojbûn



Ronî Çiftçî

Di 07.06.2000î de bû 7 salî. Em 7 saliya te pîroz dikin. Bi hêviya gelek sersalên din, em daxwaza jiyaneke şad dikin.

Diya te Pepiina
Bavê te Alî
Birayê te Temo, xwişka te Evîn, apê te Mecîd û malbata wî

www.arsivakurdi.org

# Berbang

Kurdiska Riksförbundets Tidskrift • Juni• No: 116 • Pris 25 SEK





**På initiativ av Kurdiska riksförbundet i Sverige har vi, en rad kurdiska demokratiska organisationer och institutioner i Sverige, Norge, Tyskland, Frankrike och Belgien, samlats 2-4 juni 2000 i Stockholm för att bl a diskutera kurdernas rättigheter med anledning av Turkiets kandidatur för medlemskap i EU.**

www.arsivakurdi.org

Berbang

**No: 116**

Juni 2000

Kurdiska Riksförbundet i Sverige

*Ansvarig utgivare*
**Keya Izol**
keya.izol@kurdiskarf.org

*Layout*
**Marsil**

*Prenumeration*
myndigheter 300 SEK
annons:
en hel sida 5000 SEK

*Adress*
Berbang
Box 49090
S-100 28 Stockholm
SWEDEN

tfn 08-652 85 85 vxl
faks 08-650 21 20

berbang@kurdiskarf.org
www.kurdiskarf.org
www.kurdchat.com

Postgiro: 64 38 80-8

ISSN 0281-5699

Utges av Kurdiska Riksförbundet i Sverige

APEC-Tryck

# Vad är Kurdiska Riksförbundet?

Kurdiska Riksförbundet (KR) bildades 1981 och har varit verksam sedan dess som kurdernas representant i Sverige. KR är partipolitisk och religiös obunden organisation. Vi har för närvanande 36 medlemsföreningar med upp till 8500 medlemmar runt i hela Svenge. Alla enskilda kurder som är bosatta i den kommun kan söka medlemskap i denna förening.

KR har sitt årsmöte varje år. Styrelsen som väljs i årsmötet består av 12 ordinarie och 3 suppleanter och har sammanträde 6 gånger per ar. Verkställande Utskott (VU) består av 7 ordinarie och 3 suppleanten Ordförandena i Kvinno och ungdomsförbund ingår som automatiska ledamöter i VU. VU har sitt sammanträde varannan vecka.

KR är enda organisation som har lyckats att samla kurder oavsett vilken del av Kurdistan man kommer ifrån eller vilken politisk bakgrund man har. Därför är den en unik kurdisk organisation som saknar motstycke i hela världen.

Vi syslar med integrationsfrågor, hjälp till nyanlända flyktingar samhällsfrågor som uppstår i samband med kulturkrock och relationsfrågor. Kvinno, barn och ungdomsfrågor har vi som prioriterade frågor inom vår verksamhet. Kultur är en annan viktig verksamhet som vi prioterar. Nämligen att bevara den kurdiska kultur och tradition och identiteten.

Vi har även verksamhet som inriktar sig till händelser som sker i Kurdistan. Vi bevakar orättvisor och kränkningen av mänskliga rättigheter. Vi har lobby verksamhet för att uppmärksamma den kurdiska frågan samt agera mot occupationsländerna Turkiet, Irak, Iran och Syrien.

Oftast fungerar vi som en kurdisk ambassad för att klara alla dessa frågor efetersom vi saknar stat och ambassad här i Sverige. KR agerar som språkrör för kurder här i Sverige och samtidigt försöker avslöja och bekämpa de orättvisor som sker i vårt hemland, här i Sverige.

KR har egen tidskrift som heter BERBANG och som publiceras 6 gånger per år. Den är på nord och syd kurdiska samt på svenska.

**Besöks adress:** S :t Eriksg. 33, Portkod: 1822
Postadress: BOX 49090 100 28 Sthlm
**Tel:** 08-6528585 • Fax: 08-6502120 Berbang@kurdiskarf.org

www.arsivakurdi.org

projekt

Ett integrationsprojekt av Kurdiska riksförbundet

# GENERATIONSKONFLIKT

med stöd av Integrationsverket, Folkhälsoinstitutet och Ungdomsstyrelsen

**Samrådsgrupp:**
Keya Izol, projektledare (Kurdiska riksf.) Seyran Duran (K.Kvinnoförbund) Gulan Avci (K.Ungdomsförbund) Adele Ennab (Integrationsverket) Mariana Buzaglo (Folkhälsoinstitutet) Marie Eriksson (Ungdomsstyrelsen) Isak Reichel (Folkhälsoinstitutet)

◆ Kurdiska riksförbundet har startat ett integrationsprojekt som heter "Generationskonflikt" bland kurder i Sverige. Projektet stöds ekonomisk av Integrationsverket och Folkhälsoinstitutet. Ungdomsstyrelsen kommer eventuellt först nästa år att stödja projektet ekonomiskt.

◆ Syftet är att starta en diskussion om jämställdhetsfrågor bland kurder och en dialog mellan den yngre generationer deras föräldrar om denna fråga. Genom utbildning, diskussioner och information vill vi komma tillrätta med de konflikter som uppstår mellan föräldrar och tonårsbarn, framför allt döttrar.

◆ Förbundet skall även kartlägga förekomsten av generationskonflikter och i vilken utsträckning de kan leda till våld och trakasserier. Om behov finns kommer vi att upprätta en jourverksamhet för unga kurdiska tjejer. Projektet beräknas pågå i tre år.

◆ Första året är det meningen att vi skall utbilda ungefär 30 personer som består av en representant från kvinnosektionen, en från ungdomssektionen samt en från den lokala föreningen i 8 städer som ingår i pilotområdet. Följande städer planeras att ingå i projektet; Stockholm, Eskilstuna, Uppsala, Göteborg, Västerås, Gävle, Sandviken, Bollnäs.

◆ Vi kommer att vid två tillfällen anordna utbildning för dessa 30 personer för att underlätta hanteringen av sådana frågor. En hemsida som tar upp dessa frågor kommer att upprättas.

◆Alla som är intresserade av att jobba för detta projekt kan kontakta respektive förenings styrelse eller oss som arbetar med projektet på riksförbundet.

Kurdiska riksförbundet PROJEKT Box 49090 100 28 Stockholm Tel: 08-652 85 85 Fax 08-650 21 20 e-mail: keya.izol@kurdiskarf.org

www.arsivakurdi.org

# Fängelse för Göteborgsbranden

Av Mikael Lindström

GÖTEBORG. Samtliga fyra åtalade för katastrofbranden i Göteborg hösten 1998 då 63 unga människor omkom, dömdes i dag mot sitt nekande till hårda fängelsestraff för grov mordbrand.

Tre dömdes till fängelsestraff mellan sex och åtta år, medan den yngste, den i dag 19-årige Behnam, dömdes till sluten ungdomsvård i tre år.

19-årige Foad fick det strängaste straffet - åtta års fängelse - eftersom tingsrätten anser att han tände elden och var den mest pådrivande i gruppen. De två andra åtalade, 19-årige Jamshid och 21-årige Behrouz, fick lagens mildaste straff för grov mordbrand; sex års fängelse.

Tingsrätten anser att de fyra handlande med uppsåt. De anlade branden för att förstöra festen. De måste då också ha insett att det fanns risk att elden skulle kunna sprida sig och betyda fara för andra människors liv.

Under alla omständigheter var de likgiltiga för faran, fortsätter rätten och pekar på att ingen gjorde något för att förhindra att åtminstone Foad tände på, eller agerade för att släcka branden.

Foad, som erkänner att han tände på, förnekar brott och menar att han inte haft för avsikt att skada någon. Han erkänner bara att han handlat oaktsamt.

Han förnekar också att antändningen var planerad och att han efter att ha blivit nekad inträde skulle ha sagt att han skulle stoppa festen genom att utlösa brandlarmet.

De andra tre döms också mot sitt nekande. De hävdar att de varken agerade själva eller uppmuntrade någon annan att tända på. Inga hade för avsikt att skada någon.

Men rätten lade ingen vikt vid detta. Baserat på den tekniska bevisningen, de åtalades och vittnenas berättelser, finner tingsrätten att det är ställt utom rimligt tvivel att Foad, Jamshid, Behrouz och Behnam "gemensamt och i samförstånd" anlade branden.

Men vad som i detalj hände i nödtrapphuset är fortfarande inte klarlagt. Enligt tingsrätten gick det till så här:

Efter att ha nekats inträde till diskotekslokalen, sade Foad till Jamshid och Behrouz att han skulle stoppa festen genom att sätta igång brandlarmet. Behnam gick runt och öppnade den blå porten och släppte in de andra tre i kulverten. Jamshid och Behrouz var då medvetna om vad som var på gång, men gjorde ingenting för att stoppa det.

Alla fyra var i trapphuset när branden anlades. Det förnekar dock Jamshid. Tingsrätten har då valt att i stället tro på Foad, Behnam - och viss mån Behrouz - som uppgett att samtliga fyra var där.

Elden anlades under en samling stolar. Enligt expertvittnet, professor Ulf Wickström vid Statens provnings- och forskningsinstitut (SP), är det omöjligt att det endast handlade om en stol, som Foad påstår.

Elden tändes med hjälp av papper som rivits sönder och formats till en boll. Uppgifterna går i sär när det gäller vem eller vilka som gjorde det, men alla utom Jamshid säger att det var så det gick till. Tingsrätten kan inte klarlägga om Behnam var med om detta.

Alla utom Behnam, som släppte in de tre andra genom den blå porten, var när de gick in i kulverten överens om att anlägga en brand för att stoppa festen.

En säck med antingen frigolit eller rispuffar i kastades på de staplade stolarna. Foad säger dock att han inte tror att någon säck användes. Här väljer tingsrätten att tro på Behnams uppgifter.

Åtminstone Foad tände på med hjälp av papper. Återigen väljer tingsrätten att sätta tilltro till Behnams uppgifter. Foad själv säger att han och ytterligare en av de andra tre tände eld, men han vill inte säga vem. Behrouz vet inte om det var en eller två som gjorde det.

Tingsrätten har inte funnit något som stöder uppgifterna att den vätska som Foad enligt Behrouz skvätte på elden var brännbar. Men samtliga närvarande måste ha trott att den var det.

Straffet för grov mordbrand är fängelse i lägst sex och högst tio år, eller livstid. Men ingen får dömas till livstids fängelse för brott man begått före 21 års ålder.

Det var de åtalades unga ålder som gjorde att tingsrätten inte utdömde högre straff.

Foad får det strängaste straffet, åtta års fängelse, eftersom han ansetts ledande och det var han som tände elden. Jamshid och Behrouz, som också var delaktiga men inte i lika hög grad som Foad, får därför den mildare domen sex års fängelse - den lägsta möjliga i straffskalan.

Det fanns stöd i lagen för att även ha dömt den yngste och tidigare ostraffade Behnam, som var 17 år 1998, till fängelse. Men rätten valde att ta stöd av en bestämmelse i brottsbalken som ger rätt att döma till sluten ungdomsvård. Eftersom man anser att hans medverkan vid brottet var mindre än de andras sattes tiden till tre år.

*Denna artikel har publicerats i DN 000609*

*Namnen är fingerade*

www.arsivakurdi.org

KURDISKA RIKSFÖRBUNDET FEDERASYONA KOMELEN KURDISTANÊ LI SWÊDÊ

Keya Izol (Ordf. Kurdiska riksförbundet), Göran Erkisson (ABF)Mariane Andersson (ordförande Svenska Stöd Kommitten Cinnika Bejming, Riksdags ledamot



# Förbundsordförande, Keya Izols tal

Välkomna till dagens konferens som kommer att handla om Turkiets kandidatstatus till EU och den kurdiska frågan.

När EU toppmötet beslöt att anta Turkiet som kandidatland gav man också en vägvisning till Turkiet på väg till fullt medlemskap. Närmaste fyra åren kommer att ha en avgörande betydelse för Turkiets väg till EU. Turkiet står idag inför mycket viktiga förändringar som förhoppningsvis kommer att ske. Dessa förändringar kommer inte bara handla om små justeringar som ofta gjorts för att ge omvärlden en sken bild av situationen i Turkiet. Utan tvärtom grundläggande juridiska och konstitutionella förändringar både i grund och strafflagen. Med dessa nödvändiga förändringar kommer förmodligen kurder att få sina kulturella och språkliga rättigheter. Det är EU s förväntning från Turkiet.

Tredjedel av Turkiets befolkning består av kurder ungefär 20 miljoner. När Turkiets medlemskap nämns i olika internationella sammanhang glömmer man bort denna sanning. Inte nog med det, kurdernas egentliga situation får inte en chans att komma fram. Därför att kurder saknar representation i dessa frågor. EU förhandlar om kurdernas rättigheter med Turkiet men utan att fråga den kurdiska befolkningen. Då är det upp till Turkiets samvete hur mycket man kan sträcka sig och vilken omfattning den kommer att få när det gäller kurdernas rättigheter. Turkiet har den senaste 15 åren förstört och ödelagt större delen av Kurdistan. Man kan nämna bara ett exempel av många, minst 4000 kurdiska befolkningsorter och byar har förstörts och mer än 4 miljoner är flyktingar i sitt eget land. Nu när Turkiet kommer att accepteras mer och mer som kandidatland av EU kommer man säkert att ha planer hur man skall restorera dessa orter samt hur man kan hjälpa alla kurder som pga Turkiets behandling blivit av med sina hem. EU kommer att skicka hjälp till Turkiets myndigheter. Hjälpen går alltså till förtryckaren och förgöraren. Då är det upp till Turkiets samvete hur vänlig man kan vara gentemot kurder. Hur mycket eftergifter man kan tänka sig för kurderna.

Det är en oacceptabel situation för kurderna. Det betyder att det är inte Turkiet som anpassar sig till EU utan tvärtom EU som anpassar sig till Turkiet. Det betyder också att Turkiet har sina egna krav för att tillhöra Europa.

Det är ett självklarhet för oss att inte visa någon tolerans för en sådan tendens som finns inom vissa europeiska länder. Därför krävde vi att Turkiet måste erkänna den kurdiska folkets nationella egenart och dess rättigheter garanteras av grundlagen innan man accepterade Turkiets medlems kandidatur. Nu blev det som det blev. Fortfarande är det inte för sent.

Vi kurder måste ha en egen vägkarta för att ställa tydliga krav på Turkiet. Vi bör också anstränga oss för att informera de europeiska länderna om Turkiets avvikelser från de europeiska normerna. Kurdiska demokratiska organisationer utomlands måste naturligtvis börja bygga samverkan och nätverk för denna process. Vi måste vara både målmedvetna och starka för att kunna påverka EU och för att ställa krav till alla berörda parterna i denna process som den viktiga parten inför Turkiets medlemskap till EU. Vi kan inte vara passiv åskådare när matchen handlar om oss också.

www.arsivakurdi.org






# STOCKHOLM KONFERENSEN 2000

## 2-4 juni 2000 ABF

**PROGRAM**

**fredag 2-6-2000**

10:15-12:00 **Köpenhamns KRITERIUM Kurdfrågan och Turkiets EU medlemskap**

Mariane Andersson (ordförande Svenska Stöd Kommitten)

Cinnika Bejming, Riksdags ledamot

13:00-16:00 **Den politiska situationen i Turkiet**

Yilmaz ÇAMLIBEL, (DBP)

**lördag 3-6-2000**

13:00-16:00 **Demokrati Plattformen**

Seyhmus DIKEN,Rådgivare för näringslivet i Diyarbekir,

Mehmet VURAL, från Stiftelsen för Mänskliga Rättigheter i Turkiet

**söndag 4-6-2000**

13:00-15:00 **Samarbete mellan kurdiska organisationer i Europa**

Kurdiska riksförbundet, **Kurdiska Institutet i Paris**, Komkar, **Kurdiska föreningen i Stavanger(Norge)**

Kurdisk Informationskontor i Bryssel, **Kurdiska Kulturstiftelsen i Stockholm**, Stiftelsen Kurdiska Biblioteket

**Arr: ABF, Kurdiska riksförbundet**

www.arsivakurdi.org

# SlutDeklaration

På initiativ av Kurdiska riksförbundet i Sverige har vi, en rad kurdiska demokratiska organisationer och institutioner i Sverige, Norge, Tyskland, Frankrike och Belgien, samlats 2-4 juni 2000 i Stockholm för att bl a diskutera kurdernas rättigheter med anledning av Turkiets kandidatur för medlemskap i EU.

Efter givande diskussioner har de kurdiska organisationernas behov av att etablera ett organiserat samarbete, byta erfarenheter och diskutera gemensamma frågor samt samordna opinionsbildningen i Europa, lett till följande beslut:

■ Kurdiska folket som en uppdelad nation mellan Turkiet, Iran, Irak och Syrien har sin rätt att utöva sin kultur, utbilda sig på sitt modersmål och bestämma över sig själva i sitt eget land.

■ Vi är eniga om att de internationella och av EU fastställda kriterierna, däribland Köpenhamnskriterierna, åtminstone skall vara vägledande för att lösa den kurdiska frågan i Turkiet, i samband med landets kandidatur för medlemskap i EU.

■ Vi värdesätter högt den politiska, sociala och kulturella utvecklingen och framgångarna i irakiska Kurdistan. Vi uppmanar därför både kurdiska och internationella krafter att stödja denna demokratiska utveckling. Vi fördömer samtidigt främst Turkiets upprepade intervention, yttre militära hot samt all annan inblandning, som syftar till att bromsa den progressiva utvecklingen i irakiska Kurdistan.

■ Kurdiska Riksförbundet tar, efter organisationernas gemensamma förslag, initiativ till att anordna en internationell konferens i syfte att inför EU och övriga internationella aktörer belysa de kurdiska kraven. Vi lägger därvid stor vikt vid att konferensen anordnas under det svenska ordförandeskapet i EU.

■ Vi är överens om att samordna vårt opinionsbildande arbete i Europa. En kommission har bildats för att ytterligare bearbeta strukturella och praktiska förslag. Vi kommer även att försöka utvidga detta samarbete till att omfatta fler kurdiska organisationer i Europa.

Stockholm den 4 juni 2000

---

Kurdiska Riksförbundet i Sverige
Stiftelsen Kurdiska Biblioteket
Kurdiska Kultur Stiftelsen i Stockholm
Kurdiska Institutet i Paris
KOMKAR (Verband der Vereine aus Kurdistan) i Tyskland
Kurdiska Information och Relationskontor i Bryssel
Kurdisk Demokratisk Förening i Rogaland i Norge
Internationella Föreningen för mänskliga rättighter i Kurdistan i Tyskland

www.arsivakurdi.org

## Utrikesminister Anna Lindh:

# ”Det har vi gjort hittills och det kommer vi att fortsätta att göra”



Aziz Alis och Cemil Demircan intervjuade Utrikesminister Anna Lindh

**”Vi kommer att fortsätta från svensk sida och vi kommer att samarbeta med de andra nordiska länderna för att verkligen ta upp Kurdernas frågor och problem i EU. Det har vi gjort hittills och det kommer vi att fortsätta att göra”**

**Ararat:** Innan vi börjar , vill vi överlämna fyra rosor, där varje ros symboliserar en del av det DELADE KURDISTAN.

**Anna Lindh:** Ja, just det!... (skratt...) Det är spännande... De är väldigt fina... Tack så mycket!..

**Ararat:** Inledningsvis skulle vi vilja börja med att ge en sammanfattning av hur vi ser på utvecklingen.

**Anna Lindh**: OK

**Ararat:** inför FN:s kommission för mänskliga rättigheter, den 31 mars 1999, säger ni: ”Kurderna förnekas sitt språk, sin kulturella identitet och för oss självklara demokratiska rättigheter.”

Den 25 november 1999 har ni ett möte med Turkiets utrikesminister Ismail Cem.

Han har med sig säckenfull kurdiska tidningar, tidskrifter, kasetter och cd skivor för att bevisa och understryka att demokratin råder i Turkiet...

**Anna Lindh**: Bland annat Uzuns ... författaren Uzun...

**Ararat**: Den 12 december 1999 godtas Turkiets EU medlemskap...

I februari besöker ni Turkiet. Där träffar ni kurdiska representanter och vid olika tillfälle påpekar ni att: ”Turkiet måste hitta en lösning för den kurdiska frågan, uppfylla kriterierna för demokratin och reglera yttrande friheten”...

Men?...

Det som sker i Turkiet är helt det motsatta...

Många borgmästare i Kurdistan blir arresterade... två svenska journalister från Dagens Nyheter blir illa behandlade av turkiska polisen i Viransehir... Ni reagerar med det samma. Kurdisk författare Mehmet Uzuns böcker ploccas ur affärer och förbjuds...

I april, uttalar sig dessutom Turkiets stats minister Ecevit, inför de gästande Europa parlamentarikerna, att ”kurdiska inte är ett språk, utan en dialekt...”

Efter allt detta, inser man att ett fortsatt förtryck förefaller mest sannolik...

Vad är Er högst personliga åsikt? Hur resonerar ni kring detta?

**Anna Lindh**: Jag tycker att det är väldigt alvarligt det som har skett, och vi har tagit upp både med Cem och den svenska ambassaden och formellt även med Tur-kiets regering. Men med den utveckling som jag har sett efter att jag hade varit i Turkiet, arresteringarna av borgmästarna, beslagtagandet av Uzuns böcker, och fängslandet av Afton bladets journalister är flera exempel på att det går åt fel håll. Jag tror att det här är, jag har en känsla av att det finns två riktningar i Turkiet, En tycker att det här är pinsamt och genant för Turkiet och en som myndigheter, polis, militär som inte accepterar en utveckling mot mänskliga rättigheter och demokrati. Och här är det viktigt att alla EU-länder fortsätter att tala om Turkiet inte får börja förhandla om medlemskap om det här fortsätter men Turkiet måste uppfylla dom politiska kraven innan man får bli medlem. Innan man ens för börja förhandla om medlemskap ” vill jag säga”.

**Ararat:** Både Kassimlo och Serefkendi, vilka var berömda socialdemokrater och ledare för Kurdistan Demokratik Parti i Iran, pepprades med kulor mitt i Europa... Var Internationalen ställning och ansvar-tagandet tillfredställande, enligt Er?

www.arsivakurdi.org

**"Jag hoppas att man hittar en lösning där Irakiska Kurdistan fortfarande är en del av Irak, jag tror att det är farligt när man börjar diskutera nya länder. En del av Irak men fortfarande med ett stort egenbestämmande, det är nu det rimligaste efter att det har byggts upp under den här perioden."**

**Anna Lindh**: Problemet är ju ........, trots alla protester som man har gett mot dom ansvariga regimerna så har man inte fått någon lösning eller någon skyldig att ställa till ansvar.

**Ararat:** I det södra Kurdistan, i Irak, är önskan och förutsättningarna för ett federativt styre mycket stort... Vilken stöd får de? Ifall Saddam faller och en annan ersättare tar makten, vad kommer att hända med den nuvarande statusen?

**Anna Lindh**: Jag hoppas att man hittar en lösning där Irakiska Kurdistan fortfarande är en del av Irak, jag tror att det är farligt när man börjar diskutera nya länder. En del av Irak men fortfarande med ett stort egenbestämmande, det är nu det rimligaste efter att det har byggts upp under den här perioden.

**Ararat:** Över 100 000 kurder, som födds och lever i det lilla delen av Kurdistan, i Syrien, är utanför medborgarskapet och har ingen offentlig status, t.o.m. har benämnts för "främlingar"... Vad görs åt detta?

**Anna Lindh:** Jag tog upp det med den syriske utrikesministern när jag träffade honom före påsk och då fick jag och då fick jag inget svar , men det är viktigt att ta upp det här för det gäller inte bara Kurder utan även Palestinier också att alla har rätt till medborgarskapet och passet.

**Ararat**: Den första januari 2001 övertar Sverige för första gången ordförandeskapet i EU:s ministerråd... Med tanken att "EN kan inte göra allt, men FLERA kan göra något", skulle ni inte kunna skapa en "nordisk grupp" eller övertyga socialde-mokrat gruppen inom EU och lyfta fram det "advokatslösa folkets" rättigheter?

**Anna Lindh**: Vi kommer att fortsätta från svensk sida och vi kommer att samarbeta med de andra nordiska länderna för att verkligen ta upp Kurdernas frågor och problem i EU. Det har vi gjort hittills och det kommer vi att fortsätta att göra, men sen kan jag inte lova hur bra vi lyckas.

**Ararat**: Lycka till och tack så väldigt mycket för det ni gör...

1 maj 2000
Cemil DEMIRCAN
Aziz ALIS

**Rättelse**

**Devrim Nujen** var okcså en av föreläsarna när projektet "generationskonflikt" hade sina utbildningsdagar i Nynäshamn.

Vi ber om ursäkt för att hennes namn kom inte med i förra numret (no:115) av Berbang



**Anna Lindh:**

**"När det gäller kurderna i Turkiet, för där lever ungefär 15 miljoner kurder i Turkiet, som förbjöds att använda sitt språk, lära barnen läsa på kurdiska, sjunga och att använda i sin egen kultur."**

www.arsivakurdi.org

# Finns det mänskliga rättigheter i Sverige?

**Resîd Battê**

Människor från odemokratiska länder flyr undan diktatur, polisvåld, militär överhöghet, till länder som Sverige och andra eurupeiska länder för att kunna komma undan förföljelse och tortyr osv.

Samma människor råkar för ännu värre förföljelse som stänger dem in i ett helvete utan återvändo. Skillnaden mellan det nya demokratiska landet och det gamla diktaturen är inte stor. Människan kunde genom mutor och annat rymma till ett land som vi kallar "demokratisk", men kan inte rymma till ett nytt land utan kan med tvång återlämnas till det gamla diktaturen som har beordrats efter "så kallade demokratisk beslut". .Rättssystemet i det så kallade "demokratiska" landet kräver att den här asylsökande människan ska visa kvitto, intyg från torteraren, smugglaren från sitt gamla land. Utan intyg från diktaturen är människan inte värt ett öre i det så kallade "rättsstaten".

Staterna: sinsimellan" demokratiska och odemokratiska" har alla sorters diplomatiska förbindelser, dem har handelsförbindelser och diktaturen köper vapen från det så kallade "demokratiska" landet.

Vad händer människan som verkar vara en ny byttbar vara mellan dem här länderna? Jo, efter en tid med förhör, advokat hjälp får människan bo i en lägenhet, får sitt uppehälle ordnat, barnen börjar gå till skolan och man börjar vänja sig vid det nya landet med hoppet på att kunna stanna och komma undan diktaturen. Väntan på ett positivt beslut från systemet dröjer i månader och år. Den här/de här människorna efter lång väntan får ett enkelt beslut från en tjänsteman där ovanifrån som dem aldrig har sett och hört, som kräver ett intyg på att dem är "torterade, fängslade eller någonting annat", annars riskerar dem att skickas tillbaka.

Människorna börjar bli oroliga och försöker en engång genom att skicka pengar till släktingar och vänner i det gamla landet för att fixa intyg/kvitto. Tjänstemannen i det diktaturiska landet med hjälp av det demokratiska rättssystemets tjänstemän får lönehöjning. Vilket underbart samarbete!!!

Sedan får man fram falska intyg, vilka som i värkligheten existerar inte någonstans i världen. Hur en torterare skriver intyg till sina offer får man kanske i "rättssystemets namn" fråga tjänstemännen på Statens Invandrarverk här i Sverige...

Det värsta kommer sedan efter sista beslutet från Utlännings nämnden. Människorna tappar all mänsklig kontakt med myndigheterna. Inga pengar att försörja sig med, ingen advokat ställer upp, man får ingen läkarvård och det värsta måste man gömma sig undan det demokratiska landets polis. Man kan inte sova en natt utan måste byte plats så ofta för att kunna vara säker. Barnen blir oroliga, kan inte gå till skolan längre, föräldrarna tappar sina värden som människor framförallt gentemot sina barn.

De är ingenting utan lögnare och parasiter som försörjer sig på andras bekostnad. Ingen heder och ingen ära är kvar efter att ha kommit till det så kallade "asyllandet det demokratiska". Två år, fyra år eller längre kan människorna i detta land bo utan all mänsklig, statlig hjälp.

På det här sättet skapar Sverige

**"Dem är ingenting utan lögnare och parasiter som försörjer sig på andras bekostnad. Ingen heder och ingen ära är kvar efter att ha kommit till det så kallade "asyllandet det demokratiska". Två år, fyra år eller längre kan människorna i detta land bo utan all mänsklig, statlig hjälp."**

"TRASIGA" familljer, individer som sedan längre fram kommer att ställa till problem för båda samhället och sig själv. Det finns för närvarande flera tusen människor gömda här i Sverige för att någon gång i framtiden kunna få rätten att bili accepterade som människor och stanna här i Sverige...

De här människorna får den hjälp de behöver av andra människor som är motståndare till den omänskliga behandlingen, t.ex kyrkliga samfund, läkare, psykologer, vanliga svenskar och andra medmänniskor. Vad gör staten Sverige med andra EU staterna? Jo dem vill hjälpa flyktingarna som kommer till något annat land utanför EU. Staterna ska kunna hjälpa dem där människorna genom att samarbete med deras torterare och diktaturer utanför och innanför EUs gränser...

Hur länge ska dem här människorna gömma sig och varför Sverige hjälper inte dem här gömda flyktingarna som har väntat och väntat i åratal? Är detta rättvist, finns det verkligen "mänskliga rättigheter" när det gäller dem här människorna som gömmer sig i åratal???

07.02.2000



www.arsivakurdi.org

# Ett folk, ett land



Chiman Aziz  Lorin Demircan

Vi kurder har en dröm om att få ett eget land, men hur ska detta gå till om vi inte kan komma överens inom vår egen folkgrupp?

För att uppnå drömmen krävs samarbete och överenskommelse inom folket. Därför är det viktigt att vi kurder inte har olika föreningar, som kan splittra och skapa oenighet mellan oss. Vi är starkare tillsammans.

Inte förrän vårt folk blir till ett, kan vi börja kämpa för att få ett eget land. Men vad är det för mening med det vi önskar, om allt kommer att rasa samman på grund av all oenighet.

Mer än fyra länder har redan särat på oss. En del förbjudit vårt språk och nekat vår existens. Därför är det viktigt att vi slår oss ihop och står emot all diskriminering. Även om vi inte kan få ett eget land, så kan vi hålla ihop som ett folk med en dröm, som inga länder kan förinta.

Det finns många kurder som har kämpat under en lång tid, för att få ett eget land. En anledning till att det inte har blivit så mycket resultat, kan vara att kurderna inte har varit tillräckligt eniga om hur de ska kämpa. Alla vill kämpa och nå samma mål, men problemet är att vi arbetar i små grupper och på olika sätt. Utvecklingen skulle säkert vara snabbare om alla dessa små grupper slog sig samman och hittade ett sätt att tillsammans kämpa på.

Vi vill ta fram en annan fråga, som är livsviktigt enligt vår uppfattning. Vi håller med att det är svårt för föräldrarna att vänja sig vid det nya samhället, men ännu svårare är det för ungdomarna.

Invandrarungdomar lever i två världar varje dag. Den ena världen är utanför hemmet, där de får möta nya levnadssätt. Den andra världen är hemma, där man har sitt ursprung och sina föräldrars levnads-sätt.

Föräldrar måste kunna kommunicera med sina barn för att hjälpa dem i det nya samhället, så att barnen kan hitta en balans mellan de två olika världarna.

Föräldrarna ska även lära sina barn mer om den egna kulturen, traditioner, språk och ursprung. På så sätt kan barnen föra de här sakerna vidare och hålla dem vid liv. Trots allt är barnen vår framtid och kan med hjälp av sina erfarenheter kämpa vidare, så att alla kurders dröm om ett eget land så småningom går i uppfyllelse.




"Mer än fyra länder har redan särat på oss. En del förbjudit vårt språk och nekat vår existens. Därför är det viktigt att vi slår oss ihop och står emot all diskriminering. Även om vi inte kan få ett eget land, så kan vi hålla ihop som ett folk med en dröm, som inga länder kan förinta."

Vänsterpartiet
Att: Thomas Magnusson

**1: a maj hälsning**

Å Kurdiska riksförbundets vägnar vill jag skicka våra varma hälsningar till 1:a tåget som anordnas av Vänsterpartiet. Kurdiska riksförbundet har mer än över 20 år deltagit i 1:a maj tågen och kommer även i fortsättningen göra det.

Vi vill även påpeka att kurder i Sverige uppskattar Vänsterpartiets insatser genom åren för det kurdiska folkets kamp. Vi hoppas förstås att den kurdiska frågan blir en viktigt punkt på er dagordning även i fortsättningen. Denna dag som präglar den internationella solidariteten är en kampdag för oss alla, inte minst för kurder eftersom vi saknar fortfarande alla våra demokratiska fri och rättigheterna.

Det är viktigt att vi fördömer alla ockupationsländerna Turkiet, Irak, Iran och Syrien. Men det kanske ännu viktigare att fördöma Turkiets behandling och övergrepp på kurder inte minst för Turkiets medlemskap till EU.

Leve den internationella solidariteten
Keya Izol
förbundsordförande

www.arsivakurdi.org

# Berbang

Kurdiska Riksförbundets Tidskrift • Juni2000 • No: 116 • Price 25







## Stockholm konferansen 2-4 juni-2000

# گۆشەی منالان

## شیعر بۆ منالان

### «مژدە»

دایکی سۆلاف

بە خۆشی و کامەرانی

هەموو ئەڵێین گۆرانی

با گشت بە کۆمەڵ بچین

بۆ دەشت و دەری ڕەنگین

وا سمۆرە لەسەر دار

(گویز) ئەشکێنێ جاروبار

ڕێویش هات بە کلکی فش !

بە چاوی بز خشە خش

(ئاسکە) چاو ڕەش بە بازدان

دڵخۆشە هاتە ناومان

پشیلە سپیە تووک نەرمە !

فێرە باوەشی گەرمە !

وا پەپوولەش هات لە دوور

بۆ سەر گوڵی زەرد و سوور

چۆلەکەش ئەجریوێنێ

مژدەی شادی ئەهێنێ

ئەیکەین بە سەیران و گەشت

دوا ڕۆژ ئەکەین بە بەهەشت !

## پیرۆزبایی کردن

**ماردین ئیبراهیمی**



پێنجەمین سالی لە دایکبوونت پیرۆز بێ.
لە لایەن بابە گەورە و دایە گەورەوە

**لاوان ئازەری**



هەشتەمین مانگی لە دایکبوونت پیرۆز بێ.
لە لایەن بنەماڵەکانی ئازەری و دانیشەوە.

**تارا ئیبراهیمی**



چوارەمین مانگی لە دایکبوونت پیرۆز بێ .
لە لایەن بابە گەورە و دایە گەورەوە

**نوسەر سەردار !**



دووهەمین سالی لە دایکبوونت پیرۆز بێ .
سەردار عومەر

**شەمال ئەرمەغانی**



هەفتەمین مانگی لە دایک بوونت پیرۆز بێ
لە لایەن نەنە و بابەوە

**ئەڤین ئازەری**



شەشەمین مانگی لە دایک بوونت پیرۆز بێ .
لە لایەن نەنە و بابەوە

www.arshiakurdi.org

# گرەو

**عەبدوڵڵا پەشێو**



هاوین بوو ...
هاوینی کوردستان .
هەیوەشەو ، ساماڵ بوو .
لەسەر گازی پشت بووین .
ڕایەخ - گیای لاپاڵ بوو .
ئاسمان پڕ ئەستێرە ،
سەریش پڕ خەیاڵ بوو .
...
لە ناکاو پرسێک بە بیرمدا هات:
« ئەرێ ... ئەستێرەی ئێرە و هەندەران
هەمان ئەستێرەن ؟
من دەڵێم جودان ! »
هەموویان گوتیان :
« نەخێر جودا نین ،
هی ئێرە و ئەوێ ... دەق وەکوو یەک وان ! »
...
گرەومان کرد .
بەیانی چووین
لە گوند پرسی مەلامان کرد .
پاشان لە شار
پرسی گەلێک زانامان کرد .
ئەوانیش گوتیان :
« ئەوانەی لەوێن ،
ئەمانەی لێرەن ،
شکی تیا نییە هەمان ئەستێرەن .»
...
لە هەنگێرا
عومرێک بە سەر ئەو شەوەدا تێپەڕیوە ...
دیسان ... لەسەر گازی پشتم ،
چاوم لە ئاسمان بڕیوە .
گومانی ئەوسام ، ئێستا یەقینە :
ئەستێرەناسی
هەموو جیهانیش
بە گژمدا چن ،
ئەستێرەکانی دنیای هەندەران
قەت لە ئەستێرەی کوردستان ناچن !

١٩٩٢ مۆسکۆ

هەیوە شەو = مانگە شەو

## بەربانگ و خوێنەران

- برای ئازیزمان کاک سەعید سەقزی لە ستۆکهۆڵم سوپاست ئەکەین بۆ لێپرسینەوەت لە گۆڤارەکەمان. نامەکەت بە کۆمیتەی کارگێری فیدراسیۆن گەیشت. چونکە نێوەڕۆکەکەی لەگەڵ سیاسەتی بەربانگ ناگونجێ ، ناتوانین بڵاوی بکەینەوە.

- خاوەنی بەرهەمی ڕژێمی ئێران و گەلی کورد لە لینشۆپینگ. سوپاس بۆ هاوکاریتان. وتارەکەت بە خەتێکی زۆر ورد نوسراوە، بەداخەوە ئێمە نەمانتوانی کەڵکی لێ وەرگرین.

## چاپکراوی نوێ

ناوی کتێب : ئەفسانە کوردییەکان
کۆکردنەوەی : م. ب. ڕۆدینکۆ
وەرگێڕ لە ڕوسییەوە بۆ فارسی : کەریمی کەشاوەرز
وەرگێڕ لە فارسییەوە بۆ کوردی : کەریمی حسامی
چاپ : ٢٠٠٠ ستۆکهۆڵم

ناوی کتێب : کورد لە گەمەی دەوڵەتانی زلهێز و حکومەتانی ناوچەدا
نوسەر : کەریمی حسامی
چاپ ١٩٩٩ ستۆکهۆڵم

ناوی کتێب : هونەری ڕاوەژن
نوسەر : حەمەسەعید حەسەن
چاپ یەکەم : مالمۆ - سوید - ٢٠٠٠

ناوی کتێب : کۆماری دیموکراتی
نوسەر : حامید گەوهەری
نوسینەوە بە پیتی لاتین و زاراوەی کرمانجی سەروو : محەیەدین ئەحمەد
چاپ : ئوپسالا - سوید

www.arsivakurdi.org

# خۆێندکارانی کورد لە زانکۆی ئوپسالا



٤٦ خوێندکاری کوردی پۆلەکانی ناوەندیی و دواناوەندیی شارەوانی بوتشویرکا ، کە هاوکات لەگەڵ خوێندنی ئاسایی، زمانی کوردیش دەخوێنن، ڕۆژی ٢٠٠٠/٥/٣١ بە هاوکاریی فیدراسیۆن لەگەڵ شەش مامۆستای زمانی کوردیی چوونە ئوپسالا و سەردانی بەشی کوردیی زانکۆیان کرد و ئەو ژمارە خوێندکارە کوردەیان بینی کە لە باکوری کوردستانەوە بۆ خوێندنی زمان و مێژووی کوردی هاتوونەتە سوید.

خوێندکاران لە لایەن فەرهاد شاکەلی، مامۆستای بەشی کوردی زانکۆی ئوپسالا و محەمەد تەیفون (مالیسانژ) مامۆستای کۆرسی کوردیی زانکۆ بە گەرمیی پێشوازییان لێ کرا. فەرهاد شاکەلی لە سەر بەشی کوردیی زانکۆ و محەمەد تەیفون لە سەر وانە دەرسییەکانی خوێندکارانی باکوری کوردستان بۆ خوێندکاران دوان و وەڵامی پرسیارەکانیان دایەوە. هەروەها ڕەمزی کەریم مامۆستای زمانی کوردی شارەوانی بۆتشیرکا ئاماژەی کرد بە خوێندنی زمانی کوردیی لە شارەوانی بوتشویرکا و گرنگایەتی خوێندنی زمانی زگماکی بۆ خوێندکارانی کورد دوا.
خوێندکاران لە گەشتەکەیاندا چوونە بارەگای کۆمەڵەی کوردی- سوید ئوپسالا و لە لایەن سەرۆک و ئەندامانی کۆمەڵەوە پێشوازییان لێکرا و لەسەر خەباتی کۆمەڵە و ئەرک و چالاکییەکانی فیدراسیۆن گفتوگۆیان کرد و سوپاسی خۆیان ئاراستەی فیدراسیۆن و کۆمەڵەی کوردی- سوید ئوپسالا کرد.

## ئاگاداریی

فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوید لە نێوان ڕۆژانی ٢٠٠١/٥/٢٣ هەتا ٢٠٠١/٥/٢٧ بۆ ماوەی پێنج ڕۆژ بە چالاکی هەمەچەشنە لە ستۆکهۆڵم بیستەمینساڵی لە دایک بوونی خۆی پیرۆز دەکات. چالاکییەکانی فیدراسیۆن لەو پێنج ڕۆژەدا بریتی دەبن لە : پێکهێنانی سمینار و کۆبوونەوە، دانانی پێشانگا و پێشاندانی فیلم. فیدراسیۆن هەروەها لە بوارەکانی زانستیدا خوێندکارانی ئاکادێمی خەڵات دەکات. ئەو کەسانەی کە خاوەن بەرهەمی زمان ، ئەدەبیات ، مێژوو ، وێنە ، موزیکی کوردین یاخود لە بوارەکانی کۆمەلایەتی دا تێزی دانیشگایان نوسیوە و خاوەنی خەباتی زانستیین ، دەتوانن بە نوسینی کورتەیک لە سەر ژیانیان ، خۆیان بە فیدراسیۆن بناسێنن. دوای هەڵسەنگاندنی بەرهەمەکانیان لە لایەن پسپۆرانەوە، خەڵات دەکرێن. نوسینەکان دەبێ هەتا کۆتایی ساڵی ٢٠٠٠ بە فیدراسیۆن بگەن.

**کۆمیتەی پیرۆزکردنی بیستەمین ساڵڕۆژی فیدراسیۆن**

www.arshivakurd.org



بیرۆی پەیوەندی و ئاگاداری لە بروکسل، نوێنەری کۆمەڵەی دیموکراتی کورد لە نۆرویژ، نوێنەری کۆمەڵەی نێونەتەوەیی بۆ مافی مرۆڤ لە کوردستان- ئاڵمانیا، نوێنەری ئینستیتووتی کورد لە فەرانسە، نوێنەری وەقفی کتێبخانەی کوردی لە ستۆکهۆڵم، نوێنەری فیدراسیۆنی کورد لە ئاڵمانیا (کۆمکار) سەردانی فیدراسیۆنیان کرد و لەلایەن ئەندامانی کۆمیتەی کارگێڕ و چەند ئەندامانی کۆمیتەی گشتی و ژمارەیەک لە ئەندامانی کۆمەڵەی ستۆکهۆڵم و دۆستانی فیدراسیۆنیەوە پێشوازیان لێ کرا. سەرۆک و سکرتێری فیدراسیۆن بەخێرهاتنی میوانانیان کرد و هەندک دەربارەی مێژوو و خەباتی فیدراسیۆن بۆ میوانان دوان و داوایان لە میوانەکان کرد، بیرورای خۆیان لە سەر کۆنفرانسی ستۆکهۆڵم ڕابگەیەنن. میوانەکان سەرەتا سوپاسی فیدراسیۆنیان کرد و داوای سەرکەوتنیان بۆ خواست، ئینجا ئاماژەیان بە لایەنە جیاوازەکانی کۆنفرانس کرد و لە کۆتایی دا، بەڕێز چاملی بەی ڕایگەیاند:

– سەربلندین بەوە کە دەبینین فیدراسیۆن خاوەنی تەجربەیەکی قوڵە و دەتوانێ کۆنفرانسی ئاوا مەزن بۆ ماوەی سێ ڕۆژان پێک بێنێ و لە هەموو ئەوروپاوە خەڵکی بۆ بانگهێشتن بکات. کۆنفراس کەمایەسی هەبوو، بەڵام دەستکەوتی مەزنیشی هەبوو. بۆ ئەمەش کوردەکان دەبێ بەهەموو شێوەیەک دەستی یەک بگرن و بەیەکەوە بۆ مافی نەتەوایەتی هەوڵ بدەن.

شەڕیکی یەکەمی جیهانی هەلێکی باشی بۆ کورد ڕەخساند کە دەوڵەتی خۆی دامەزرێنێ، بەڵام ئێمە نەمانتوانی. ئەمڕۆش هەلێکی باش کەوتووەتە دەست کوردان و دەبێ کەڵکی لێ وەرگرین و هەموو بەیەکەوە بە موسوڵمان و کۆمونیستەوە بۆ مافی نەتەوایەتی کورد هەوڵ بدەین. ئێمە ناڵێین هەموو لە ڕێکخراوێکدا و لە چوارشێوەی فکرێکدا کۆ ببنەوە، دەڵێین هەموو دەتوانن سەرەڕای پاراستنی پرنسیپەکانیان مێشکی خۆیان بۆ مەسەلەی نەتەوایەتی تەرخان بکەن.

لە لۆزان بەناوی ئێمەوە ڕایان دەربڕی و گوتیان ئێمە و کوردەکان بەیەکەوە کار دەکەین و کورد پێویستی بە دەوڵەتی جیا، بەڵام بەڵێنیەکانیان بە ئەنجام نەگەیاند و ئەمڕۆش دەوڵەتی تورکیا هەر ئەو سیاسەتەی گرتووەتەبەر و دەڵێن کورد تەنیا زمان دەخوازن نەک مافی

خودموختاری و فیدراڵی و سەربەخۆیی.

ئەو کارەی ئێوە بەرپرسانی فیدراسیۆن دەستتان پێکردووە، دەبێ درێژەی بدەن و هەوڵی کۆبوونەوەی بەرینتر و دەوڵەمەندتر بدەن، جا چ لە سوید یان لە وڵاتێکی تری ئەوروپادا بە هاوکاریی یەکتر.

– ڕۆژی ٢٠٠٠/٦/٣، کۆمیتەی هەرێمی سێ، پێنجەمین کۆبوونەوەی خۆی لە کارلستاد پێکهێنا. نوێنەر کۆمەڵەی کارلستاد، ئوریبرۆ، کۆمەڵەی کوردی لینشۆپینگ، کۆمەڵەی کەمئەندامانی لینشۆپینگ، یەکێتی لاوانی لینشۆپینگ، یەکێتی لاوانی کارلستاد، کۆمەڵەی ئیسکلستونا و ئەحمەد سندی بەرپرس کۆمیتەی هەرێمی سێ بەشدارنی ئەو کۆبوونەوەیە بوون. لە کۆبوونەوەکەدا، ئەحمەد سندی لەسەر کارو خەباتی فیدراسیۆن ئاگاداریی دا بە نوێنەرانی کۆمەڵەکان و کۆمەڵەکانیش چالاکییەکانی خۆیان خستە بەباس و چەند



پێشنیاریش بۆ خەباتی دوارپژ ئاراستە کرا.

– مامۆستاکانی کۆموونی بۆتشیرکا سەفەرێکی ئاگاداریی زانستی یان بۆ خوێندکارە کوردەکانی ئەو کۆموونە داناوە و دەیانەوێ سەردانی بەشی کوردی زانکۆی ئوپسالا بکەن و داوایان لە فیدراسیۆن کرد، خەرجی سەفەری خوێندکارەکان دابین بکات. کۆمیتەی کارگێڕ پێشنیازەکەی قبوڵ کرد.

– ڕۆژی ٢٠٠٠/٦/١٢، حامید گەوهەری و عاسی ڕەباتی بەشداریی سمینارێکیان کرد کە کۆمەڵەی کوردی شاری کارلسکوگا بۆ فیدراسیۆنی پێکهێنابوو. گەوهەری و ڕەباتی دەربارەی مێژوو و خەبات و چالاکییەکانی فیدراسیۆن بۆ بەشداران دوان و وەڵامی پرسیاریی بەشدارانیان دایەوە، کە بە گەرمی پێشوازیان لێکرا.

– ڕۆژی ٢٠٠٠/٦/١٢، کۆمەڵەی کولتوری کوردستان لە کارلستاد، پانزدەهەمین ساڵی دامەزرانی خۆی لە ڕەستورانێکدا بەناوی (٩١) پیرۆز کرد. حامید گەوهەری و عاسی ڕەباتی لە سەر داوای کۆمیتەی کارگێڕی کۆمەڵە چوونە کارلستاد و بەشداریی جەژنی کۆمەڵەیان کرد. ژمارەیەک لە ئەمدامانی کۆمەڵە و چەند میوانی سویدی بەشداریی ئەو جەژنەیان کرد.



www.arsivakurd.org

# چەند چالاكییەكی فیدراسیۆن

- ڕۆژی ١٣/٥/٢٠٠٠ فیستیڤاڵێكی مەزنی كولتوریی لە شاری شەبۆرک Cherroofg لە وڵاتی فەرانسە پێكهات و ماوەی هەشت ڕۆژی خایاند. لە ماوەی فیستیڤاڵەكەدا تەواوی شاری شەبۆرک بە ئاڵای كوردستان و بەرهەمە دەستییەكانی كوردستان ڕازابووەوە و گوندێكی كوردیی دروست كرابوو. فیستیڤاڵەكە لەلایەن خاتوو دانیال میتران ، سەرۆكی شارەوانی شەبۆرک و سەرۆكی بەشی بریتانیای فەرانسە كرایەوە. چەند كۆنفرانس لە پرۆگرامی كاری فیستیڤاڵەكەدا گیرا بوو. یەكێک لەو كۆنفرانسانە لەسەر دۆزی سیاسی كوردستان لە ناوخۆ و دەرەوەی و ڕۆڵی ڕێكخراوەكانی دەرەوەی كوردستان لەسەر دۆزی كورد بوو. كەیا ئیزۆل لەلایەن فیدراسیۆنەوە بەشداریی ئەو كۆنفرانسەی كرد و لەسەر ڕۆڵی ڕێكخراوەكانی دەرەوەی وڵات بۆ بەشداران دوا. ژمارەیەكی زۆر بەشداریی چالاكییەكانی فیستیڤاڵی فەرانسەیان كرد.

- ڕۆژی ٣١/٥/٢٠٠٠، پارتی چەپی سوید كۆنگرەی پێكهێنا. بەم بۆنەیەوە، شۆڕش بەلاد هەرد ئەندامی كۆمیتەی ڕاوێژ بە نوێنەرایەتی فیدراسیۆن، بەشداریی كۆنگرەی پارتی چەپی سویدی كرد و ڕۆژی ٣/٦/٢٠٠٠ وتاری فیدراسیۆنی خوێندەوە، كە تێیدا ئاماژەی بە ژیانی كورد لە سوید و بەرئەندام بوونی توركیا لە یەكێتیی ئەوروپادا دەكرد. شۆڕش ئاڵایەكی كوردستانی پێشكەشی كۆنگرەی پارتی چەپی سوید كرد.

تەنیا ڕێكخراوێكی بێگانە كە لە كۆنگرەی پارتی چەپدا وتاری خوێندەوە فیدراسیۆنی كۆمەڵە كوردستانییەكان بوو، كە پارتی چەپ لە كۆنگرەكەیدا بە تەنیا ڕێكخراوی دیموكراتی كوردی سوید قبول كرد. هەروەها دەربارەی كێشەی نەتەوەی كوردمان، Eva Zeterberg بەڕێوەبەری كۆنگرە ڕایگەیاند: ئێمە نەتەوەی كورد لەبیر ناكەین و بە بەردەوامیی پشتگیری مافی نەتەوەی كورد دەكەین. پارتی چەپ لە



كۆنگرەكەیدا فیدراسیۆنی خەڵات كرد و ئاڵا و سیمبولی خۆی و گوڵدانێكی تایبەتیی و چەپكە گوڵێكی پێشكەشی فیدراسیۆن كرد.

- ڕۆژی ٣/٦/٢٠٠٠، كۆمیتەی هەرێمی سێ، پێنجەمین كۆبوونەوەی خۆی لە كارلستاد پێكهێنا. نوێنەر كۆمەڵەی كارلستاد، ئوریبرۆ، كۆمەڵەی كوردی لینشۆپینگ، كۆمەڵەی كەمئەندامانی لینشۆپینگ، یەكێتی لاوانی لینشۆپینگ، یەكێتی لاوانی كارلستاد، كۆمەڵەی ئیسكلستونا و ئەحمەد سندی بەرپرس كۆمیتەی هەرێمی سێ بەشدارنی ئەو كۆبوونەوەیە بوون.

لە كۆبوونەوەكەدا، ئەحمەد سندی لەسەر كارو خەباتی فیدراسیۆن ئاگاداریی دا بە نوێنەرانی كۆمەڵەكان و كۆمەڵەكانیش چالاكییەكانی خۆیان خستە بەباس و چەند پێشنیاریش بۆ خەباتی دواڕۆژ ئاراستە كرا.

- مامۆستاكانی كۆموونی بۆتشیركا سەفەرێكی ئاگاداریی زانستی یان بۆ خوێندكارە



كوردەكانی ئەو كۆموونە داناوە و دەیانەوێ سەردانی بەشی كوردی زانكۆی ئوپسالا بكەن و داوایان لە فیدراسیۆن كرد، خەرجی سەفەری خوێندكارەكان دابین بكات. كۆمیتەی كارگێڕ پێشنیازەكەی قبول كرد.

- ڕۆژی ٤/٦/٢٠٠٠، بەڕێزان یەلماز چاملی بەی سەرۆكی پارتی ئازادی و ئاشتی لە توركیا، محەمەد ڤوراڵ لە كۆمیتەكانی مافی مرۆڤی توركیا و ئەندامی ڕێكخراوی جیهانیی مافی مرۆڤی كورد، شێخ مووس دیكن ڕاوێژكاری پیشەسازی شارەوانی دیاربەكر، نوێنەری



www.arsivakurd.org

# فیدراسیۆن میوانداریی خوێندکارانی کوردی شاری سالای کرد



رۆژی ٢٩/٥/٢٠٠٠، هەشت کچە خوێندکاری کوردی شاری سالا لەگەڵ عەلی زەرکەشی مامۆستایاندا سەردانی فیدراسیۆنیان کرد و لەلایەن کەیا ئیزۆل و حامید گەوهەرییەوە بە گەرمیی پێشوازیان لێکرا. لەم دیدارەدا، سەرۆک و سکرتێری فیدراسیۆن دەربارەی مێژوو و خەباتی فیدراسیۆن دوان و وەڵامی پرسیارەکانی میوانەکانیان دایەوە.

دوابەدوای ئەم دیدارە لە لایەن بەربانگەوە دیمانەیەکی کورت لەگەڵ میوانان کرا و خوێندکاران بە دڵفراوانییەوە بەشداریی دیمانەکەیان کرد و لە کۆتاییدا تەماشای فیلمی نەورۆزی ٢٠٠٠ی فیدراسیۆنیان کرد و سوپاسی خەبات و تێکۆشانی کۆمیتەکانی فیدراسیۆنیان کرد.

لە دیمانەکەدا و لە وەڵامی ئەم پرسیارەدا :

**- نەتەوەی ئێمە لە بارودۆخێکی ناهەموار دایە و ئێوە وەک لاوێکی کوردی دورە وڵات چۆن بیر لە نەتەوەکەتان دەکەنەوە و بە چ شێوەیەک دەتوانن یارمەتی نەتەوەکەتان بدەن؟ سەربەست و دڵخواز وتیان:**

– ئێمە بە هەموو شێوەیەک ئامادەین خزمەتی گەلەکەمان بکەین. ئەوەی ئەمڕۆ پتر دەکەوێتە سەرشانی ئێمە هەوڵدانمانە لە خوێندندا بۆ بەدەست هێنانی زانیاری و یەکگرتنمانە لەگەڵ کۆمەڵگای کوردی دانیشتووی سوید بۆ یارمەتیدانی بزوتنەوەی ڕەوای گەلەکەمان لە هەموو پارچەکانی کوردستاندا. هەروەها دڵخواز وتی: دەمەوێ زۆر بەپەرۆشەوە وانە قوتابخانەییەکانم بخوێنم و بۆ پێشکەوتنی کورد هەوڵ بدەم. دەمەوێ بچمە دانشگا و یاسا و داد بخوێنم و لەو ڕێگایەشەوە خزمەتی گەلەکەم بکەم.

**پ- ئێوەی کچە کورد لە سوید ، ژیانتان چۆن تێپەڕدەبێت ، ئایا لە ژیانی سوید ڕازین؟ لەگەڵ گرفتەکانی ئاوارەیی و دوو کولتورییدا چۆن دەژین؟ ناڵین (١٨ ساڵ) خەڵکی قامیشلی:**

و– ژیان لە سوید خۆشە ، بەڵام نەک بۆ ئێمەی کورد. ئێمە لێرە بە ژمارە زۆرین ، بەڵام ناتوانین دەستی یەکتر بگرین و بۆ نەهێشتنی گیروگرفتەکان و کۆمەککردن بە گەلەکەمان هاودەنگ بین! ئەمە بۆ من کە ١٧ ساڵە لە سوید دەژیم ، ئازارم دەدات. دەربارەی کوردستانیش کە پرسیارتان کرد ، من هیچ وەڵامێکم نیە ، چونکە من کوردستانم نەدیوە.

سێبەر: ئەوەی ڕاست بێ ژیان لە سوید زۆر ناخۆشە. کێشەی دوو فەرهەنگە و جیاوازیی نێوان فەرهەنگەکان ئێمە ئازار دەدات و زۆرجار ئەبێتە مایەی گیروگرفت بۆ ئێمەی لاو.

**پ- چۆن بوو ئێوە هاتن بۆ سەردانی فیدراسیۆن ؟ دەکرێ بپرسین تا چ ڕادەیەک ئاگاداری کاری فیدراسیۆنن؟**

و– ئێمە قەت ئاگاداری کاری فیدراسیۆن نەبووین و نەماندەزانی کورد لە سوید دەزگایەکی ئاوا بەرینی هەیە و بەم شێوەیە لە سوید کار دەکرێت بۆ کورد ، بەڵام چەند ژمارەیەکی بەربانگمان بینیوە.

**پ- دەکرێ ناو و شوێنی ژیانی خۆتان بە خوێنەرانی بەربانگ ڕاگەیەنن؟**

و– بەڵێ.

ناڵین ١٨ ساڵ ، لە ڕۆژئاوای کوردستان لەدایکبووی قامیشلی.

سەربەست ١٤ ساڵە ، باکور

سولاڤ ١٤ ساڵ ، باشور

دڵخواز ١٨ ساڵ ، باشور

هۆزان ١٤ ساڵ ، باشور

سێبەر ١٥ ساڵ ، باشور

بەهار ١٨ ساڵ ، دایک و بابم خەڵکی دهۆکن ، بەڵام من لە شاری (یەزد) لە ئێران لە دایک بووم.

ڕندۆک ١٥ ساڵ ، باشور

# دیمانەیەک لەگەڵ کۆمەڵەی فالون دا

کۆمەڵەی فالون ساڵی ١٩٩٩ بە ئەندامی فیدراسیۆن وەرگیراوە. بەربانگ لە ڕەوتی ناساندنی کۆمەڵەکانی سەربە فیدراسیۆندا بە خوێنەرانی، دیمانەیەکی لەگەڵ ئەندامانی کۆمیتەی کارگێڕی کۆمەڵە پێکهێنا. ئەوانەی بەشداریی ئەو وتوویژەیان کرد بریتی بوون لە بەڕێزان: عیزەت فەرخە ، خالید زەند کەریمی ، عومەر ئەحمەدی ، ئەحمەد حەسەنی و سیامەند ئیبراهیم زادە.



**پ- دەکرێ ناوی تەواوی کۆمەڵەکەتان بۆ خوێنەرانی بەربانگ ڕوون بکەنەوە و کەی ئەو کۆمەڵەیەتان دامەزراندووە و چەند ئەندامتان هەیە؟**

و- بەڵێ ، ناوی کۆمەڵەی ئێمە ، (کۆمەڵەی کورد لە فالون)ە. ساڵی ١٩٩٢ کۆمەڵەکەمان دامەزراوە و ٦٩ ئەندامەمان هەیە.

**پ- هەتا ئێستا چەند کۆنگرەتان پێکهێناوە؟**

و- جیا لە کۆنگرەی دامەزرێنەری کۆمەڵە کە ناوی کۆنفرانس بوو ، هەموو ساڵێک کۆنفرانسمان پێک هێناوە. ساڵی ١٩٩٩ کە بریارمان دا ببین بە ئەندامی فیدراسیۆن ، ناوی کۆنفرانسیشمان کردە کۆنگرە و بەمجۆرە لە فیدراسیۆندا بووین بە ئەندام.

**پ- چەند خێزانی کورد لە فالون دەژی؟**

و- شاری فالون جاران کوردی زۆری تیادا بوو، چونکە لێرە ئۆردوگای پەنابەران هەبوو، ئێستا نزیکەی ٥٠ خێزانی کوردی تیادا دەژی کە کوردی هەموو پارچەکانی کوردستانن.

**پ- فالون لە چ ساڵێکەوە کوردی لێ نیشتەجێ بووە و یەکەم گرووپی کوردی شارەکەتان هی کام بەشی کوردستان بوون؟**

و- ساڵی ١٩٩٠ دوو کورد هاتوون بۆ فالون ، یەکێک لەوان لە یەکەم کۆنگرەوە بووەتە ئەندامی کۆمەڵە و ئێستاش هەر ئەندامی کۆمەڵەیە و لە کۆمیتەی کارگێڕدا خەبات دەکات.

**پ- کۆمەڵەکەتان پتر بە چ ئەرکێکەوە خەریکە و چی دەکات؟**

و- جگە لە ساڵێک نەبێت ، کۆمەڵە هەموو ساڵێک لۆکاڵی خۆی هەبووە. لە یەکەم ساڵی دامەزرانی کۆمەڵەدا داوای هەندێ کتێبمان لە کتێبخانەی گشتیی شار کرد، کە بیانهێنێت بۆ کتێبخانە و کوردەکان سودی لێ وەرگرن و ئەمەمان جێبەجێ کرد. هەروەک وتمان لێرە ئۆردوگای پەنابەران هەبوو ، کۆمەڵە هەمیشە لە هەوڵداندا بووە لە پێناوی خزمەتی کوردەکانی ئۆردووگاکە و بۆ چارەسەرکردنی تەنگ و چەڵەمەکانیان.

وەک هەموو کۆمەڵەکانی سەربە فیدراسیۆن ، یادی ڕۆژە مێژووییەکانی گەلەکەمان دەکەینەوە ، جەژنی نەورۆز پیرۆز دەکەین. شەوی کوردیی پێک دێنین و کۆڕ و سیمینار دەگێڕین.

**پ- لە خەباتی خۆتاندا بۆ منداڵان و ژنان چیتان کردووە؟**

و- ئێمە ژن و لاومان ئەندامن ، بەڵام ڕێکخراوی تایبەتمان بۆ ئەوان نیە. لەبەرئەوە ، کۆمەڵە تیپی فوتبۆڵی بۆ لاوان پێکهێناوە.

**پ- لە کۆتاییدا ، چی بە گرنگ ئەزانن کە فیدراسیۆن ئەمڕۆ بیکات؟**

و- دوا قسەمان ئەوەیە کە فیدراسیۆن ڕادیۆیەکی سەرتاسەریی سوید بە زمانی کوردیی بکاتەوە و کتێبی کوردیی بۆ خوێندنی منداڵان لە سوید بە زمانی سۆرانی و کرمانجی چاپ بکات.

www.arsivakurd.org

# دیمانەیەک لەگەڵ کۆمەڵەی کریستیان ستاد

کۆمەڵەی کریستیان ستاد ساڵی ۱۹۹۹ بە ئەندامی فیدراسیۆن وەرگیراوە. بەربانگ لە ڕەوتی ناساندنی کۆمەڵەکانی سەربە فیدراسیۆندا بە خوێنەرانی ، وتووێژێکی کورتی لەگەڵ ئەندامانی کۆمیتەی کارگێڕی کۆمەڵە پێکهێنا. ئەوانەی بەشداریی ئەو وتووێژەیان کرد بریتی بوون لە بەڕێزان: خەسرەو خەلیلی سەرۆکی کۆمەڵە، ئاوارە ئیبراهیم ، عارف عوسمان ، عەلی ئیبراهیم و شێرزاد بلباس ئەندامانی کۆمیتەی کارگێڕ و دوو ئەندامی تری کۆمەڵە.



**پ- دەکرێ ناوی تەواوی کۆمەڵەکەتان بۆ خوێنەرانی بەربانگ ڕوون بکەنەوە و کەی کۆمەڵەکەتان دامەزراندووە و چەند ئەندامتان هەیە؟**

و- ناوی کۆمەڵەکەمان ، کۆمەڵەی کولتوری کوردیی لە شاری کرستیان ستادە. ساڵی ۱۹۹۹ کۆمەڵەکەمان دامەزراندووە و نزیکەی ٥٠ ئەندامان هەیە.

**پ- هەتا ئێستا چەند کۆنگرەتان پێکهێناوە؟**

و- جیا لە کۆنگرەی دامەزرێنەری کۆمەڵە ، کۆنگرەیەکی ئاسایی و کۆنگرەیەکی نائاساییمان پێکهێناوە. ئەمەش لەبەر ئەوەیە کە بە پێی پرۆگرامی کۆمەڵە دەبێ هەر شەش مانگ جارێک کۆنگرە بگرین.

**پ- کریستیان ستاد لە کوێی سوید هەڵکەوتووە و چەند خێزانی کوردی لێ دەژی؟**

و- کریستیان ستاد لە باشوری سوید هەڵکەوتووە و نزیکەی شەست خێزانی کوردی لێ نیشتەجێیە و چەند کەسێکی تەنیاشی لێ یە.

**پ- کریستیان ستاد لە چ ساڵێکەوە کوردی لێ نیشتەجێ بووە؟**

و- یەکەم گروپی کورد لە هەشتاکاندا لە کریستیان ستاد نیشتەجێ کران و ئەوانیش بەتیکڕایی کوردی باشوری کوردستان بوون و ئێستاش ئەوانەی لەو شارە دەژین پتریان خەڵکی باشوری کوردستانن.

**پ- کۆمەڵەکەتان پتر بە چ ئەرکێکەوە خەریکە و چی دەکات؟**

و- ئێمە هەرچەندە ئەزمونێکی زۆرمان لە کاری بەڕێوەبردنی کۆمەڵەدا نیە ، بەڵام بەو حاڵەش هەوڵدەدەین کۆمەڵەکەمان لە جێگەی خۆی نەوەستێ و بەردەوام بەرەوپێشەوە بچێت بە دانانی پرۆژەی نوێ و ڕێکخستنی نوێ ، وەک دانانی کۆرسی زمانی کوردیی بۆ منداڵان و یارمەتیدانی گەورەکان لە بوارەکانی تێکەڵاوی (ئینتیگراشون)دا و پێک هێنانی ڕۆحی برایەتی لەنێوان کوردەکاندا ، کە بیروڕای سیاسی و ئایینیی جۆر بە جۆریان هەیە.

**پ- لە خەباتی خۆتاندا بۆ منالان و ژنان چیتان کردووە؟**

و- وتمان بۆ منالان پۆلی خویندنمان کردووەتەوە و خەریکین هەولی زیاتریان بۆ بدەین. دەربارەی ژنان دەبێ بڵێین ، لەم کۆنگرەیەی دواییماندا دوو ژن بۆ کۆمیتەی کارگێڕ هەڵبژێراون و بەرپرسایەتی چالاکییەکانی ژنانیان لە ئەستۆیە. ژنان لە کۆمەڵە کۆدەبنەوە ، بۆ ئەمەش هەم باشتر یەکتر دەناسن و هەم لەسەر وەزعی خۆیان گفتوگۆ دەکەن و لاوانیش دێنە کۆمەڵە لە هەندێک چالاکیی کۆمەڵەدا بەشداریی دەکەن.

**پ- کۆمەڵەکەتان جیا لە کاری کولتوریی چ کارێکی تریش دەکات؟**

و- کۆمەڵەی ئێمە کۆمەڵەیەکی کولتوریی ، کۆمەڵایەتی و دیموکراتییە و دەست لە کاری سیاسی وەرنادات و هەوڵیش دەدات کەسانی سیاسی سەر بە ڕێکخراوەکان لەناو کۆمەڵەدا بەپێی پرینسیپی کۆمەڵە بۆ ئامانجەکانی کۆمەڵەکەمان تێبکۆشن. ئەمساڵ ئێمە نەورۆزمان پیرۆز کرد و پتر لە ۲۰۰ کەس بەشداریی نەورۆزی کۆمەڵەیان کرد.

www.arshivakurd.org

مەبەست لە چۆنیەتی کردارەکەیە و بە زمانی کوردیی ئەکرێت ، خۆ ئەگەر بە یەک (ی) بینوسین ، وەک بە کوردی ئەنوسم ، ئەوا مانای وایە کە ئەو بە کورد لە قەڵەم ئەدەم یان وەک هاونیشتمانییەکی کورد سەرژمێری ئەکەم ، تۆماری ئەکەم ... و هتد.

هەروەها ئەگەر بڵێین شێتی مەکە ، مەبەست لەوەیە ئەو کەسە یان گیاندارە شێت مەکە ، زۆر جیاوازە لەوەی کە ئەڵێین شێتیی مەکە ، کە مانای ئەوەیە خۆت شێت مەکە ، یان (کرداری) ڕەفتاری شێتانە مەکە.

کەواتە بە پەیڕەوکردنی ئەو ڕێسا ئاسانە کە نامۆ نیە لە ڕێزمانەکەماندا ، بە ئاسانیی لەم کێشەیەش ڕزگارمان ئەبێت.

لێرەدا ئەبێ باسی ئەوەش بکەین کە زۆر کەس بە نارەوا پیتی (ی) ئەخزێننە ناو هەندێک وشەوە کە هیچ ڕێسایەک لە ڕێزمانەکەماندا نایگرێتەوە ، هەروەک لە بەکارهێنانی ڕاناو و ڕاناوی خۆیی دا.

من خۆم ، تۆ خۆت ، ئەو خۆی ، ئێمە خۆمان ، ئێوە خۆتان، ئەوان خۆیان . کە ئامرازی (ش) بەکارئەهێنین بۆ دڵنیایی و چەسپاندن ، ئەوا زۆر کەس لەبری ئەوەی بنوسن: من خۆشم ، تۆ خۆشت ، ئەو خۆشی ، ئێمە خۆشمان ، ئێوە خۆشتان ، ئەوان خۆشیان ، بەڵام ئەنوسن: من خۆیشم ، تۆ خۆیشت ، ئەو خۆیشی ، ئێوە خۆیشتان ، ئەوان خۆیشیان ، کە لە ڕاستییدا ئەمە تاڕادەیەک بە شێواندن ئەژمێررێت ، جا یان بە نەزانین یان بەمەبەست. لێرەدا لە دۆخی کەسی سێیەمی تاکدا ئەتوانرێت لادانێک لەو ڕێسایە بکرێت و بڵێین: ئەو خۆیشی ئەزانێت ، ئەویش لەپێناوی ئەوەدا کە ئەگەر ڕستەکە بە تەنیا بێت و بۆ ئەوەی ماناکەی نەگۆڕرێت و (خۆشی) نەبێت بە وەسفکردنی چۆنیەتی کرداری زانینەکە و لێکبدرێتەوە بە: ئەو (باسەکە یان شتەکە) بە خۆش ئەزانێت ، یان خۆش لێی ئەزانێت ، لەڕاستییدا ئەگەر پەیڕەوی ڕێساکان بکرێت ئەم لادانەش (نەک ئەم لادانەیش) مەرج نیە و پێویست نیە.

هەروەها لەگەڵ ڕاناودا، وەک:

منیش ، تۆش ، ئەویش ، ئێمەش ، ئێوەش ، ئەوانیش . لێرەدا ئەگەر بە وردیی سەرنج بدەین هەر وەک لە ڕاناوە خۆییەکانیشدا، ئەوا بۆمان دەرئەکەوێت کە ئەگەر وشەکە بە بزوێن کۆتایی بێت ، ئەوا ئامرازی (ش) بە تەنیا خۆی بەکارئەهێنرێت ، بەڵام لەوانی تردا ئامرازی (یش) بەکارئەهێنرێت ، هەر بۆیە پەیڕەونەکردنی ئەم ڕێسایە ئەبێتە هۆی ئەوەی بە هەڵە بنوسرێت: تۆیش ، ئێمەیش ، ئێوەیش.

کەواتە بە پەیڕەوکردنی ڕێسای بزوێنەکان: پارە ئەبێ بە پارەش نەک پارەیش ، ئێستا – ئێستاش ، موو – مووش ، دۆ – دۆش ، لادێ – لادێش ، دەرزی – دەرزیش ، مراوی – مراویش، بەڵام ئەگەر لە کۆتایی وشەکەدا پیتێکی بزوێن پێش (و) بکەوێت یان بە واتەیەکی تر ئەگەر وشەکە بە (و) کۆتایی بێت ، ئەوا ئەبێ پاشگری (یش) بەکاربهێنین ، وەک ئەو – ئەویش ، چاو – چاویش ، ماستاو – ماستاویش ، دێو – دێویش ، شیو – شیویش ... لێرەدا ئەبێ ئەوەش بڵێین کە هەندێک ئاوەڵناو و وشە خۆی بۆ خۆی بە جوتێک (ی) کۆتایی دێت ، لەبەرئەوە تەنیا (ش)ی بۆ زیاد ئەکرێت ، وەک پەمەیی – پەمەییش ، لادێیی – لادێییش ، کۆتایی – کۆتاییش...

# ئەم ساڵ لەم ژیانە غەریبیی و خەفەت بارە

ئەمساڵ
چرای خۆشبەختی ژیانم
لەبەهەشتی گەڵا ڕێزانی سەفادا کوژایەوە
کەچی
مۆمی فرمێسک خوێنین
لە دۆزەخی غەریبی دا
بۆم هەڵکرا

ئەمساڵ
گۆرانیەکانم لەم غەریبییەدا
هێندە پەشێون
ڕێگای مەینەتیان گرتووەتە بەر
کەبێ ماڵ ئاوایی
بەئاوازی گریانەوە
بەرەو کۆشکی خەڵوەت و
خەفەبونێکی تاساو
ڕێگا دەبڕن

ئەمساڵ
ملوانکەی مرواری تەمەنم
لەم هەوارە زەبونە
لە حەسرەتدا پچڕان و دەنکەکانی بوون بە زوخاو
تنۆک تنۆک
ڕژانە سەر ئەم خاکە
نشێوە

ئەمساڵ
تەنیا سەرم ناوەتەوە لەم ژینە بێزارە
کە دەرونم گرفتاری دنیای خەمە
لەم ژیانە خەفەتبارە
لەتاویشدا
مۆسیقای دوریی و غەریبیی لێ دەدەم
لەم ساڵە پڕ جەفاو
بێ بەهارە

هۆزان فایەق

www.asivakurd.org

# زمان

# جوتەپیت - بزوێن

نەوزاد وەلی

له ژمـارەی پێشـوودا باسی دوو پیـتی نابزوێنی (ر) و (ڕ)مان کرد کە لە هەندێک لە دۆخەکانی کرداردا بە جوت لەدوای یەک بێن ، ئاسانتـرە و ناشـبێـتـە هۆی کـێشـەی زمـانەوانیی و بەڵکە نەبوونی وەک کـەمـیـیـەکی زەق لە ڕێزمانەکـەمانـدا دیارە و بووەتە هۆی دروسـتـبـوونی کـرداری ناتەواو لە دۆخە جیاجیاکاندا، ئەویش بە تێخزاندنی (در) بۆ ناو کردارەکان ، کـە لە ڕاستییدا ئەو (د)ە پێویستییەکی ڕێزمانیی نیە.

له هەمان کاتدا دوو پیتی بزوێنی (و) و (ی) ، کێشەی لەو جۆرەی (ر) و (ڕ)یان هەیە ، هەرچەندە دوو پیـتی (و - ی) هەریەکە و قەوارەیەکی تایبەتیی خۆی هەیە لە ڕێزماندا.

پیـتی (و) وەک ئامـرازی پەیوەندیی و بەسـتنەوە ، لەلای هەمـووان ناسـراوە ، بەڵام کـێشـەی ئەم لەوەدایە کـە لە زۆر جێدا بە هەڵە بەکارئەهێنرێت.

پیتی (و) پیـتێکی بزوێنی لێوییە و دەربڕینی کـورتە و دەنگی کپە ، بۆیە لە سەرەتا و ناوەڕاستی وشەی سادەدا بە جـوت نانوسـرێت ، بەڵام لە کـۆتایی وشـەدا ئەگـەر پیـتێکی بزوێنی پێش نەکەوێت ، ئەوا دەنگەکەی تا ڕادەیەک ون ئەبێت ، بۆیە لەپێناوی درێژکـردنەوەی دەنگەکـەدا ئەبێ بە جـوت بنوسرێت ، بۆ نمونە:

لەدوای بزوێنەوە ، وەک ئاو ، ناو ، چاو ، مێو ، دێو ، زیو ، پیو ، پەیڕەو ، شەو ...

لەدوای نابزوێنەوە ، وەک مێژوو ، پەمـوو ، بەڕوو ، موو ، شاتوو ، دەزوو ، خوو...

بەڵام ئەگـەر دوو پیـتی بزوێنی پێش بکەوێت ، ئەوا بزوێنەکەی پێش خۆی بە جـوت ئەنوسـرێت ، وەک گـەییو ، مەییو ...

ئەو چاوگـانەی بە (ون) کـۆتاییـان دێت ، وەک بوون ، چوون ، دروون ... لە دارشتنی کـردارەکـانیاندا(و)ەکـە بە جوت ئەنوسرێت ، وەک بووم ، بوویت ، بوو ، چووم ، چوویت ، چوو ، درووم ، درووت ، درووی ... ئەویش لەبـەرئـەوەی کـە بزوێن پێش (و)ەکە ناکەوێت.

ئەوەی شایانی باسە تا ئێستاش ئەوانەی لە ڕێزمـانی کـوردیی کـۆڵیـونەتەوە ، ئەو هۆیەی سـەرەوەیان ڕەچاو نەکردووە لە بەکارهێنانی پیتی (و) دا، بۆیە لە دروستکردنی ناوی بکەردا بە جـوت نوسـینی ئەکـەن بە ڕێسـا ، وەک سەرکەوتن - سەرکەوتوو ، هاتن - هاتوو ، مردن - مردوو...

بە گوێرەی ئەم ڕێسایە بێت ، ئەبێ بەزین ببێت بە بەزیوو، ڕمان - ڕماوو ، سوتاو - سوتاوو ، تەقین - تەقیوو ... کە ئەمەش یەکجار سەختە لەسەر زمان و کەس بەو شێوەیە لە ئاخاوتندا دەریینابڕێت ، بۆیە ناسینەوەی پیتە بزوێنەکان و دەنگەکـانیـان و پەیڕەوکـردنی ئەو ڕێسـایەی سـەرەوە کـە باسمان کرد ، کێشەیەکی ناڕەوا لە بەرۆکی (و) ئەکاتەوە و ئـیـتـر ئەوەندەش لە بڵاوکـراوەکـاندا لە ناوەوە و دەرەوەی کوردستان ، لەبری کرداری بووەتە وشەی (بۆتە) نانوسرێت و نوسین نابێت بە نووسین و وتن نابێت بە ووتن...

پیـتی بزوێنی (ی) ، هەر وەک پیـتی بزوێنی (و) ڕۆڵی گرنگی خۆی هەیە لە ڕێزمانەکەماندا و بێگومانە کە ئەمیش هەروەک ئەوانی تر بێبەش نیە لە شێواندن و گرنگیی پێنەدان.

ئەم پیـتـە وەک ئامـرازی پەیوەندی و بەسـتنەوە و خستنەسەر و تەواوکەری مانا و دیاریکردن لە نێوان ناو و ئاوەڵناودا، ناسراوترین شێوەکانی بەکارهێنانیەتی ، وەک کوردی ئازا، خوێندکاری زیرەک ، دوژمنی درندە ...

هەروەها وەک نیشانەی کەسی سێیەم لە کرداردا(ڕاناوی لکاوی کەسی سێیەم) ، وەک بردی ، کردی ، خواردی.

بەڵام ئەوەی کـە ئەبێ زیاتر لێی ئاگـاداربین ، بەکـارهێنانیـەتی لە ئاوەڵناودا، چونکە بەگـشـتـیی بە هەڵە بەکـارهێنانەکـەی لێـرەدایە ، وەک دروستکردنی ئاوەڵناوی چۆنیـەتی و ڕێژەیی ، ئەم ئاوەڵناوەش وەسف و چۆنیـەتی و ڕێژەی بنچینە و شوێن و شێوە دەرئەخات ، کە ئەبێ لێرەدا بە جوت بنوسـرێت ، وەک پیر - پیریی ، چیا - چیایی ، تاریک - تاریکیی ، گشت - گشتیی ، تایبەت - تایبەتیی ...

کـە ئەڵێین ڕژێم کـەرکـوکی داگـیـرکـردووە ، (ی)ەکـەی کەرکوک ڕاناوی لکاوی کەسی سێیەمە کە ئەویش ڕژێمە ، بەڵام من کەرکوکییم ، لێرەدا (ی)ەکە بە جوت ئەنوسرێت و شـوێن و بنچینە دیارئەکـات ، خۆ ئەگـەر بە یەک (ی) بینوسین، من کەرکوکیم ، لێرەدا من ڕاناوی کەسی یەکەمە ، کـەرکوک ناوی شـوێنە ، ی ڕاناوی لکاوی کـەسی سـێـیـەمی نادیارە هەروەها (م)ەکەش ڕاناوی لکاوی کەسی یەکەمەکەیە.

ئەگـەر بە وردیی لەو ڕسـتـەیە بکۆڵینەوە ئەوا بۆمـان دەرئەکەوێت کە ڕستەیەکی بێ مانایە و لە ڕاستییدا ئەبێت بە: من کـەرکـوکی ئەوم ، کـەواتە جـیاوازییەکی زۆر هـەیە لە نێوان کـەرکـوکی جوان و کـەرکـوکیی جوان دا، کـە ئەویان باسی جوانیی شاری کـەرکـوک ئەکـات و ئەمـیـشـیـان باسی جوانیی کەسێکی خەڵکی کەرکوک.

هەروەها ئەم ڕێسایە ئاوەڵکرداری چۆنیەتییش بە هەمان شێوە ئەگرێتەوە ، کە ئەمیش چۆنیەتی کردار دەرئەخات و لە ناو و ئاوەڵناو دروست ئەکرێت ، وەک بە کوردیی ئەنوسم ، کە

www.arsivakurdi.org

کردنەوەی پەرلەماندا وتی: (گەلی ئێران بە موسوڵمان و ناموسوڵمان، بە فارس، کورد، ئازەری، بلوچ، عەرەب و تورکمانەوە بەرهەڵستیی هەموو ئەو هێز و هێرشانەیان کردووە، کە دەیانویست ڕژێمی ئیسلامیی لاواز بکەن....) ئەمە جێگەی سەرنجە، کە خاتەمی بۆ یەکەم جارە ڕاستەوخۆ ناوی گەلانی جگە لە فارس بەبات لە مینبەرێکی وەک پەرلەماندا.

**پەرلەمان و گیروگرفتەکانی**

پەرلەمان لە هەموو وڵاتە پێشکەوتووەکانی جیهاندا بەرزترین دەسەڵاتی گەل و هێزی یاسادانەرە، لەبەر ئەوە پەرلەمانی ئێران دەبێ سەرنج بداتە ئەو یاسایانەی کە لە 20 ساڵی ڕابردوودا بۆ ئێران پەسەند کراون و بەشێکیان بۆ دیموکراتیزە کردنی ئێران بگۆڕێ. یاسای بنەڕەتیی ئێران لەسەر دوو بنەمای لێک جیاواز دانراوە. یەکەمیان پشت بەستنیەتی بە یاسای حاکمیەتی ویلایەتی فەقێ و بۆ ئەمەش لە فەسڵی یەکەم، ئەسڵی پێنجەمدا دەڵێ: لە کاتی نەبوونی ئیمامی زەماندا، لە کۆماری ئیسلامی ئێراندا، ئەمرکردن و ئیمامەتی ئوممەت لە سەرشانی فەقێیە.... پێچەوانەی ئەمە لە ئەسڵەکانی 19-25ی فەسڵی سێهەمدا دەبینرێت، کە سەرنج دەداتە دەسەڵاتی گەل بە ڕێگای هەڵبژاردن و دانانی حکومەت و شوراکانەوە.

هەرچەندە هەردوو لایەنی ڕیفۆرمیست و وشکرەو لە کۆماری ئیسلامییدا، شیعەی 12 ئیمامن و باوەڕیان بە گەڕانەوەی ئیمامی زەمان و سیستمی ویلایەتی فەقێ هەیە، بەڵام خاتەمی و لایەنگرە چاکسازەکانی و هەموو کەس دەزانن کە ئێران وڵاتێکی فرە کولتور و فرە ئایین و فرە نەتەوەیە، بۆ ئەمەش دەبێ هەوڵ بدەن بەو ڕەنگانەی کە ئێران هەیەتی، یاسا بۆ دانیشتوانی دابڕێژن. بۆ ئەنجامی ئەو ئەرکە، دەبێ پەرلەمان بەپێی ئەسڵی پەنجاونۆهەمی فەسڵی پێنجەمی یاسای بنەڕەتیی، خەڵک بەشداری ڕیفراندۆمێکی گشتیی بکات تا دەرکەوێ ئاخۆ خەڵک سیستمی ویلایەتی فەقێی دەوێ یان پێیانخۆشە دین و سیاسەت لێک جیا بێت.

سیستمی ویلایەتی فەقێ و ڕادەی دەسەڵاتی لە یاسای بنەڕەتییدا و ئەو ئۆرگانانەی کە ئەو هەڵیاندەبژێرێ، لەسەر بنەمای دیکتاتۆریەت دادەمەزرێن و هەتا ئەو سیستمە بمێنێت، ئارامیی و ئاسایشی خەڵک لە ئێراندا دەستەبەر ناکرێ و هەروەک لە بیست و یەک ساڵی ڕابردوودا پێشانیان داوە، لەمپەرە لە سەر ڕێگای پێشکەوتن و گەشەکردنی خەڵک لە ئێراندا. مافی سیاسی دانیشتوان، مافی ژنان، مافی گەلانی ژێردەستە، مافی مرۆڤ و بەگشتیی مافە دیموکراتییەکان پێشێل دەکات. یاسای بنەڕەتیی ئێران دەبێ بەپێی یاسا پەسەندکراوەکانی ڕێکخراوی نەتەوەیەکگرتووەکان بنوسرێتەوە و بۆ ئەمەش دین لە سیاسەت جیا بکرێتەوە.

**ئەرکی دواڕۆژی پەرلەمان و حکومەت**

پەرلەمان و حکومەت کە دوو دەزگای یاسادانەر و بەڕێوەبەرن، ئەمڕۆ بە دەنگی گەلانی ئێران کەوتوونەتە دەست خاتەمی و لایەنگرانی. هەرچەندە ئەو دوو دەزگایە لەگەڵ گەلێک قەیران و دیاردەی دژێودا ڕووبەڕوو بوونەتەوە، بەڵام بۆ ئەوەی نوێنەران بەڵێنەکانیان بەجێ بگەیەنن و بە ڕاستیی خەڵک بەسەر چارەنوسی خۆیاندا بڕیاردەر بن، پێویستە سەرنج بدەنە باری سیاسی، ئابوری و کۆمەڵایەتی ئێران و سیاسەتی دەرەوەی ئێران لەسەر مافی بەرامبەر و ئیحترام بە حاکمیەتی گەلانی دنیا دابڕێژنەوە و هەروەها دەبێ ڕێگا بە ڕۆژنامە و بڵاوکراوەکان بدەن کە بیروڕای دەوڵەمەندی گەل بۆ پەروەردە کردنی باری فەرهەنگیی دانیشتوان بڵاو بکەنەوە و کەموکوڕییەکان دەستنیشان بکەن.

سیاسەتی کۆماری ئیسلامیی هەتا ئێستا لە بەرامبەر گەلی کوردا کە نەتەوەیەکی هەرە کۆنی ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاستە و خاوەنی زمان و کولتور و خاک و مێژووی خۆیەتی، سیاسەتێکی نادیموکراتی و چەوسێنەرانە بووە. کورد لە کوردستانی ژێردەستی ئێراندا بێبەریی بووە لە هەرچەشنە ئازادییەکی سیاسی، کولتوریی و دیموکراتی. لاوان و ڕوناکبیرانی کورد بەتاوانی داوای ڕەوای مافی نەتەوایەتی دەگیرێن و هەتا ئەمڕۆ پتر لە پەنجا هەزار کورد بەم تاوانە شەهید کراون، هەزاران کەس زیندانیی کراون و شکەنجە دراون و زیانێکی زۆریش بە ئابوری خەڵک و شار و گوندەکانی کوردستان گەیشتووە.

کۆماری ئیسلامیی بۆ بەڕێوەبردنی کوردستان لە کەسانی غەیرە کورد کەڵک وەردەگرێ و ڕوناکبیران و زانایانی کورد لە کوردستانەوە دەگوێزێتەوە هەرێمە فارس نشینەکان و لە بەشێک لەو کوردانەش کە ئامادەن بۆ بەرژەوەندی خۆیان پشت لە مافی نەتەوەکەیان بکەن، دژی بزووتنەوەی کورد کەڵک وەردەگرێ و بە بڵاوکردنەوەی سیخوڕ لە وڵاتانی ئەوروپادا گوشار دەخاتە سەر نیشتمانپەروەرانی کورد و تەنانەت لە باشوری کوردستانیشدا ئاگری شەڕی براکوژی خۆش دەکات و ناهێڵێت نەتەوەی کورد لە دەرەوەی ئێرانیشدا بە ئازادیی بژی، بەڵام لە هەر جێیەک چوار شیعە بژی بۆیان دەبێتە پرد و بە هەموو شێوەیەک یارمەتییان پێ دەگەیەنێ.

ڕادەی چاکسازیی و پۆزی دیموکراتی لێدانی پەرلەمانتاران و وەزیرانی حکومەتی ڕیفۆرمیستەکان و شەخسی خاتەمی بەوە دەردەکەوێ کە ئەوان چەند هەوڵی چارەسەرکردنی کێشەی گەلی کورد دەدەن. هەروەها 25 پەرلەمانتارە کوردەکان ئەرکێکی زۆریان لە ئەستۆیە و بۆ ئەوەی پردێک پێک بێنن بۆ چاکسازی لە کوردستاندا پێویستە لە فراکسیۆنێکی پەرلەمانییدا یەک بگرن و هەوڵی چارەسەر کردنی کێشەی کورد و باری ئابوری و کۆمەڵایەتی و کولتوریی کورد بدەن و گوشار بخەنە سەر پەرلەمان بۆ دانانی یاسای نوێ بە قازانجی گەلەکەیان و چیتر نەهێڵن هێزە چەکدارەکانی کۆماری ئیسلامیی چەکەکانیان لە کوردستاندا تاقیبکەنەوە و خوێنی خەڵکی کوردستان بڕێژن و دەبێ هەوڵ بدەن کۆماری ئیسلامی ڕێز لە مافی سیاسی، کولتوری و ئایینی خەڵکی کورد بگرێ.

ئەگەر پەلەمان و حکومەت و خاتەمی لەو ڕێگایەدا هەنگاو هەڵنەگرن، گەلانی ئێران بە کورد و نەتەوەکانی ترەوە لێیان خۆش نابن و خاتەمیش توشی چارەنوسی ڕەفسنجانی دەبێ.

www.arsivakurd.org

# هەڵبژاردنی ئێران

عەریب

هەروەک دەزانین گەلانی نیشتەجێ لە ئێران ڕۆژی 2000/2/18 بەرەو سندوقەکانی دەنگدان چوون تا لەنێوان 6083 پاڵێوراودا بۆ خولی شەشەمی پەرلەمانی ئێران 290 نوێنەر هەڵبژێرن. لە ئەنجامی هەڵبژاردندا، چونکە ڕێژەی دەنگی 66 پاڵێوراو نەگەیشتە سنووری 25%ی دیاریکراو، 66 کورسی پەرلەمان مایەوە بۆ جاری دووەمی هەڵبژاردن، کە ڕۆژی 2000/5/6 ئەنجامی گرت.

هەڵبژاردنی ئەمجارەی ئێران جیاوازییەکی بەرچاوی هەبوو لەگەڵ هەڵبژاردنەکانی پێشووی کۆماری ئیسلامیدا. خەڵکی ئێران بە کەڵک وەرگرتن لە بزوتنەوەی چاکسازیی کە بەرهەمی سیاسی و فکری ساڵانی ڕابردوویانە و هەر لە سەرەتای دامەزراندنی کۆماری ئیسلامیەوە بە ڕابەرایەتی ئایەتوڵڵا خومەینی، دژی دیکتاتۆریەتی ئایینی بەڕێوەی دەبەن و دەیان هەزار قوربانییان بۆ داوە ، ڕژانە سەر سندوقەکانی دەنگدان تا کەسانێک بە نوێنەرایەتی خۆیان هەڵبژێرن کە ئامادەن بە قازانجی سەرجەم دانیشتوانی ئێران یاسا دانێن.

چاکسازە ڕێفۆرمیستەکان کە بە لایەنگرانی دووی خورداد (2ی جۆزەردان ڕۆژی هەڵبژاردنی خاتەمی بە سەرۆکایەتی کۆماری ئیسلامی) دەناسرێن لە کۆی 290 کورسی پەرلەمان ، هەتا ئامادەبوونی ئەم وتارە، پتر لە 170 کورسییان بەدەست هێناوە و وشکڕەوەکان کە ماوەی 20 ساڵە پەرلەمانیان وەک بەرزترین دەزگای یاسادانەری ئێران بەدەست بوو، تەنیا 40-45 کورسییان بۆ مایەوە.

تاران کە بەپێی ژمارەی دانیشتوانی 30 کورسی پەرلەمانی بەردەکەوێت ، 29 کورسی کەوتە دەست ڕیفۆرمیستەکان و تەنیا دوا کورسی کەوتە دەست هاشمی ڕەفسنجانی ، کە بە فێڵ خۆی خزاندووەتە بەرەی هاوبەشی چاکسازانەوە و دەرکەوت بۆ ئاژاوەگێریی و کاری تێکدەرانە بەقازانجی وشکڕەوەکان بەشداریی ئەو بەرەیەی کردبوو.

سەرکەوتنی ڕیفۆرمیستەکان لە هەڵبژاردندا، وشکڕەوەکانی هەژاند و کارێکی وای کرد کە هەموویان هەوڵی تێکدانی ئەو بارودۆخە نوێیە بدەن ، هەر بۆ ئەم مەبەستەش ، شورای نگهبان (کۆمیتەی چاودێریکردنی بەرژەوەندی ڕژێم) پرۆسێسی هەڵبژاردنی چەند شارێکی هەڵوەشاندەوە و دەنگی 527 سندوقی تارانیشی قبوڵ نەکرد ، کە پتر بوو لە 700 هەزار دەنگ و بەمجۆرە هاشمی ڕەفسنجانی لە ژمارەی سییەمەوە بەرزکردەوە بۆ بیستەم و (دوکتۆر غولامعەلی حەداد عادل) بابی زاوای خامنەیی ڕابەری دینیی ئێرانی بەشێوەیەکی نادیار خزاندە ڕیزی بیست و هەشتەمەوە و لە جێگەی (ڕەجایی) نوێنەری هەڵبژێراوی گروپێکی چاکسازانی دانا و چەند کورسیشیان هێشتەوە، کە لە پشتی پەردەوە سازشی لەسەر بکەن. کردەوەکانی شورای نگهبانی دژ بە یاسا، ڕەخنەیەکی زۆری دروستکرد ، بۆیە ڕەفسنجانی نەیتوانی لە بەرامبەر ڕەخنە و گوشاری دەنگدەران و ئۆپۆزیسیۆنی ناوخۆ و دەرەوەی ئێراندا بەرگەبگرێت و ڕۆژی 2000/5/26 ناچاربوو واز لە نوێنەرایەتی خۆی بهێنێ.

شورای نگهبان دوای تێپەڕبوونی 86 ڕۆژ بەسەر هەڵبژاردندا، ئاکامی هەڵبژاردنەکانی ڕاگەیاند. لەو ماوەیەدا، وشکڕەوەکان 17 ڕۆژنامەی سەربە ڕێفۆرمیستەکانیان قەدەغە کرد، ڕۆژنامەنوس ، سیاسەتمەدار و ڕوناکبیرێکی زۆریان گرت ، لە کردەوەیەکی تێرۆریستانەدا(سەعیدی حەجاریان)ی ڕاوێژکاری خاتەمیان بەتوندیی بریندار کرد ، سوپای پاسداران لە بەیاننامەیەکدا بەتوندیی هەڕەشەی سەرکوتکردنی گشتیی خەڵکی کرد و دەنگۆی کودێتای سەربازیی بڵاوبووەوە ، بەڵام سەرئەنجام نەیانتوانی لە بەرامبەر هێزی گەلدا خۆڕاگرن و بە ڕاگەیاندنی ئاکامی هەڵبژاردن لە لایەن شورای نگهبانەوە ، ڕۆژی 2000/5/24 ، عەلی ئەکبەری ناتقی نوری سەرۆکی پەرلەمانی (پێنجەمی) ، وشکەڕەوەکان کارنامەی چوارساڵەی پەرلەمانی دایە دەست پەرلەمانی نوێ و کۆتایی بەکاری خۆی و پەرلەمانی پێشوو هێنا.

ڕۆژی 2000/5/28 دەرگای پەرلەمان کرایەوە بۆ پەرلەمانتارەکانی خولی شەشەم . 40 - 45 پەرلەمنتاری وشکڕەو لە بەرامبەر 170 ڕیفۆرمیستدا خۆیان بینیەوە. ڕۆژی 2000/5/30 پەرلەمان محەمەدی کەروبی ئەندامی (مجمع ڕوحانیەتی مبارز)ی کە پێشتر بەشداریی دوو خولی پەرلەمانی کردبوو، بە سەرۆکایەتی پەرلەمان هەڵبژارد و بێهزادی نەبەوی و محەمەد ڕەزا خاتەمی کرد بە جێگری یەکەم و دووهەمیی پەرلەمان هەڵبژارد.

لە نێوان ئەندامانی پەرلەماندا 92 کەسیان بڕوانامەی دانشگایان هەیە. 65 کەسیان بڕوانامەی باڵا و 63 کەس دوکتۆرا و ئەوانی تریش بڕوانامەی ئامادەیی وەیان خوێندنی دینییان هەیە.

11 ژن بۆ پەرلەمان هەڵبژێراون و تەمەنی 88%ی پەرلەمانتاران لە ژێر 50 ساڵ دایە. 25 پەرلەمانتار کوردن و نوێنەرایەتی خەڵکی 15 شار و شارۆچکە و گوندەکانی کوردستان دەکەن.

بۆ یەکەمجار خاتەمی لە وتاری





www.arsivakurd.org

# کێ بەرپرسی ئاوارەکردنی لاوانی باشوری کوردستانە؟

**حامید گەوهەری**

نەتەوەی کورد لە یەکەم دابەشکردنی کوردستاندا بە دەست دەوڵەتی ئێران و عوسمانییەکانەوە لە 1514 وە هەتا ئێستا هەمیشە لە کۆچکردن ، ڕاگواستن و ئاوارە بووندا بووە و نەیتوانیوە تاوێک لە خاکی باووباپیرانیدا بە ویستی خۆی بژی و شوێنی ژیان بۆ خۆی هەڵبژێرێ. کوردستانی لێ پچڕپچڕ کراوە ، هێڵی سوری هاتووچۆی بۆ دانراوە ، لەلایەن دەوڵەتەکانی ئێران ، عێراق ، سوریا و تورکیاوە ماڵ و گوند و شاری لێ وێران کراوە و بە زۆرەملێ لە کوردستان ڕاگوێزراوە و تەنانەت بۆ ئەفریقاش دوورخراوەتەوە و لە ناوەندی بەناو سۆشیالیزمی جیهانییدا لە یەکێتیی سۆڤیەتی کۆندا لێکیان دابڕیوە و ژیانی ئاسودەیی نەدیوە.

گەلی کورد بۆ کۆتایی هێنان بەو چارەڕەشییە و بۆ ئازادکردنی خۆی و یەکخستنەوەی خاکەکەی ، سەدان هەزار قوربانیی داوە و دەیان ڕێکخراوی جەماوەریی بۆ ئەو مەبەستە دامەزراندووە و دوژمنی داگیرکەریش دەستی لێ نەپاراستووە و چەندان سەرکردەی مەزنی لێ شەهید کردووە.

هەروەک دەزانین لە ئاکامی کۆڕەوە میلیۆنییەکەی گەلی کوردماندا لە باشوری کوردستان ، کە دوای شەڕی کەنداو ، لە کەش و هەوایەکی سارد و بەفرینی ساڵی 1991دا دژی سەددام و ڕژێمی بەعس ئەنجامی گرت و کۆمەڵگای مرۆڤایەتی هەژاند ، دەوڵەتە زلهێزەکانی جیهان و ڕێکخراوی نەتەوەیەکگرتووەکان ناچار بوون بۆ پارێزگاریی کردن لە مافی مرۆڤی کورد بڕیاری 688 پەسەند بکەن.

دوای پەسەند کردنی بڕیاری 688ی ڕێکخراوی نەتەوەیەکگرتووەکان ، فینکاییەک بە دڵی ئێمەی کوردە ئاوارەکانی هەندەراندا هات وتمان : ( خوایە سوپاس، کۆتایی هات بە ئاوارەبوونی گەلەکەمان لە باشوری کوردستان) ، بەڵام بەداخەوە نەک ئەو ئاواتە نەهاتەدی ، بگرە ڕێژەی پەنابەر و ئاوارەی کوردی باشوری کوردستان دوو ئەوەندە و بگرە چەند ئەوەندە زیاتر بوو.

ڕژێمی عێراق لێپرسراوی سەرەکیی ئاوارە کردنی نەتەوەی ئێمەیە لە باشوری کوردستاندا. بۆ یەکالا کردنەوەی دەوڵەتەکەی لەگەڵ نەتەوەی کورددا ، دەستی داوەتە پاکتاوکردنی ناوچە کوردییەکانی ژێردەسەڵاتی خۆی و بۆ بە عەرەبکردنی ئەو ناوچانە ، خێزانە کوردەکان لە کەرکوک ، خانەقین ، سنجار، مەخمور، شێخان و... هتد دەردەکات. کردەوەی سەدام و ڕژێمەکەی مێژوویەکی ڕەش و سامناکی هەیە و بۆ هەموو کەس ڕوونە کە سەدام حوسێن بۆ مانەوەی خۆی و ڕاگرتنی دەسەڵاتی لە ئەنجامی هیچ تاوانێک سڵ ناکات و ئەگەر بۆی بلوێ ڕەگەزی کورد لە سەر زەوی ناهێڵێ . لەبەر ئەوە ئێمەی کورد نابێ ئەنفالەکان ، بۆمببارانی هەڵەبجە و بالیسان و بادینان و ... هتد و بێسەر و شوێن کردنی 8000 بارزانیی ئۆردوگای زۆرەملێی قوشتەپە لەبیر بکەین و دەبێ بە یەکیەتیی خۆمان کۆتایی بە دەسەڵاتی ڕژێمی بەعس بێنین لە کوردستاندا و بۆ ئەمەش ڕێکخراوە سیاسییەکانی باشور لە ڕیزی یەکەمدا بەرپرسایەتی مەزنیان لە ئەستۆیە.

لایەنێکی تری ئاوارەکردنی لاوانی کورد، بۆ خۆمانین و ئێمەین کە ڕێگای کۆچکردنی هاوڵاتییانمان لە کوردستانەوە خۆش دەکەین . لەم بوارەشدا بەرپرسایەتیی سەرەکی دەکەوێتە سەر شانی ڕێکخراوە سیاسییەکانی باشوری کوردستان و لە سەرووی هەمووانیشدا یەکێتیی نیشتمانیی کوردستان و پارتی دیموکراتی کوردستان بەرپرسن ، کە دوای تێپەڕبوونی هەشت ساڵ بەسەر یەکەم هەڵبژاردنی ئازاد و دیموکراتی لە کوردستاندا ، هەتا ئێستا ئامادە نەبوون ڕێز لە دەنگی گەل بگرن و بەکردەوە لەسەر بنەمای ڕێککەوتنی واشنتۆن ئیدارەیەکی هاوبەش پێک بێنن.

سەرنجدان بە بەرژەوەندی تەسکی حزبایەتی ، نەتەوەی ئێمەی لە نێوان شەڕ و ئاشتیدا ڕاگرتووە و خەڵکی لە کار و تێکۆشانی ڕۆژانە سارد کردووەتەوە و ئەمەش هەلی بۆ ژمارەیەک چەرچی و قاچاخچی ڕەخساندووە ، کە گاڵتە بە گیانی لاوانی وڵاتەکەمان بکەن. کەی ڕەوایە گەلی ئێمە لەژێر سێبەری ئاڵای حکومەتی خۆیدا ئاوارە بێ و نەتوانێ بەهۆی لایەنگیری کردنی لە ڕێکخراوێک ، لە ماڵی خۆیدا بژی و سلێمانی بۆ هەولێر و لە هەولێر بۆ سلێمانی ئاوارە بێ؟!

لایەنی سێهەمی کۆچپێکردنی کورد لە باشوری کوردستان ، پارتی کرێکارانی کوردستانە کە ڕێگا لە ئاوەدان کردنەوەی بەشێک لەو گوندانە دەگرێ ، کە لەسەر سنوری ئێران و تورکیا هەڵکەوتوون و ئەو ناوچەیەی کردووەتە گۆڕەپانی مەشقی چەکدارەکانی. PKK کە لە بەرامبەر دەوڵەتی تورکیادا چەکەکانی شۆڕ کردووەتەوە و یەکلایەنە ئاڵای ئاشتی بەرزکردووەتەوە و دوعا بۆ پایەداریی دەوڵەتی دیکتاتۆری تورکیا دەکات ، ڕەشەکوژیی گەلی ئێمەی لە باشوردا کردووەتە ئەرکی ڕۆژانە و بەناحەق بووەتە لایەنێکی چالاکی ئاوارەکردنی گەلی کوردمان لە باشوری کوردستاندا.

لایەنی چوارەمی ئاوارەکردنی کوردی باشور، ژمارەیەک بنەماڵەن کە لە باشورەوە هاتوون و لە ئەوروپا نیشتەجێ بوون . بۆ ئەوەی خزم و کەسیان لەو بارودۆخە ڕزگار بکەن ، هەوڵی ڕاکێشانی کەسانی خۆیان دەدەن بۆ هەندەران و ئەمەش کارێکی وای کردووەتە سەر لاوانی باشور کە بە هیوای ژیانێکی خۆش لە ئەوروپا کوردستان بەجێبهێڵن و لە نیشتمان و کەسوکاریان دابڕێن. بۆ ئەمەش کە وڵاتانی ئەوروپی وەک پەنابەر وەریانگرن هەزاران تاوانی ناڕەوا بۆ دەسەڵاتدارانی کورد و پەرلەمان و حکومەتەکەیان هەڵبەستن.

بەداخەوە لە دوو سێ ساڵی ڕابردوودا، زۆر نەبوون لەو لاوانەی کە دەبوایە سود وەربگیرێت لە توانا و وزەیان بۆ ئاوەدان کردنەوەی کوردستان و گەشەپێدانی ئابوری وڵات ، لە ڕێگای ئاوەرایی و ڕاکردن بۆ ئەوروپا گیانیان لە دەست داوە و بوونەتە خۆراکی ماسییەکانی دەریاکانی نێوان تورکیا و ئەوروپا و بەشێکی زیاتریشیان بە دەست قاچاخچییەکان و فاشیستەکانی تورکەوە توشی چەرمەسەریی بوون و بە ناچاریی خۆیان گەیاندووەتەوە کوردستان.

بۆ ئەوەی پێشبگیرێت لە کۆچی لاوان لە باشوری کوردستانەوە بۆ ئەوروپا، کە زۆربەیان بە پروپاگەندەی ناڕاست فریو دەدرێن ، پێویستە پارتی دیموکراتی کوردستان و یەکێتیی نیشتمانیی کوردستان بەکردەوە نەک بە دروشمدان ، هەنگاو بنێن بۆ سەقامگیرکردنی خاڵەکانی ڕێککەوتنی واشنتۆن. پێکهاتنی یەکێتیی و پارتی لەسەر بنچینەیەکی دیموکراتیی و ڕێزگرتنیان لە دەنگی گشتیی خەڵک و ملدانیان بە یاسا ، زۆر بە جیدیی ڕێگا دەگرێت لە پروپاگەندەی درۆی نەیاران لەسەر باشوری کوردستان و ڕێگایەکیش دەکاتەوە بۆ گەڕانەوەی کوردە ئاوارەکانی هەندەران بۆ باشور.


www.arsivakurdi.org

# پەرلەمان و مێژوو

نەوزاد وەلی

پەرلەمان گەورەترین دەسەڵاتە لەو وڵاتانەدا کە بە سیستەمی پەرلەمانیی بەڕێوەئەبرێن. نە کەس و نە هیچ یاسایەک لە سەرووی پەرلەمانەوە نیە ، تەنیا ئەو یاسایانە نەبێت کە پەرلەمان خۆی دایناوە بۆ ئەو مەبەستە. پەرلەمان کۆمیتەی تایبەتیی خۆی هەیە بۆ چاودێریی و پشکنینی کارە گرنگەکان و ئابوری و سیاسەتی دەرەوە و سوپا و بەرگریی و یاسا و ئاسایش و ...هتد. هەرچ کێشەیەک و گۆڕانکارییەکی گەورە لە بوارە هەمەجۆرەکاندا کە لە پەرلەماندا بە شێوەیەکی ئاسایی تێنەپەڕێت ، ئەوا بەدەنگدانی جەماوەریی چارەسەر ئەکرێت.

ئێمەی کوردیش ، قەدەر وایکردووە کە نیشتمانەکەمان لە ناوچەیەکدا هەڵبکەوێت کە بۆ دەرمانیش پەرلەمانێکی تیادا نەبووە و نیە کە لە سێبەری پەرلەمانان بچێت. پاشا و بنەماڵەکەی ، سەرۆکی حزب و بنەماڵەکەی ، ڕابەری جوڵانەوە یان شۆڕش ، کۆمیتەی بەڕێوەبەرایەتیی شۆڕش ، سەرۆک یان سەرکردایەتیی نەتەوەیی و هەرێم یان سەرۆکی بنەماڵەیەکی گەورە و .. هتد ، لە سەرووی دەسەڵاتە جیاوازەکانەوەن و هیچ کۆمیتەیەکی یاسایی و دەسەڵات نەبووە و نیە کە چاودێرییان بکات و کار و مافەکانیان دەستنیشان بکات.

لەگەڵ هەموو ئەمانەشدا و بێ تاقیکردنەوەی لەوەوبەر، هەشت ساڵ لەمەوبەر لە ١٩ ی ئایاری ساڵی ١٩٩٢ دا (بەرەی کوردستانیی) لە باشوور، بریاری دروستکردنی پەرلەمانی دا... خەوێک بوو هاتەدی، لە ناوچەیەکی پڕ لە ناکۆکیی و هەڵوێستە سیاسی و ئایدیۆلۆجی و کۆمەلایەتی و ئابورییە جیاواز و دژبەیەکەکاندا ، لەگەڵ بێ تاقیکردنەوەیی و نزمیی ئاستی ڕۆشنبیریی و زانیاریی لەو ڕووەوە و ڕێژەیەکی بەرزی نەخوێندەواریی و کارەساتە نەتەوایەتی و نیشتمانییە هەمەجۆرەکان و نەبوونی سەرچاوەی ڕاستەوخۆی ئابوری و چەوساندنەوەی ساڵەهاساڵەی گەلەکەمان لەلایەن داگیرکەرانی کوردستانەوە و شێواندنی بنەماکانی پێشکەوتنی و .. هتد ، لەگەڵ هەموو ئەمانەشدا ئەو خەوە هاتەدی و بەبێ کەمترین کێشە و بە شێوەیەکی شارستانییانە ، پەرلەمانی باشوری کوردستان لەلایەن جەماوەرەوە هەڵبژێررا.

بەلام بەداخەوە هەر لەدوای ڕاگەیاندنی ئەنجامی دەنگدانەکانەوە، کار بە جەماوەر نەما و کێشەی سیاسی و حزبایەتی زاڵ بوو بە سەر دەنگی جەماوەر و خواست و ئاواتەکەیدا.

ئەنجامەکانی ئەو ڕێزنەگرتنەی دەنگ و خواستی جەماوەر ، کارەساتێکی دروستکرد کە باسکردنی زیاتر لە کولانەوەی برینەکان ئەچێت وەک لە دەرس لێوەرگرتن. بەهەرحاڵ .. بۆ ئەوەی جەستەی ئەم گەلە کلۆلە زیاتر زامدار نەبێت و خوێنی لێنەچۆڕێت ، با دەرسێک لە مێژوو وەربگرین !!!

ئەگێرنەوە کە لە سەردەمی هارون ڕەشیددا سێ جولەکەی زۆر دەوڵەمەند و دەسەڵاتدار هەبوو ، هارون گەری لێ ئالاندبوون ، بانگی کردن و وتی یان یەکی سێ هۆقە پیاز ئەخۆن یان یەکی سەد جەلدە ، وەیان یەکی هەزار لیرە ئەدەن بە خەزێنەی دەوڵەت.

جولەکەکان وتیان پیاز بێن ، یەکی چەند پیازێکیان خوارد و فرمێسک بە چاویاندا ڕیزی بەست ، وتیان جەلدە لێدەن ، هێشتا ناوشانیان نەرم نەبووبوو وتیان بەسە ، ئامان ، ئەوە لیرە و ببڕێتەوە.

ئەی دوو لایەنە دەسەڵاتدارەکەی باشوری کوردستان ، خۆتان و گەلەکەتان و دۆستانی گەلەکەشتان خستە گریان ، جەلدەی شەڕەکانتان ناوشانی هەموو ڕۆڵەیەکی ئەم گەلە ستەمدیدەیەی کوتیوە ، دە ئەو چەند لیرەیەش بەشبکەن و با ببڕێتەوە .. حکومەتێک هەبوو ، بوو بە دوو ، پەرلەمانێکیش هەیە با نەبێت بە دوو، کورد .. کوردە ، دور نیە ئەوەش بکات!

هاوار دڵسۆزینە با نەبین بە گاڵتەجاڕیی دنیا و قیامەت ، هیمەتێک ، بەزەییەک ، (خێرێک) بکەن بەم گەلە کلۆڵەتان و تۆزقاڵێک لە سۆز و (گەورەیی) و (پایەبەرزیی)تانی پێ (ببەخشن) ، کارەساتە خوێناوییەکان دروست مەکەنەوە.

www.arsivakurd.org

سەر باری ئابووری و ژیانی رۆژانە و بژێوی کۆمەڵانی فراوانی خەڵکی کوردستان و لیژنەی باڵای تنسیقی نێوان (پارتی و یەکێتی) پەنجا و ئەوەندەهەمین دانیشتنی چالاکانەی کردووە، ماوەیەک بوو لە نێوان خودی رێزداران کاک مەسعود بارزانی و مام جەلال تاڵەبانی دا نامە و بروسکە گۆڕینەوە و بەناوەرۆکێکی گەرمترکردنی هیوادانیان بە باری هاوکارییان لە بارودۆخی ئارامی و بەجێهێنانی رێکەوتننامەی واشنتۆن لە نێوانیان، لە نێو زاری خەڵکدا گەرم باس دەکرا.

بەجێهێنانی رێکەوتننامەی ئەیلوی ١٩٩٨ بووەتە وێردی زمانی رۆژانەی گشت راگەیاندنەکانی حیزب و رێکخراوەکان بە دەزگا رەسمییەکانیشەوە، بەلام رەخنەی زۆر زەقی میللەت ئەوەیە: زۆر دەوترێ، کەچی گرنگ کردنیەتی بەکردەوە.

خۆشبەختانە وەک ئومێدێکی نوێ، هەوڵی بەرپرسیارانەی پێنج حیزب پێکەوە (یەکگرتووی ئیسلامی، شیوعی کوردستانی، بزووتنەوەی ئاشوری، پارتی کار و بزووتنەوەی میللی) بەگیانی بەرپرسیارانەوە و پاش گفتوگۆ کردنیان ئەم دەقە پرۆژە هاوبەشەی تێکۆشانی خۆیان سازدا و رایانگەیاند کە چیتر رێکەوتننامەی واشنتۆن پشتگوێ نەخرێ و چارێکی خێرای گیروگرفتی ئاوارەکان بکرێ بەرەو بەدیهێنانی:

– پێکهێنانی حکومەتێکی ئیتلافی کە هەردوو ئیدارەکەی کوردستان یەکبخات.

– یەکخستنەوەی گشت رێکخراوەکانی قوتابیان، جوتیاران، مامۆستایان، نەقابەکان، لاوان و ئافرەتان و... هتد.

– نەهێشتنی گشت ئاسەوارەکانی سالانی شەڕی ناوخۆ.

– قوولکردنەوەی دیموکراسی، ژیانی ئاسایی، پشت بەستن بە جەماوە و چارە کردنی گیروگرفتەکانیان.

ئەم پرۆژە هاوبەشە رەوایە بە دیدو بۆچوونی دڵسۆزانی پێکهێنەرەوەی یەکیەتی هێزەکانی گەل و یەکخستنەوەی کوردستان و چەسپاندنی فیدرالیزم بۆ گەلی کوردستان و زامنکردنی نەگەڕانەوەی رژێمی بەغدایە و لەگەڵ خواست و ویستی گشت جەماوەری گەلدا ساز و تەبایە و رێگاخۆشکەر دەبێ بۆ ئەو هەڵبژاردنەی پەرلەمانی کوردستان کە چەند ساڵە باسی لەسەر دەکرێ. دیارە هەموو ئاگادارن کە جێبەجێکردنی ئەم خالانە پێویستی بە هاوکاریی و پشتیوانیکردنی هەمووان هەیە لە ناوەوە و دەرەوەی کوردستاندا.

رۆژی ٢٠٠٠/٤/١، شاندی سەرکردایەتی پێنج حیزبەکە سەردان و دانیشتنێکی تێر و پڕگفتوگۆیان لەگەڵ رێزداران کاک مەسعود بارزانی و هەڤاڵ جەوهەر نامیق لە بارەگای خۆی لە سەری رەش کرد و پاش ئالوگۆری بۆچوونەکان و داوای پشتیوانیکردن و هەنگاونان بۆ بەدەستهێنانی سەرکەوتن، داوای روونکردنەوەی ناوەرۆک و سنووری ئاسایی ئەو (تطبیع) کردنەوە و هەنگاوەکانی بەرەو هەڵبژاردنی پەرلەمانیان کرد و گوێی لێگرت، لەگەڵ پێخۆشحالی بەرێز کاک مەسعود بارزانی بۆ هەوڵدانەکان و پشتوانیکردنی خۆی بۆیان و سوور بوونی (پارتی) لە بەجێهێنانی رێکەوتننامەکەی واشنتۆن و... هتد. پاشان شاندی بەرپرسانی پێنج حیزبەکە لە ٢٠٠٠/٤/٨دا لە سلێمانی چاویان بە رێزدار مام جەلال و شاندی م.س و سەرکردایەتی (یەکێتی) لە بارەگای خۆی لە سلێمانیدا کەوت و پاش گفتوگۆیەکی دەوڵەمەند لە سەر بارودۆخەکە و پێویستی راگەیاندنی هەنگاوی هاوبەشی (ینگ و پدک) پێکەوە بۆ بەجێهێنانی رێکەوتننامەکەی واشنتۆن و جۆرێک جۆشدانەوەی بارودۆخەکە بە یەکخستنەوەی یەکیەتی ریزی هێزە سیاسییەکانی گەل بە رووی نەخشە و پلانی دوژمناندا. شایانی باسە رێزدار مام جەلال هەندێک لایەنی ئامادەیی خۆیانی بۆ شاندەکە راگەیاندبوو تا لە هەوڵەکانیاندا لایان روون بێ. شاندەکەش داواکاری راگەیاندنی هانگاوی هاوبەشی (یەکێتی و پارتی) بوون لە بەجێهێنانی هەندێک لە خالەکانی رێکەوتننامەدا بۆ گەلی کوردستان و پێکهێنانی دانیشتنی هاوبەشی شاندی بەرپرسانی هەردوو حیزب پێکەوەیان و بە بەشداریکردنی حیزبەکان و گفتوگۆی سەرکردەی هەردوو حیزب پێکەوە تا رەنگدانەوەی شیاوی لێی رابگەیەندرێت.

ئەرکی چەسپاندن و پارێزگاریکردنی ئاشتی و دیموکراتی لە کوردستاندا، پێکەوە چ حیزبە سیاسییەکان و کۆمیتەی هاوخەباتەکانیان و جەماوەری خاوەن هەڵوێستی هەندەرانیش، لە فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوید و کۆمەڵە جۆربەجۆرەکان و لە هەر بواریکداین: وا زەنگی هاوکاریکردن بانگی هەمووان دەکات بۆ پشتیوانی لە سەرخستنی رێکەوتننامەکە و کاروانی ئاشتی و دیموکراتی بۆ یەکخستنەوەی کوردستان. بە پێزگرتنی هەموومانەوە لە دەستکەوتەکان و کارە باشە کراوەکان و... هتد. با بەهەمووانەوە رێگا بە گەڕانەوە بۆ رۆژانی ئالۆز و شەڕی ناوخۆ نەدرێت، کە شانازی هەردوو حیزبەکە و هەموو گەلەکەمان لە گۆڕ کردن و نەگەڕانەوەیدایە.

مخابن نوسراوەکەم دوواخرا بۆ ئەم ژمارەیە و مەترسی لە رێگای ئاشتیدا زەقتربووتەوە، باوەڕیشمان هێشتا بەهێزە بە گەل و دڵسۆزان و بەرپرسیارانی خاوەن دەسەلاتی بڕیارەکانی هەر دوولایەن و رێگای سەرکەوتنمان هەر ئاشتی و یەکیەتی یە و پێکەوە بوونە بەرامبەر دوژمنانی سەرەکی گەل و نیشتمان.

www.arshivakurd.org

٨- دەبێ زانکۆکان چاوێک بەو کرێیەدا بخشێننەوە کە بۆ ئەو مامۆستایانە تەرخان کراوە کە لەنێوان زانکۆکاندا وانە دەڵێنەوە یان لە دەرەوەی کوردستان بۆی دێن ئەمەش خوێندنی بەرایی Under graduate و فێر کردنی باڵا Post graduate دەگرێتەوە.

٩- ئاڕاستە کردنی بانگەوازێکی هاوبەش بۆ پسپۆڕە تایبەتمەندە زانکۆییەکانی دەرەوەی کوردستان لە گشت بوارەکانی تایبەتمەندێتیی بۆ گەڕانەوە بۆ زانکۆکانی کوردستان بۆ بینینی ڕۆڵی مێژوویی لە بەرزکردنەوەی ئاستی زانستی زانکۆیی.

١٠- ڕێککەوتن لەسەر ئەوە کە دەبێ بەشداریی لە کۆبوونەوەکانی (وەرگرتنی مەڵبەندی- قبول مركزى) لەسەر ئاستی یاریدەدەری سەرۆکی زانکۆ و تۆمارکاری بێت لە هەر سێ زانکۆکەدا.

١١- پێویستە بە پێی توانا هەر سێ زانکۆکە تەنسیق بکەن بۆ ئامادە بوونی کۆنگرە و کۆڕ و سمینارە زانستی و مرۆییەکان کە لە دەرەوەی هەرێم دەبەسترێن بە شاندێکی هاوبەش. ئەویش بۆ پەیداکردنی کۆمەک و یارمەتی و پشتگیریی بۆ زانکۆکان و خوێندنی باڵا لە کوردستاندا.

یەک شەممە 2000/4/30
هەولێر

پ.د. سەعدی بەرزنجی
سەرۆکی زانکۆی سەلاحەدین

د. کەمال خۆشناو
سەرۆکی زانکۆی سلێمانی

م. عیسمەت محەمەد خالید
سەرۆکی زانکۆی دهۆک

# هەوڵێکی پیرۆزی ئاشتی بۆ کوردستان

**باوکی تارا- ئیبراهیم سۆفی**

پارێزگایکردن لە دەستکەوتەکانی ڕاپەڕینە شکۆدارەکەی گەلی باشووری کوردستان لە ئەستۆی هەمووماندایە. لە گەڵ کەموکورتی و ناتەواویەکانی چەسپاندن و پەرەپێدانی ئەو دەستکەوتانە و لە دەستچوونی کات و هەلی مێژوویی گرنگی ساڵانی ڕابردوومان، مرۆڤ دەبێ بەرپرسیارانە بڵێت: هێشتا بوار و توانای زۆر لەپێشدەم کۆمەڵگای کوردستان و حیزبەکاندایە و بە پلەی یەکەم لە ئەستۆی هەردوو حیزبە دەسەڵاتدارەکە دایە. ماوە بۆ پتر قووڵکردنەوە و پەرەپێدانی ئەوەی هەیە، لە سەرچاوەیشیاندا ڕێگا برین لە گەڕانەوەی دەسەڵاتی ڕژێمی دیکتاتۆڕی بەغدایە بۆ سەر کوردستان.

پێش چەند هەفتەیەک بوو کە بە پارێزگاکانی نیشتمانی ئازاد و خۆشەویستدا گەڕام و لە نزیکەوە ڕووداوەکان و بیروبۆچوونی بەرپرسانەی لایەنە سیاسیە ڕەسەنەکانی ناو گۆڕەپانەکە و گەلێک لایەنی گەش و گۆڕانکاریی جۆراوجۆرم دی و بیست. لە بوارە جیاجیاکاندا، باش و دڵخۆشی هێنەرن، بەڵام لایەنی سلبیی و ئیجابیەکانی تری بارودۆخە گشتیەکە لەبیر ناکرێ، کە هەمووی پەیوەستن بە خێراکردن لە یەکخستنەوەی هێز و تواناکانی گەل و یەکخستنەوەی دوو ناوچە و ئیدارەکەی کوردستان و هەڵبژاردنێکی نوێی پەرلەمان بە ڕێگای پێکهێنانی حکومەتێکی ئیتلافی بۆ گشت کوردستانی عێراق.

نائارامی و ترس و بێزاریی جەماوەری گەل و دەسەڵاتدارانی حکومەتی هەرێم لە ڕووداوی تەقینەوەکان و تیرۆرکردنەکان لە هەولێری پایتەخت و ناوچەی سلێمانیدا، بەڵام دڵخۆشیی خەڵک پەیدا بوو بەو ئیجرائاتەی لەلایەن بەرپرسیارانی حکومەتی هەرێمەوە بە زۆری لە هەولێر و هەندێک لە سلێمانیدا کردیان، خەڵکی داواکاری چارەسەرکردنی بنەڕەتی ئەو دیاردانەن. هەروەها جموجۆڵی سوپای عێراق و هێزە عەشایرە عەرەبە چەکدارکراوەکانی ڕژێم هەبوو لە سەر سنوورەکانی کوردستانی ئازادکراو، هەڕەشەی جۆراوجۆری ڕژێم و دەزگاکانی دژ بە کوردستان، ئەوانە جگە لە دەستێوەردانی ڕژێمەکانی دەوروبەر لە کاروباری ناوخۆی کوردستاندا، بە هەموویانەوە و بۆ گۆڕ کردنیان، خێراکردنی پێدەوێ لە یەکخستنەوەی هێزەکانی گەل و پارێزگاریی دەسکەوتەکانی ڕاپەڕین و گەشەی پێ بدرێت بەرەوو دابینکردنی داخوازییە پەلەکانی جەماوەری گەل. لایەنی گەشی بەجێهێنانی بریاری ٩٨٦ لە شار و دێهاکانی کوردستاندا، ڕەنگدانەوەی دیارە. بەتایبەت لە

www.arsivakurdi.org

# بانگەوازێک بۆ:
# بەڕێزان مامۆستایانی زانکۆ و خاوەن بڕوانامەی باڵای(دکتۆرا و ماجیستێر) لە بوارە زانستییە جیاجیاکاندا،
# لەو کوردانەی لە هەندەران دەژین.

بەڕێزان: شاراوە نییە لاتان کە سەرەڕای دوو ئابڵوقەی سەر کوردستان و ئەو باروودۆخەی دوای ڕاپەڕین بە کشانەوەی مامۆستا غەیرە کوردەکان لە زانکۆی سەلاحەدین پەیدابوو ، بەهەوڵ و کۆششی نەپساوی مامۆستا دڵسۆزەکانی کوردستان ئەمــڕۆ(3) زانکۆ لە خزمەت کۆمەڵگای کوردستانی ئازاددا کار دەکەن ، ئەمڕۆ زانکۆکانی سەلاحەدین و سلێمانی و دهۆک پێکەوە بە هەماهەنگی و هاوکاری ، نەوەی گەلەکەمان بۆ پاشەڕۆژێکی ڕوناکتر بەچەکی زانست ئامادە و پەروەردە دەکەن.

خوشکان ، برایان:

هەرچییەک بێت باروودۆخ و هۆی کۆچی ئێوە بەرەو هەندەران ، بەڕای ئێمە کاتی ئەوە هاتووە ئاوڕێک لە زانکۆکانمان بدەنەوە و بیرێکیش لە ئایندەی خۆتان بکەنەوە.

بەڕێزان:

ئێمە لە کۆبوونەوەی هاوبەشی سەرۆک زانکۆکانی (سەلاحەدین و سلێمانی و دهۆک)ەوە ئەم بانگەوازەتان ئاڕاستە دەکەین و بە هیوای ئەوەین کۆچی گەڕانەوە بەرەو کوردستان دەست پێبکەن تا لە شەرەفی ئەم ئەرکە پیرۆزەی زانکۆکانمان بەشداریی بکەن ، ئێمە لە کوردپەروەریی و دڵسۆزیی بەڕێزتان دڵنیاین ، بۆیە هیوادارین کە هەڵوێستی ئیجابیتان بەرامبەر ئەم بانگەوازە دەبێ ، هەر خۆشبن.

هەولێر لە 2000/4/30

| | | |
|---|---|---|
| پ.د. سەعدی بەرزنجی | د. کەمال خۆشناو | م. عیسمەت محەمەد خالید |
| سەرۆکی زانکۆی سەلاحەدین | سەرۆکی زانکۆی سلێمانی | سەرۆکی زانکۆی دهۆک |

کۆنوسی کۆبوونەوەی هاوبەشی سەرۆکی زانکۆکانی سەلاحەدین و سلێمانی و دهۆک

سەرۆکی زانکۆکانی سەلاحەدین و سلێمانی و دهۆک و ئەندامە بەشداربووەکان لە مامۆستایانی زانکۆی سەلاحەدین و ئەوانەی بەیاوەریی بەڕێزان سەرۆکی زانکۆکانی سلێمانی و دهۆک هاتبوون کۆبوونەوەی خۆیان سازدا. دوای بەخێرهێنانێکی گەرم لە لایەن سەرۆکی زانکۆی سەلاحەدین (زانکۆی خانەخوێ) ئامادەبووان هەستان بە دیراسەکردن و توێژینەوەی کۆمەڵێک کاروباری گرنگ لە چوارچێوەی ئەو پلانی کارەی کە پێشکەش کرابوو بۆ کۆبوونەوەکە و لەسەر ئەم خاڵانەی خوارەوە ڕێککەوتن:

١- ئەنجامدانی کۆبوونەوەی خولەکیی(دەوریی) لە نێوان سەرۆکی هەر سێ زانکۆکە و بە پێی ئەو خشتەیەی خوارەوە:
کۆبوونەی یەکەم لە مانگی نیسان لە هەولێر.
کۆبوونەوەی دووەم لە مانگی ئاب لە سلێمانی.
کۆبوونەوەی سێیەم لە مانگی کانونی یەکەم لە دهۆک.
لە ڕۆژی دوا پێنج شەممە لە هەر مانگێک لەو مانگانە ئەنجام دەدرێت.

٢-کارکردنێکی جدیی لە پێناوی یەکخستنی سیاسەتی خوێندنی باڵا لە کوردستاندا لە ڕێی بەستنی کۆنگرە و کۆڕە زانستییەکاندا.

٣- بەشدار بوونی بەڕێزان سەرۆکەکانی هەر سێ زانکۆکە لە مەراسیمی ئاهەنگی دەرچووانی زانکۆکانی تر و بەپێی بەرنامەیەک کە پێشەکی دیاری دەکرێت.

٤- پێویستە هاوکاریی زانستی لە نێوان هەر سێ زانکۆکەدا هەبێت و سود لە مامۆستایان وەربگیرێت بۆ بەشداریی کردن لە وانە وتنەوە بەپێی ئەم پلانەی خوارەوە:
هەر زانکۆیەک لە سەرەتای هەر ساڵێکی خوێندندا هەڵدەستێ بە پێشکەشکردنی پێویستییەکانی لە مامۆستایان بۆ هەردوو زانکۆکانی تر لە ڕێگای سەرۆکایەتی زانکۆکانەوە بۆ وەرگرتنی ڕەزامەندیی پێویست.

٥- سەبارەت بە گواستنەوەی قوتابیان و خوێندکاران لە نێوان زانکۆکاندا پەیوەندیی ڕەسمیی دەکرێ بۆ ناردنی گشت بەڵگەنامەکانی پەیوەندار بە قوتابی و خوێندکار بۆ تەماشاکردنی هۆیەکانی گواستنەوە و چۆنیەتی گونجانی لەگەڵ ڕێنماییەکان و بەدیهێنانی ئەم ڕێککەوتنە لەسەر ئەنجامدانی کۆبوونەوەیەک لە نێوان تۆمارکارە گشتییەکاندا بە بەشداربوونی نوێنەری پەروەردە بۆ دیراسەکردنی حاڵەتەکانی گواستنەوە.

٦- گواستنەوەی قوتابی و خوێندکاران لە نێوان زانکۆکاندا دوای قۆناغی یەکەم بە ڕەزامەندیی سەرۆکی زانکۆکان دەبێت.

٧- دەبێ ڕێنماییە کار پێکراوەکان بۆ دامەزراندنی ئەندامانی دەستەی وانە وتنەوە پیادە بکرێن و بچەسپێنرێن و بۆ ئەم مەبەستە لە ڕێگای نوسراوی ڕەسمییەوە تەنسیق لەگەڵ سەرۆکی زانکۆکان دەکرێ.



www.arsivakurd.org

# گەورەترین کارەساتی ئاگر و پرۆسەی دادگایی لە مێژووی سویددا

## تاهیر هەورامی

ڕۆژی هەینی ڕێکەوتی ٣٠ی ئۆکتۆبەری ساڵی ١٩٩٨ گەورەترین کارەساتی ئاگر لە مێژووی نوێی سویددا ڕووی دا. ٦٣ لاو بوونە قوربانیی ئەو کارەساتە و ژیانیان لە دەست دا، کە لەوانە هەشت کەسیان کورد بوون و ١٨٠ لاوی تر بە پلەی جیاواز گرفتاری ئەو ئاگرە سامناکە بوون و بریندای پاشماوەی ژیانیان بوون. لەو هۆڵەدا کە بارەگای کۆمەڵەی مەلدونییەکانی شاری یۆتبۆری بوو، ٤٠٠ گەنج لە ڕەگەز و نەتەوەی جیاواز کە ماوەی پشووی پاییزییان هەبوو، بۆ بەسەر بردنی شەوێکی خۆش پێکەوە لەوێ کۆببوونەوە. ئەمە لە کاتێکدا بوو، کە بەرپرسانی ڕەسمیی شارەوانی مۆڵەتی جێکردنەوە و ئامادە بوونیان لەم هۆڵەدا دابوو بۆ تەنیا ١٥٠ کەس. ئەمەش یەکێکە لە هۆکارە بەرچاوەکان کە زۆریی ژمارەی بەشداربووان کاریگەر بووە لە زۆریی ژمارەی قوربانییەکاندا کە بە گەورەترین کارەساتی ئاگر لە مێژووی سویددا دەژمێررێت.

تەشەنە کردنی خێرای ئاگرەکە یەکسەر پۆلیس و شارەزایانی خستە ئەو گومانەوە کە ئاگرەکە لەخۆیەوە هەڵی نەداوە و دانەگیرساوە. ئەم تیۆرییە دواتر و پاش لێکۆڵینەوەیەکی زۆر و دوورودرێژ لەلایەن پسپۆڕان و شارەزایانی بواری ئاگر و کارەساتی ئاگرەوە سەلمێنرا و پشت ڕاستر کرایەوە. ئیتر پۆلیس لێکۆڵینەوەی خۆی لەسەر ئەم بنەمایە بەشێوەیەکی زۆر نهێنی دەست پێکرد.

هەر زۆر زوو دوای ڕوودانی کارەساتەکە مقۆمقۆی ئەوە بڵاوبووەوە -بەتایبەت لە نێو جالیەی بێگانە- کە ئەمە کاری ڕاسیست و نەژادپەرست و نازییەکانی سویدە. لەلایەن کەسوکاری قوربانییەکانەوە زۆر ڕەخنە لە کار و شێوەی کارکردنی پۆلیس گیرا. تەنانەت کۆمیتەی تایبەتیان پێکهێنا بۆ ئەنجامدانی لێکۆڵینەوە بەو شێوەیەی خۆیان دەیانویست، بەڵام نەگەیشتە هیچ ئەنجامێک و پاشتریش هەڵوەشێنرانەوە !

ساڵێک لەمەوبەر دوو کەسی سویدی بە تۆمەتی بەشداربوون لە نانەوەی ئاگرەکەدا لەلایەن پۆلیسەوە دەستگیر کران و ماوەی سێ ڕۆژ لێپرسینەوەیان لەگەڵدا کرا، بەڵام ئازاد کران و هیچ گومانێکیان لە سەر نەما. ئێستا بە دەسپێکردنی دادگایی ئەو چوار گومان لێکراوانەی کە دەستی پێکردووە، ئەم دوو کەسە داوای قەرەبوو کردن لە دەوڵەتی سوید دەکەن.

پێش مانگێک پۆلیسی شاری یۆتبۆری ڕایگەیاند چوار گەنج بە گومانی بەشداربوونیان لە کارەساتی ٣٠ی ئۆکتۆبەری ١٩٩٨دا دەستگیر کراون و لێکۆڵینەوە و پرسینەوە لەگەڵیاندا دەستی پێکردووە. هەفتەیەک دوای دەستگیر کردنیان دەزگاکانی ڕاگەیاندن بڵاویان کردەوە کە یەکێک لە دەستگیرکراوەکان دانی بەو تاوانەدا ناوە و ئیعترافی لە سەر سێ کەسەکەی تر کردووە و دواتر لە لایەن پۆلیسیشەوە ئەم هەواڵە پشت ڕاست کرایەوە. بڵاوبوونەوەی ئەم هەواڵە وەک بۆمبێک کۆمەڵگای سویدی بەگشتی و جالیەی بێگانەی هەژاند بەتایبەتیی کە چاوەڕوانی ئەوەیان دەکرد تاوانەکە بەسەر ڕاسیست و نازیەکاندا سباخ ببێتەوە.

هەر چوار گومان لێکراو خەڵکی ئێرانن -یەکێکیان کوردی ڕۆژهەڵاتە- و لە دوای ساڵی ١٩٩٠دا هاتوونەتە وڵاتی سوید. کاتی هاتنیان بۆ سوید تەمەنیان لە نێوان ٨-١٢ ساڵدا بووە. بەپێی لێدوانی بەڕێوبەرانی قوتابخانەکانیان هەموویان گیروگرفتی خوێندنیان هەبووە و لە بواری خوێندندا لە پاش قوتابییەکانی ترەوە بوون.

**گەورەترین پرۆسەی دادگایی :**

پرۆسەی دادگایی کارەساتی ٣٠ی تۆکتۆبەری ١٩٩٨ بە گەورەترین پرۆسەی قەزایی لە مێژووی سویددا دەژمێررێت. ٦٥٠ کەس لەم پرۆسەیەدا خاوەن داوان و بەشداریی ڕۆژانەی پرس و وەڵام و بەڕێوەچوونی کاروباری دادگا دەکەن لە ساڵۆنێکی تایبەتدا کە بۆ ئەم مەبەستە تەرخان کراوە. دەزگاکانی ڕاگەیاندنی سویدیش بە بایەخێکی زۆرەوە و بە چڕیی چاودێریی گەشەکردنی پرۆسەکە دەکات و زانیارییەکانی لەسەر بڵاودەکاتەوە. تەلەفزیۆنی شاری یۆتبۆرییش بە هاوکاریی کۆمەڵگای بیانیەکان ڕۆژانە بە شەش زمانی کوردیی، عەرەبیی، فارسیی، ئیسپانیی، ئەریتریی و سۆمالیی هەریەکە بۆ ماوەی بیست خولەک هەواڵ و دەنگ و باسی هۆڵی دادگا بۆ بینەرانی خۆی بڵاودەکاتەوە.

**گومان لێکراوەکان:**

چوار گومان لێکراوەکان بەم شێوەیە ناسێنراون : ٢١ ساڵ یەک، تازە ١٩ ساڵی پڕ کردووە یەک و دوو نۆزدە ساڵی یەک کە بەم زووانە ٢٠ ساڵ پڕ دەکەنەوە. ١٩ ساڵی یەکە دانی نا بە تاوانەکەدا و ڕایگەیاند:

- بۆ چووەنە ناو هۆڵی ئاهەنگە بلیت بە ٤٠ کرۆن دانرابوو. ئەمەی بە شتێکی ڕاست نەزانیوە و پارەی نەداوە و هەربۆیەش نەیانهێشووە بچێتە ژوورەوە. لەگەڵ سێ هاوڕێکەی تریدا دەچنە ژێرخانی هۆڵەکەوە. هەندێ کاغەز و ڕۆژنامەی کۆن خڕدەکەنەوە و لەژێر چەند کورسی و مێزدا دایدەنێن و ئاگری تێبەردەدەن. یەکێکیشیان سوتەمەنی پێدادەکات و دوکەڵ بڵاو دەبێتەوە. ئەمە بۆ ئەوەی ئاهەنگەکە لەوانی تر تێک بدەن و مەبەستیان نەبووە زیان بە هیچ کەس بگەیەنن....

بەڵام ئەم چیرۆکە لەلایەن داواکاری گشتییەوە ڕەتکرایەوە. ئەو دەیەویست بیسەلمێنێ کە ئەوان پێکەوە بەرنامە و پلانیان بۆ ئەنجامی ئەو تاوانە داڕشتووە و زانیویانە ئاگرەکە چۆن تەشەنە دەکات و دەرئەنجامەکەی چ دەبێ، بۆیە داوای سزای توند و کاریگەری بۆ کردن.

پرۆسەی دادگا ڕۆژی ٢٠٠٠/٥/١٨ کۆتایی پێهات و دادگا ڕۆژی ٢٠٠٠/٦/٨ لە دەزگاکانی ڕاگەیاندنی سوید بڵاوی کردەوە کە: یەک لەو چوار کەسە بە هەشت ساڵ و دوو کەسیان بە شەش ساڵ و ئەوەی تەمەنی لە هەموان کەمتر بوو بە سێ ساڵ زیندانی مەحکوم کراوە.

www.arsivakurd.org

# بکوژەکانی ٦٣ لاوی بێگانە دۆزرانەوە

بەیانی رۆژی هەینی ١٩٩٨/١٠/٣٠، سوید بە کارەساتێکی سامناک ، کە مۆمی ژیانی ٦٣ لاوی کوژاندەوە ، لە خەو راپوو. ئەو لاوانە سەربە هەشت نەتەوەی جیاواز بوون و لەوانەش هەشتیان کورد بوون.

ئەو کارەساتە کە زیانی بە گیانی نزیک بە ٢٠٠ لاوی تر هێنا و سەدان بنەماڵەی لە مەرگی ئازیزانیاندا داخدار کرد ، کۆمەڵگای سویدی هەژاند. گەلێک لایەن سوتانی دیسکۆی گەرەکی بیانینشینی (هێسینگێن)یان بە گومانی کردەوەیەکی رەگەزپەرەستانە دانا. بەشێک بیریان لە گەورەیی کارەساتەکە و دڵرەقیی تاوانبارەکان دەکردەوە و ژمارەیەکیش لە خەیاڵی ئەوەدا بوون کە بازرگانی سیاسیی بەو تاوانەوە بکەن و بۆ کەڵک وەرگرتنی سیاسی لەو کارەساتە ، قۆڵیان هەڵماڵی و تەنانەت شانازییان بە زۆریی ژمارەی قوربانیەکانەوە دەکرد.

لەو کارەساتەدا بەشێک لە پەنابەرانی ئێرانی کە شەش لاویان لێ ببوو بە خۆراکی ئاگری تاوانەکە ، رۆڵی سەرەکیی ئەو بزوتنەوەیەیان گرتبووە ئەستۆ. بە نوسین و کۆبوونەوە و بە ئاگاداریی و بڵاوکردنەوە لە رادیۆکانیاندا، ژمارەی شەهیدەکانیان زیادتر لەوە پێشاندەدا و بەبێ هیچ لێکۆڵینەوەیەکی یاسایی ، کارەساتی ١٩٩٨/١٠/٣٠ دیسکۆی هێسینگێنیان بە کردەوەیەکی رەگەزپەرەستانە دەناساند و ئەوەندەی نەمابوو زیانێکی تریش بەو پەنابەرە مافخوراوانە بگەیەنن ، کە لە چنگ ستەمی کۆماری ئیسلامی هەڵهاتوون و لە سوید خۆیان گرتووەتەوە.

کردەوەی پڕ لە هەڵەی ئەو بەشە پەنابەرە ئێرانییە لە سوید ، بووە هۆیەکی رەخساو بۆ کۆماری ئیسلامیی ئێران ، هەتا ئەویش بۆ تێکدانی دۆزی پەنابەران لە سوید ، فرمێسکی تیمساح بۆ پەنابەرە ئێرانییەکان هەڵرێژێ و بازرگانیی بە خوێنی قوربانییەکانی رۆژی ١٩٩٨/١٠/٣٠ بکات و رایبگەیەنێ کە لە سوید دژی ئێرانییەکان کردەوەی رەگەزپەرەستانە بەرپائەکرێت.

هەموو دەزانین راگەیاندنی کۆماری ئیسلامیی بۆ فریودانی ئێرانییە ئاوارەکان بوو ، ئەگینا هەموو دنیا دەزانێ زۆربەی پەنابەرە ئێرانییەکان لە دەست تاوانەکانی کاربەدەستانی کۆماری ئیسلامیی ئێران ماڵ و ژیانیان بەجێهێشتووە و ئاوارە بوون و خۆیان گەیاندووەتە هەندەران.

کوردەکان کە هەمیشە کارەساتی چاوەڕوان نەکراو لە کەمینیان دایە و زۆر جار شار و گوند و ماڵیان لێ سوتێنراوە، لە بەرامبەر ئەو کارەساتە دڵتەزێنەدا هێمن و ئارامتر لەوانی تر بوون . وەک هەمیشە لەناو خۆیاندا دەسوتان و دڵی یەکتریان دەلاواندەوە و چاوەڕوانی ئەوەیان دەکرد، لەو وڵاتەدا کە یاسا حوکم دەکات ، مافیان ژێرپێ نەخرێت.

بەم پێیە ، فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان سەرەڕای بەشداریکردنی چالاکانەی لە هەموو رێ و رەسمەکاندا، پەنای بۆ یاسای سوید برد و بۆ ئەوەی مافی بنەماڵە داخدارەکان ژێرپێ نەخرێت ، لە نامەیەکدا داوای لە لێپرسراوانی سوید کرد، بە گوێرەی یاسا هەوڵی دۆزینەوەی تاوانبارەکانی ئەو کارەساتە بدەن و لە بەربانگی ژمارە ١٠٩، لاپەڕەی ٣٦-٣٧ دا ئەوەی بۆ خوێنەرانی روون کردەوە و داوای سەبوری و نزای بۆ بنەماڵە داخدارەکان کرد.

ساڵێک تێپەڕی ، خەمەکان هەندێک سوک بوون ، لە هەموو لایەکەوە دەستی یارمەتیدان بۆ بنەماڵەی قوربانییەکان درێژ کرا، بەڵام هەمان پرسیار دووپات کرایەوە: چۆن بوو ئەو کارەساتە رووی دا و بۆچی؟.

پۆلیس بۆ دۆزینەوەی تاوانبارەکانی کارەساتی یۆتوبۆری سێ ملیۆن کرۆن خەڵاتی دانا و سەرئەنجام ، ئێرانییەک بوو بە وەرگری خەڵاتی کارەساتی یۆتوبۆری و پیلانی دارێژراوی سوتاندنی دیسکۆی گەرەکی هێسینگێنی ئاشکرا کرد! بەمجۆرە دەرکەوت چوار لاوی شەڕانیی و سەرەڕۆی ئێرانیی کە بەپێی راپۆرتی سوید هەندێکیان هەتا ئێستا دەستیان لە دزی و راووڕوت و فرۆشتنی مەوادی بێهۆشکەردا بووە ، لە رووی نەخشەی لە پێش دارێژراوەوە ، بۆ ئازاردانی لاوانی کۆبووەوە و پێکهێنەرانی ئاهەنگەکە ، بە نهێنی چوونەتە ژێرخانی دیسکۆکە و بە سوتاندنی کاغەز و کورسی عەمبارەکە بوونەتە هۆی سوتاندنی دیسکۆکە و گەورەترین کارەساتی سوتاندنیان لە سویددا دروست کرد و ٦٣ لاوی بێتاوانیان لە ئاگردا سوتاند.

رۆژی ٢٠٠٠/٥/٣، تاوانبارەکان درانە دادگا و بۆ ماوەی پانزدە رۆژ، دادوەرەکان لەبەر چاوی بنەماڵە داخدارەکان و ژمارەیەک رۆژنامەنوسی سویدیی ، سەلماندیان کە رەگەزپەرەستەکانی سوید دەستیان لەو کارەساتەدا نەبووە و بەڵکو چوار ئێرانیی خوڵقێنەری کارەساتی یۆتێبۆری بوون.

رۆژی ٢٠٠٠/٥/١٨، دادگا هەر چواریانی بە تاوانبار ناساند و رەوانەی زیندان کران و رۆژی ٢٠٠٠/٦/٨ سزاکانیان بەشێوەی خوارەوە بە رای گشتیی سوید راگەیاند:

١- شۆڕش کاوە ١٩ ساڵە ٨ ساڵ
٢- محەمەد دامغانی ٢١ ساڵە ٦ ساڵ
٣- حوسێن ئەرسانی ١٩ ساڵە ٦ ساڵ
٤- کەسێکی تر بە نازناوی مەهدی کەمتر لە ١٩ ساڵ ٣ ساڵ

www.arsivakurd.org

عەرەب، تورک و کوردیش خۆی. شایانی باسە، کوردەکان هەر لە کۆنەوە لەو شارەدا ژیاون و لە دوای سەدەی دوانزدەی زایینیەوە زۆربەی دانیشتوانی هەولێریان پێکهێناوە.

قەڵای هەولێر زۆر کارەساتی سامناکی بەخۆیەوە دیوە و زۆرجار بۆ ماوەیەکی زۆر لە لایەن داگیرکەرانەوە ئابلۆقە دراوە و دانیشتوانی قەڵا بەرگرییەکی قارەمانانەیان لە شار کردووە. کۆنترین ڕووداوی مێژوویی کە بەناوی شەڕی هەولێر تۆمار کراوە، تێکشکانی داریوشی هەخامەنیشی بووە بە هێرشەکەی ئەسکەندەری مەکدۆنی ٣٣٠ ساڵ بەر لە زایین. هێزەکانی مەگۆل بۆ ماوەی شەش مانگ قەڵایان ئابلۆقە داوە و بۆیان نەگیراوە و لە ساڵی ١٧٣٢ زاینی دا، نادر شا بۆ ماوەی (٦٠) ڕۆژ قەڵای ئابلۆقە دا و لە ساڵی ١٧٥٠ بۆ ماوەی (٩) ڕۆژ لە لایەن عوسمانییەکانەوە ئابلۆقە دراوە.

ئەوەی شایانی گوتنە، هەولێر لە ساڵی ٦٤٢ کەوتووەتە ژێر دەستی ئیسلام و تا ١٤١٠ لەژێر فەرمانڕەوایی عەباسیەکاندا بووە، لەو قۆناخەدا، بەتایبەتیی لەنێوان ساڵانی (١١٩٠-١٢٣٠) هەولێر زۆر بەرین بووەتەوە و پێشکەوتنی بەخۆیەوە دیوە لە کاتی فەرمانڕەوایی سولتان (موزەفەرەدین کوکبەری) لە دەورانی سەلاحەدینی ئەیوبی، هەر لەوکاتەشدا منارەی هەولێر کە بە منارەی چۆلی بەناوبانگە دروستکراوە و یەکێکە لە شوێنە دێرینەکانی هەولێر. لەنێوان ساڵانی ١٤١٠-١٥٠٨ قەرەقوینلو فەرمانڕەواییان کردووە و لەنێوان ساڵانی ١٥٠٨- ١٥١٤ فارس و لە ١٥٢٣-١٩١٨ لەژێر دەستی عوسمانییەکاندا بوو، ساڵی ١٩١٨ ئینگلیز دەستی بەسەردا گرتووە و لە ساڵی ١٩٢١ەوەش لەژێر دەسەڵاتی دەوڵەتی عێراق... و لە ساڵی ١٩٩١ەوە تا ئەمڕۆش لەژێر دەسەڵاتی ڕاستەوخۆی کورد دایە.

بەرزایی قەڵای هەولێر ٢٦م لە ئاستی شار و ٤١٤م لە ئاستی دەریا و پانتایی ١٠٢٠٠٠م مەتری چوارگۆشەیە.

لەگەڵ هەموو ئەو کارەساتانەی بەسەر قەڵای هەولێر هاتووە، بەڵام تا هاتنی حوکمی دەوڵەتی عێراق، قەڵای هەولێر ڕوخساری دەرەوەی خۆی پاراستووە، بەڵام لە ساڵانی بیست دا، هەندێ هەنگاو نراوە بۆ پێکۆڵکردنی قەڵا و تێکدانی، ئەوەی شایانی باسە یەکێک لە مرۆڤە دڵسۆزەکانی کورد ئەندامی پەرلەمانی عێراق مارف جیاوک لە ساڵی ١٩٢٨دا زۆر بەتوندی دژی ئەو پیلانە ڕاوەستا... لە نێوەڕاستی پەنجاکاندا دەرگای سەرەکی قەڵا ڕوخێنرا... ئەو دەرگایەی ئێستا لە کاتی بەعس، بەشێوەی کۆن بنیات نەنراوەتەوە... زۆر لە نوسەر و مێژوونوسانی هەولێر پرۆژەی پاراستن و ئاوەدانکردنەوەی قەڵایان خستووەتە بەرچاوی کاربەدەستان، بەڵام بەداخەوە لەبەر ئەوەی کورد خۆی دەسەڵاتدار نەبوو، هەموو پرۆژەکان زیندەبەچاڵ کران. دەوڵەتی عێراق کە گرنگیی تایبەتیی بە ناوچەکانی دێرینی عێراق داوە، کوردستانی پشت گوێ خستووە... ئێستاش لە سایەی دەسەڵاتی کورد و بڕیاری یونسکۆ، هیواداریـن پرۆژەیەکی زانستیی هەمە لایەنە داڕێژرێ بۆ نۆژەن کردنەوەی قەڵا، بەتایبەتیی خانووەکانی کۆن لەسەر ئەندازیاریی مێژوویی خۆی و ڕێکخستنی پارک، باخچە و مۆزەخانە و هۆتێل بۆ ئەوەی نەک تەنیا ئەو شوێنەوارە مێژوویی یە بپارێزرێ، بەڵکو ببێتە شوێنی گەشت و گوزار و داهاتێکیش بە شارەکە ببەخشێ.

## یارمەتی کردن بە چاککردنەوەی قەڵای هەولێر ئەرکی سەرشانی هەموو لایەکمانە !

**بۆ بەئەنجام گەیشتنی پرۆژەی مادام میتران ، فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان ژمارە حسابێکی تایبەتیی کردووەتەوە. تکایە یارمەتی خۆتان بە ژمارە پۆستگیرۆی 132 49 43-8 بنێرن و لە سەری بنوسن (Stöd för Hewlers Slott).**

**بەربانگ لە ژمارەکانی خۆیدا ناو و ڕادەی یارمەتی ، یارمەتیی دەران ڕادەگەیەنێ.**

www.arshivakurd.org



# پاڵپشتی نۆژەنکردنەوەی قەڵای دێرینی هەولێر ئەرکی هەموومانە

جەمشید حەیدەری

گومان لەوەدا نیە کە شاری هەولێر و قەڵا دێرینەکەی، یەکێکە لە کۆنترین شار و قەڵاکانی دنیا کە تا ئەمرۆ ناوەندێکی شارستانییە. بێگومان بڕیاری ڕێکخراوی یونسکۆ لە ساڵی ١٩٩٩ بۆ پاراستن و ئاوەدانکردنەوەی قەڵای هەولێر و خستنە نێو لیستی ١٠٠ شوێنەوار کە دەکەوێتە ژێر چاودێریی ئەو ڕێکخراوەوە، بڕیارێکی مێژوویی بوو، چونکە قەڵای هەولێر دەبووایە ساڵانێکی زووتر بخرایەتە ژێر سەرپەرشتی ئەو ڕێکخراوە جیهانییەوە، بەڵام لەبەر ئەوەی دەوڵەتی عێراق دڵسۆزیی نەنواندووە بۆ پاراستنی و بەڵکو هەوڵی ئەوەشی داوە شوێنەوارە مێژووییەکانی کوردستان لەنێو ببات وەک لەم دواییانەدا لەگەڵ قەڵای دێرینی کەرکووک ئەنجامی داوە.

ئەو بڕیارەی یونسکۆ ڕەنگدانەوەی هەوڵ و کۆششی کورد خۆیەتی کە تا ڕادەیەک لەو چەند ساڵەی دوایی دەسەڵاتی دا، بەشێک لە باشوری کوردستان لەژێر چنگدایە. لە تەک ئەو بڕیارەی یۆنسکۆ دەبێ ئاماژە بەوەش بکرێ کە خاتوو دانیال میتران و ڕێکخراوی فەرانس لیبرتی ئەو بڕیارەی قۆستەوە و ئامادەییان پێشانداوە کە بەشداریی بکەن لە پرۆژەی ئاوەدانکردنەوەی قەڵای هەولێر، بێگومان ئەو هەڵوێستەی ڕێکخراوی فەرانس لیبرتی شایانی سوپاس و پێزانینە. دوا بە دوای بڕیاری ڕێکخراوی فەرانس لیبرتی، کۆمیتەی کارگێڕی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوید بڕیاریدا کە بە کۆمپانیایەک لە سوید هەڵستێ بۆ یارمەتیی نۆژەنکردنەوەی قەڵای هەولێر، هیواداریین کوردەکانی سوید کەمتەرخەمی نەکەن بۆ کۆکردنەوەی یارمەتی بۆ ئەو کارە خێرخوازە و پاراستنی کەلەپوری مێژوویی مان.

### قەڵای هەولێر

بەڵگەی مێژوویی مان لەبەر دەست دانیە، ئەو قەڵایە کەی دروستکراوە و کێ دروستی کردووە، بەڵام هەموو ئەو بەڵگانەی ئاماژەیان بە بوونی ئەم قەڵایە کردووە لە کۆنەوە، ئەوە دەردەخەن کە چەند هەزار ساڵێک بەر لە زایین ئەو قەڵایە و شاری هەولێر (ئەربیل) هەبووە. بەڵگە و نوسینە بزمارییەکانی (ئەکدی و سومر)ییەکان کە تەمەنیان بۆ نزیکەی سێ هەزار ساڵ بەر لە زایین دەگەڕێتەوە، پەنجەیان بۆ بوونی ئەو قەڵایە ڕاکێشاوە. بە واتایەکی تر مێژووی قەڵای هەولێر بۆ شەش هەزار ساڵێک دەگەڕێتەوە. لەو ماوە زۆرەدا هەولێر و قەڵاکەی دەستاو دەستیان کردووە و زۆر لە داگیرکەران، فەرمانڕەواییان لەم شارەدا کردووە، لە سومرییەکان، ئەکدی، بابیلی، ئاشوری، هەخامەنیشی، ساسانی، ڕۆمانەکان، مەگۆل، فارس، ئەرمەن،



www.alsiyakurdi.org

ڕاوێژکاری پیشەسازیی شارەوانی دیاربەکر. شێخ مووس دیکن لەسەر نەهێشتنی شوێنەوارە کۆنەکانی کورد و پرۆژەی بەنداوی حەسەن کەیف دوا و محەمەد ڤوراڵیش لە سەر ژێرپێ کردنی مافی مرۆڤی کورد بەدەست دەوڵەتی تورکیا.

ڕۆژی سێیەم بۆ ڕێکخراوە کوردیەکانی ئەوروپا تەرخان کرابوو. وەک فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوید، ئینستیتوتی کورد لە پاریس، بیرۆی پەیوەندی و ئاگاداریی لە بروکسل، نوێنەری کۆمەڵەی دیموکراتی کورد لە نۆرویژ، نوێنەری کۆمەڵەی نێونەتەوەیی ئاڵمانیا بۆ مافی مرۆڤ لە کوردستان، نوێنەری وەقفی کتێبخانەی کوردیی لە ستۆکهۆڵم، نوێنەری فیدراسیۆنی کورد لە ئاڵمانیا (کۆمکار)، وەقفی کوردی لە سوید، کتێبخانەی کورد لە سوید تا لە سەر کارو خەبات و سیاسەتی ڕێکخراوەکەیان بدوێن و بە هاوکاریی فیدراسیۆن پلاتفۆرم و پلانێکی هاوبەش بۆ هاوکاریی داڕێژن بۆ ئامادەکردنی کۆنفرانس و کۆبوونەوەی لەم بابەتە، بەمە پتر سەرنجی دەوڵەتانی ئەورووپی بۆ لای دۆزی کورد ڕابکێشن.

ژمارە کوردێکی زۆر بەشداریی کۆبوونەوەکانی ئەو کۆنفرانسەیان کرد و بە ئاراستەکردنی پێشنیار و پرسیاری بە کەڵک کۆنفرانسەکەیان دەوڵەمەند کرد. لە کۆتایی کۆنفرانسەکەدا بەشداران ڕاگەیاندراوی خوارەوەیان پەسەند کرد و کۆنفرانس بە سەرکەوتوویی کۆتایی پێهات. جێگەی سەرنجە کە ڕایبگەیەنین، خواردنی ئەو سێ ڕۆژەی میوانەکانی فیدراسیۆن لە لایەن سێ ڕەستورانی کوردانەوە دابین کرا، کە جێگەی سوپاس و پێزانینە.

### ڕاگەیاندنی کۆنفرانسی ستۆکهۆڵم

چەند ڕێکخراو و دەزگای کوردیی لە سوید، نۆرویژ، ئاڵمانیا، بلژیک و فەرانسە بەپێی پرۆگرامێک کە فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان ئامادەی کردبوو، لە نێوان ٢ هەتا ٢٠٠٠/٦/٤ بۆ ماوەی سێ ڕۆژ لە ستۆکهۆڵم کۆبوونەوە. لە کۆبوونەوەکەدا بەرئەندامەتی تورکیا لە یەکیەتی هاوبەشی ئەوروپا و مافی



کورد باس و گفتوگۆ کرا. لە کۆبوونەوەدا بۆ ئەوەی ڕێکخراو و دەزگا کوردییەکان بتوانن لە ئەزمونی یەکتر کەڵک وەرگرن و داواکارییە هاوبەشەکانیان پێکەوە بە ڕای گشتیی بگەیەنن، بڕیاری هاوکاریی ڕێکوپێکی نێوان ڕێکخراو و دەزگا دیموکراتییەکانی کوردیان لە دەرەوەی وڵات پەسەند کرد و ڕاینگەیاند بەو شێوەی خوارەوە هاوکاریی یەکتر بکەن:

* گەلی کورد دابەشکراوە بەسەر تورکیا، ئێران، عێراق و سوریادا و بێگومان مافی خۆیەتی کە کولتور و زمانی خۆی پەروەردە بکات و بۆخۆی حاکم بێ بەسەر چارەنوسی خۆیدا. بەشداران بە یەکدەنگی داوا دەکەن ئەو پێوانەی کە لە لایەن هێزە نێونەتەوەییەکان و یەکیەتی ئەوروپاوە دانراون و بەتایبەتیی پێوانەی کۆپنهاگن ببنە سەرەتایەک بۆ چارەسەرکردنی کێشەی کورد لە تورکیا لە پرۆسەی بەرئەندامەتی تورکیادا لە یەکیەتی هاوبەشی ئەوروپادا.

* ئێمە بەهایەکی زۆر دەدەین بە بەرەوپێشەوە چوونی سیاسی، کۆمەڵایەتی و کولتوری لە باشوری کوردستاندا و داوا لە هەموو هێزە کوردییەکان و هێزەکانی نێونەتەوەیی دەکەین کە پشتی ئەو بەرەوپێشچوونەی باشوری کوردستان بگرن و هەر لەوکاتەشدا هێرشی بەردەوامی سوپای تورکیا و هێزەکانی تر بۆ باشوری کوردستان، کە ڕێگا لە بەرەوپێشچوونی دیموکراسی دەگرێ، بەتوندی مەحکوم دەکەین.

* فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان بە پێشنیارێکی هاوبەش بەشداران ئەرکی پێکهێنانی کۆنفرانسێکی نێونەتەوەیی لە ئەستۆ دەگرێ کە لەودا داوای کوردان بە یەکیەتی ئەوروپا و هەروەها ڕێکخراوە نێونەتەوەیی ئاراستە دەکات. ئێمە بە گرنگی دەزانین کە کۆنفرانسی دوایی ئەوکاتە پێک بێ کە سوید سەرۆکایەتی یەکیەتی ئەوروپا دەکات.

* ئێمە بۆ ئاگادارکردنی ڕای گشتی ئەوروپا ڕایەکانمان دەکەینە یەک. بۆ وەرگرتنی پێشنیاری پراکتیک و ستروکتور کۆمیسیۆنێکمان دامەزراند و هەوڵ دەدەین ژمارەیەکی پتر لە ڕێکخراوە کوردییەکانی ئەوروپا بەشداریی خاباتی هاوبەشی خۆمان بکەین.

ستۆکهۆڵم ٢٠٠٠/٦/٤

فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوید
وەقفی کتێبخانەی کوردی لە سوید
ئینستیتووتی کورد لە پاریس
فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردییەکان لە ئاڵمان (کۆمکار)
بیرۆی پەیوەندیی و ئاگاداریی لە بروکسل
کۆمەڵەی دیموکراتی کورد لە نۆرویژ
کۆمەڵەی نێونەتەوەیی بۆ مافی مرۆڤ لە کوردستان، لە ئاڵمان



www.arsivakurd.org

# کۆنفرانسی ستۆکهۆڵم

ڕۆژی هەینی ٢٠٠٠/٦/٢، فیدراسیۆن بە هاوکاریی ABF کۆنفرانسێکی بەناوی کۆنفرانسی ستۆکهۆڵم گێڕا و سێ ڕۆژی خایاند. کۆنفرانسەکە دەربارەی مافی کورد لە تورکیا و دۆزینەوەی ڕێگایەک بۆ هاوکاریی کوردەکانی دەرەوەی وڵات بوو. لەم کۆنفرانسەدا گەلێک کەسایەتیی کورد و سویدیی و ڕێکخراوە دیموکراتییەکانی کوردیی لە ئەوروپا هاوبەشییان کرد.

ڕۆژی یەکەمی کۆنفرانس تەرخان کرا بۆ دۆزی کورد لە تورکیا و ئەندامەتیی تورکیا لە یەکیەتی ئەوروپادا. Marianne Andeasson وتەبێژی کۆمیتەی سویدی- کوردی و Cinnika Bejming پەرلەمانتاری سویدی و بەڕێز یەڵماز چامڵی بەی سەرۆکی پارتی ئاشتی و دیموکراتی لە تورکیا لەم بارەیەوە دوان و ئەو بەربەستانەیان دەستنیشان کرد کە لە سەر ڕێگای تورکیا دان بۆ چوونە نێو بازاڕی هاوبەشی ئەوروپاوە.

Marianne Andeasson سەرۆکی کۆمیتەی سویدی لە بەشێکی وتارەکەیدا ئاماژەی بە سیاسەتی بە تورککردنی کوردان لە تورکیا کرد و گوتی لە تورکیا کوردان بە زۆرەملێ لە شوێنی ژیانی باووباپیرانیان ڕادەگوێزن و تەنانەت زمانی کوردییشیان لێ یاساخ کردووە. ئاندرشۆن لە کۆتایی وتارەکەیدا ڕایگەیاند: یەکیەتی ئەوروپا لە مانگی ١١ی ئەمساڵدا شەرتەکانی خۆی بۆ وەرگرتنی تورکیا بە ئەندامەتی ئاراستە دەکات، کە لەم هەشت خاڵانەی خوارەوەدا هاتوون پێکهاتووە. ئاندرشۆن هەروەها وەڵامی پرسیاری بەشدارانی دایەوە.

یەڵماز چامڵی بەی سەرۆکی پارتی ئاشتی و دیموکراتی وتەبێژی بەشێکی تری کۆنفرانسەکە بوو، کە لەژێر تەوەرەی (یەکیەتی ئەوروپا و کێشەی



کورد) ئەنجامی گرت. یەڵماز لە بەشێکی وتارەکەیدا ڕایگەیاند:

– مەسەلەی کورد، مەسەلەی ئابوری و مەسەلەی دیموکراسی کێشەی ئەسڵی تورکیان. تورکیا دەیەوێ ببێتە ئەندامی یەکیەتی ئەوروپا و ڕەنگە دوای ماوەیەک تێکەڵی یەکیەتی ئەوروپا بێ، لەم ڕوانگەیەوە دەبێ دیموکراتیەت قبول بکات، بەڵام کاربەدەستانی نایانەوێ دیموکراتییەت بسەلمێنن. هەموو دەبێ بزانین پێوانەکانی



کۆپنهاگن لە سەر تورکیا ناتوانێ وەڵامی داخوازەکانی خەڵک بداتەوە. کورد لە تورکیا کەمایەتی نیە، نەتەوەیەکی هەرە کۆنی ناوچەیە و خاوەنی زمان و کولتوری خۆیەتی و نابێ وەک کەمایەتی سەیر بکرێت.

زۆر جار کاربەدەستانی تورکیا دەڵێن کوردەکان خاوەنی مافن و دەتوانن ببن بە وەزیر و ئەرکی باڵای حکومەت لە ئەستۆ بگرن، بەڵام ناڵێن کام کورد دەتوانێ بەو پلە حکومەتی یانە بگات، چونکە ئەو کوردانە دەتوانن بەرپرسایەتی باڵا لە ئەستۆ بگرن، کە ئینکاری نەتەوەکەیان بکەن و ئەوانەی لە ئازادیی نەتەوەی خۆیان بدوێن توشی گیروگرفتی مەزن دەبن و... هتد.

ڕۆژی دووەمی کۆنفرانس تەرخان کرابوو بۆ دوو کەسایەتیی کوردی باکوری کوردستان، کە لە تورکیاوە هاتبوون، لەوانە محەمەد ڤوراڵ لە کۆمیتەکانی مافی مرۆڤی تورکیا و ئەندامی ڕێکخراوی جیهانیی مافی مرۆڤی کورد و شێخ مووس دیکن



www.avakurd.org

# ناوەڕۆک


- کۆنفرانسی ستۆکهۆلم ............................ ل ٤
- پاڵپشتی نۆژەنکردنەوەی ..... د. جەمشید حەیدەری ..... ل ٦
- بکوژەکانی ٦٣ لاوی بێگانە دۆزرانەوە .................... ل ٨
- گەورەترین کارەساتی ئاگر ..... تاهیر هەورامی .......... ل ٩
- بانگەوازی زانکۆکانی کوردستان ...................... ل ١٠
- هەوڵێکی پیرۆزی ئاشتی....... ئیبراهیم سۆفی .......... ل ١١
- پەرلەمان و مێژوو ....... نەوزاد وەلی .................. ل ١٣
- کێ بەرپرسی ئاوارەکردنی........ حامید گەوهەری ....... ل ١٤
- هەڵبژاردنی ئێران ........... غەریب ....................... ل ١٦
- زمان – جوتە پیت – بزوێن .......... نەوزاد وەلی ......... ل ١٧
- ئەم ساڵ لەم ژیانە ......... هۆزان فایەق ................ ل ١٨
- دیمانەیەک لەگەڵ کۆمەڵەی کریستیان ستاد ............. ل ١٩
- دیمانەیەک لەگەڵ کۆمەڵەی فالۆن دا ........ ............. ل ٢٠
- فیدراسیۆن میوانداریی خوێندکارانی کوردی ............ ل ٢١
- چەند چالاکییەکی فیدراسیۆن .......................... ل ٢٢
- خوێندکارانی کورد لە زانکۆی ئوپسالا ...................... ل ٢٤
- گرەو ...... شیعر ....... عەبدوڵلا پەشێو .................. ل ٢٥
- بەربانگ و خوێنەران ........................................ ل ٢٥
- چاپکراوی نوێ ................................................ ل ٢٥


گۆشەی منالان :


- « مژدە ».......... دایکی سۆلاف ............................ ل ٢٦
- پیرۆزبایی کردن ................................................ ل ٢٦



# بەربانگ

**ژمارەی ١١٦ ساڵی ١٩ (٢٠٠٠)**

**ئۆرگانی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکانە لە سوێد**
**خاوەن ئیمتیاز: کەیا ئیزۆل**

**دەستەی نووسەران:**
**حامید گەوهەری**
**نەوزاد وەلی**
**فارس**

**مونتاژ**
**حامیدی گەوهەری**
**بەڕێوەبەری ئیداری: عادل ئەنوەر**

**ئابوونەی ساڵانە: ١٠٠ کرۆنی سویدییە**
**بۆ دەزگاکان: ٢٠٠ کرۆنی سویدییە**
**نرخی یەک دانە: ٢٥ کرۆنی سویدییە**
**بۆ دەرەوەی سوید: ٤٠ دۆلاری ئەمریکی**
**بۆ دەزگاکانی دەرەوەی سوید: ٦٠ دۆلاری ئەمریکی**



**ناونیشان:**
e-mail
berbang@kurdiskarf.org
www.kurdiskarf.org

Box 490 90 Stockholm
Tel: 08- 652 85 85
Fax: 08- 650 21 20
**پۆستگیرۆ:** 8- 64 38 80


**دەستەی نوسەران مافی ئەوەی هەیە ، ڕێنوسی وتارەکان ڕاست بکاتەوە و بەو شێوەیەی دەگونجێ ، کورتیان بکاتەوە . دەستەی نوسەران لە ناوەڕۆکی وتارەکان بەرپرسیار نیە**


**فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوید لە ١٩٨١/٦/٦ دامەزراوە .**
**ژمارەی یەکەمی بەربانگ لە مانگی ١٩٨٢/٧ دا بلاوکراوەتەوە**



www.arsivakurd.org

# NYFIKEN PÅ...

*ny cd-rom på lätt svenska*

Genom NYFIKEN PÅ vill vi berätta på lätt svenska sådant som är viktigt att känna till inom området sexualitet och samlevnad. Du kan välja om du vill lyssna till informationen eller läsa själv.




## *Nyfiken på tar upp:*

KÄRLEK OCH SEXUALITET. Belyser mäns och kvinnors sexualitet, det första samlaget, homosexualitet och onani.

KROPPEN. Beskriver mäns och kvinnors könsorgan, pubertet och menstruation.

SÄKRARE SEX. Tar upp preventivmetoder, abort och könssjukdomar.

SEXUELLA ÖVERGREPP. Belyster frågor om integritet, våldtäkt och övergrepp mot barn.

MÖTEN. Tar upp frågor kring ensamhet och självständighet, jämställdhet, träffställen, familjeformer, historiska perspektiv på samlevnad samt prostitution.

Dessutom finns en ORDLISTA som förklarar fackuttryck och andra ord på området, t. ex. beröring eller svartsjuka.

*Total speltid:* 1,5-2 timmar
*Pris:* 100 kronor inkl. moms. Porto tillkommer.

*Beställningen kan skicka till:*
Folkhälsoinstitutets distributionstjänst, 120 88 Stockholm,
fax 08-449 88 11, *e-post* fhi@strd.se, tfn 08-449 88 22.

***Härmed beställs*** .............. ex av Nyfiken på à 100 kronor styck.

| *Leveransadress* | Faktureringsadress (om annan än leveransadress) |
|---|---|
| NAMN ............................................ | ............................................ |
| ORG/FÖRETAG ............................................ | ............................................ |
| ADRESS ............................................ | ............................................ |
| POSTADRESS ............................................ | ............................................ |

folk HÄLSO INSTITUTET

Box: 490 90, S- 100 28 Stockholm Posttidning B (2000/2)

# بەربانگ

ئۆرگانی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکانە لە سوید
ژمارە ١١٦ ساڵی ٢٠٠٠





